

18


ISSN: 2147-5679
Cilt/Volume: 9
Sayı/ssue: 18
Yıl/Year: 2023



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

BUYDED

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ • BINGOL UNIVERSITY JOURNAL OF LIVING LANGUAGES INSTITUTE



Biyografiya Silêman Kurşun (Selmanê Belegewrî),
Kesayetiya wî ya Edebî û Berhemên wî
Ayhan YILDIZ

Ortak Atasözlerin Hikâyeleri: Fârsî-Kurmancî-Zazakî 12
Hasan ÇİFTÇİ

Diwon Cebexçuri dî Mefhumê Welati
Danyal APUHAN

Qewm, Welat û Bajar di Dîwana Melayê Cizîrî da
Müslîh SEZER • M. Zahir ERTEKİN

Temaya Mirin û Piştî Mirinê di Hizra Feqîyê Teyran de
Diler AYDOĞAN

Zazaki dî Zafomari
Ayetullah KARABEYESER



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ
BUYDED

Yıl/Year: 2023 Cilt/Volume: 9 Sayı/Issue:18

ISSN: 2147-5679

Sahibi Owner

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Adına
Dr. Öğr. Üyesi Abdullah BEDEVA

Editör Editor

Dr. Öğr. Üyesi Zafer AÇAR

Editör Kurulu Editorial Board

Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY
Dr. Öğr. Üyesi Muhammed Bilal TOLAN
Dr. Öğr. Üyesi İbrahim DAĞILMA
Dr. Öğr. Üyesi Hemin OMAR AHMAD
Dr. Öğr. Üyesi Ömer DELİKAYA
Arş. Gör. Adnan AYDINTÜRK
Arş. Gör. Buşra Aslan BAYNAL
Arş. Gör. Hacı İbrahim AYTEKİN

Dergi Sekreteryası ve İletişim Secretary of Journal and Communication
Enstitü Sekreteri Sadrettin BEKİ

Dergi Yazışma Adresi Correspondence Address

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğü, 12100-Bingöl
Telefon: 0426 216 00 42 • Faks: 0426 216 00 42
Dergi e-posta: buyded@bingol.edu.tr
Enstitü e-posta: bingolyasayandiller@gmail.com

Dergi Tasarım ve Uygulama Magazine Design

Ridwan Xelil



Dergimizde yayınlanan makaleler Turnitin intihal programından geçtikten sonra yayınlanmaktadır.

Dergimizin tarandığı dizinler:



Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi yılda 2 kez yayımlanan, uluslararası hakemli akademik bir dergidir. Yayımlanan yazıların her türlü hukukî ve bilimsel sorumluluğu yazarlarına aittir. Derginin her hakkı saklıdır. Dergide yayımlanan yazılar kaynak gösterilmeksizin kullanılamaz.

Yayın Kurulu ve Danışma Kurulu *Editorial Board and Advisory Board*

Prof. Dr. Abdulaziz HATİP, Marmara Üniversitesi	Prof. Dr. Yadgar Rasool, Selaheddin University, Iraq
Prof. Dr. Abdullah KIRAN, Muş Alparslan Üniversitesi	Prof. Dr. M. Zahir ERTEKİN, Mardin Artuklu Üniversitesi
Prof. Dr. Abdullah ÖNALAN, Siirt Üniversitesi	Prof. Dr. Vecihi SÖNMEZ, Batman Üniversitesi
Prof. Dr. Celilê Celil, Instut für Kurdologie, Awisturya	Prof. Dr. Abdulcebbar KAVAK, Karabük Üniversitesi
Prof. Dr. Edip ÇAĞMAR, Dicle Üniversitesi	Prof. Dr. Abdülhadi TİMURTAŞ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Prof. Dr. Hasan ÇİÇEK, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi	Prof. Dr. Hayrettin KIZIL, Dicle Üniversitesi
Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ, Bingöl Üniversitesi	Doç. Dr. Ahmet KAYINTU, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Hasan TANRIVERDİ, Dicle Üniversitesi	Doç. Dr. Canser KARDAŞ, Muş Alparslan Üniversitesi
Prof. Dr. Mehmet BARCA, Ankara Sosyal Bilimler Üniversitesi	Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Mehmet BİLEN, Dicle Üniversitesi	Doç. Dr. Ercan ÇAĞLAYAN, Muş Alparslan Üniversitesi
Prof. Dr. Mehmet Mahfuz SÖYLEMEZ, İstanbul Üniversitesi	Doç. Dr. İbrahim USTA, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Metin YİĞİT, Dicle Üniversitesi	Doç. Dr. Üyesi Mustafa ASLAN, Mardin Artuklu Üniversitesi
Prof. Dr. Mustafa AGAH, Bingöl Üniversitesi	Doç. Dr. Mehmet YAZICI, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Mychael CHYET, Washington Library, USA	Doç. Dr. Mustafa GÜNERİGÖK, Sakarya Üniversitesi
Prof. Dr. Nesim DORU, Ankara Sosyal Bilimler Üniversitesi	Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK, Mardin Artuklu Üniversitesi
Prof. Dr. Nusrettin BOLELLİ, Bingöl Üniversitesi	Doç. Dr. Yakup AYKAÇ, Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi
Prof. Dr. Orhan BAŞARAN, Bingöl Üniversitesi	Doç. Dr. Yusuf AYDOĞDU, Bingöl Üniversitesi
Prof. Dr. Salih AKIN, Rouen University, France	Dr. Öğr. Üyesi Asoss M. Qader, Lehrstuhl für Altorientalistik, Universität Würzburg, Almanya
Prof. Dr. Seyid Ahmed PARSA, Kurdistan University, İran	Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD, Bingöl Üniversitesi

Bu Sayının Hakemleri *Reviewers of the This Issue*

Prof. Dr. Abdulhadi TİMURTAŞ

Doç. Dr. Bedrettin BASUĞUY

Doç. Dr. Ahmet KIRKAN

Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU

Doç. Dr. Yakup AYKAÇ (2)

Dr. Arş. Gör. Mesut ARSLAN

Dr. Öğr. Üyesi Ayetullah KARABEYESER

Dr. Öğr. Gör. Nevzat EMİNOĞLU

Dr. Öğr. Üyesi İlyas ARSLAN (2)

Dr. Öğr. Gör. Mehmet ASLANOĞULLARI (2)

Dr. Öğr. Üyesi Danyal APUHAN

Dr. Nurettin ERTEKİN

Öğr. Gör. Murat VAROL (2)

İÇİNDEKİLER

CONTENT

Biyografiya Silêman Kurşun (Selmanê Belegewrî),
Kesayetiya wî ya Edebî û Berhemên wî
Ayhan YILDIZ
06-16

Ortak Atasözlerin Hikâyeleri: Fârsî-Kurmancî-Zazakî 12
Hasan ÇİFTÇİ
17-35

Diwon Cebexçuri dî Mefhumê Welati
Danyal APUHAN
36-46

Qewm, Welat û Bajar di Dîwana Melayê Cizîrî da
Müslîh SEZER • M. Zahir ERTEKİN
47-63

Temaya Mirin û Piştî Mirinê
di Hizra Feqîyê Teyran de
Diler AYDOĞAN
64-73

Zazaki dî Zafomari
Ayetullah KARABEYESER
74-84

Biyografiya Silêman Kurşun (Selmanê Belegewrî), Kesayetiya wî ya Edebî û Berhemên wî

Ayhan YILDIZ

Kurte

Hîn jî gelek nivîskar û şairên edebiyata kurdî/kurmancî ya klasîk, bi berhemên xwe di literatûra dîrokî ya edebiyata kurdî de cihên ku heq dikin negirtine. Yek ji wan nivîskaran Silêman Kurşun (Selmanê Belegewrî) û berhemên wî ne. Tevî ku zêdetirî bîst salî zeman bi ser çapkirina du berhemên wî de derbas bûne jî, ji yek xebateke lêkolînî û nixandîni zêdetir li ser biyografi, berhem û kesayetiya wî ya edebî, heta niha xebatên akademîk di qada literatûrê de nehatin dîtin. Lewra vê xebatê hewl da ku li ser jiyana, berhem û kesayetiya Silêman Kurşun (Selmanê Belegewrî) lêkolîn bike û wî binirxîne. Di encama lêkolîna sehayê de hate dîtin ku Selmanê Belegewrî, di medreseyan klasîk ên kurdan de li ber seydayên bi-jarte, di sedsala XX-î de gihastîye û şair û nivîskarekî pirlayaneyî ye. Digel ku wî helbestên xwe di çarçoweya edebiyata klasîk de nivîsîne jî, ew xîtabî serdema îro dike, lewra berhemên ilmî-hizrî, dînî û civakî ne û mijarên wî modern in. Hat dîtin ku wî di ber van berhemên de, berhemên dînî û civakî jî zimanê erebî û tirkî jî wergerandine kurmancî.

Peyvên sereke: Dîroka Edebîyata Kurmancî, Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Mijarên Modern, Silêman Kurşun (Selmanê Belegewrî)

Silêman Kurşun (Selmanê Belegewrî) Yaşamı, Edebi Kişiliği ve Eserleri

Özet

Hala Klasik Kürt edebiyatının birçok şair ve yazarı, eserleriyle Kürt edebiyatı tarihinde hakettikleri yerlerini almamışlardır. O yazarlardan biri de Süleyman Kurşun (Selmanê Belegewrî) ve eserleridir. Yirmi yılı aşkın bir süre onun iki eserinin yayımlanması üzerinden geçmesine rağmen, bir tek akademik araştırma ve değerlendirme çalışması dışında, onun yaşamöyküsü, eserleri ve edebi kişiliği üzerine şimdiye kadar akademik çalışmalar alanyazımda görülmedi. Bu yüzden bu çalışma, Silêman Kurşun'un yaşamöyküsü, eserleri ve edebi kişiliğini araştırıp değerlendirmeyi hedeflemektedir. Saha çalışması neticesinde onun klasik Kürt medreselerinde, seçkin müderrislerin yanında XX. yüzyılda yetişmiş çokyönlü bir yazar ve şairdir. Şiirlerini klasik edebiyatın şekilleriyle yazdığı halde, günümüze hitap ettiği ve eserlerinin dini-ilmî, sosyal ve modern konulardan oluştuğu tespit edildi. Ayrıca bu eserlerinin yanında, onun dini ve sosyal içerikli eserleri de Ara-çça ve Türkçeden Kurmancîye çevirdiği görüldü.

Anahtar kelimeler: Kurmancî Edebîyat Tarihi, Klasik Kürt Edebiyatı, Modern Konular, Silêman Kurşun (Selmanê Belegewrî)



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ
Yıl/Year: 2023 • Cilt/Volume: 9 • Sayı/Issue:18

Ayhan YILDIZ

Dr. Öğr. Görevlisi
Zanîngeha Mardin Artuklu
Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî
ayhanyildiz@artuklu.edu.tr
Orcid: 0000-0002-8763-4182

Makale Türü / Article Type:

Araştırma Makalesi / Research Article

Makale Geliş Tarihi / Received: 20.07.2023

Makale Kabul Tarihi / Accepted: 27.11.2023

Makale Yayın Tarihi / Published: 20.10.2023

DOI: 10.56491/buydd.1330186

Atıf / Citation:

Yıldız, A. (2023). Biyografiya Silêman Kurşun (Selmanê Belegewrî), Kesayetiya Wî Ya Edebî û Berhemên Wî. Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 9(18), 6-16

Biography of Silêman Kurşun (Salman Belegewri), His Literary Personality and His Works

Abstract

Still, many poets and writers of Classical Kurdish literature have not taken their deserved place in the history of Kurdish literature with their works. One of those writers is Süleyman Kurşun (Selmanê Belegewrî) and his works. Although more than twenty years have passed since the publication of his two works, except for a single academic research and evaluation study, academic studies on his life, works and literary personality have not been seen in the literature so far. Therefore, this study aims to research and evaluate Silêman Kurşun's biography, works and literary personality. As a result of his fieldwork, he studied in classical Kurdish madrasahs alongside distinguished professors in the 20th century. He is a versatile writer and poet who lived in the 19th century. Although he wrote his poems in the forms of classical literature, it was determined that he appealed to today and his works consisted of religious-scientific, social and modern subjects. In addition to these works, it was seen that he also translated religious and social works from Arabic and Turkish into Kurmanji.

Key words: Kurmanci Literary History, Classical Kurdish Literature, Modern Issues, Silêman Kurşun (Selmanê Belegewrî)

1. Destpêk

Sernameê name namê Ellah / Bê namê wî na temam e wellah

Qonax û serdemên dîrokî yên edebîyata kurmancî, digel hemû ked û têkoşinan hîn jî di pêvajoya lêkolînê de ye. Gelek alim, zanyar û edîben ku bi berhemên xwe hîm û stûnên vê edebîyatê ne, hîn jî bi awayekî ku heq dikin di lîteraturê de cihên xwe negirtine. Yek ji van edîban Selmanê Belegewrî ye. Wî heta niha diwanek, menzûmeyeke fablî, mewlûdekê, çend mesnewiyên civakî çap kirine, hinek berhemên wî jî neçapkirî mane. Gava me ev berhem dîtî, me demildest di qada lîteratura edebîyata klasîk a kurmancî de geryanek kir û me dît ku va ye bîyografiya û kesayetîya wî ya edebî, heta niha nebûye mijara lêkolînên akademîk û zanistî. Herçendî bîst sal bi ser çapkirin û belavkirina diwana wî ya *Rêbaz* de, sêzdeh sal jî bi ser berhema wî ya *Mewlida Pêxember* de derbas bûne jî, lêkolîner li serê hindik xebitîne. Ji ber vê kêmasiyê, çawa ku em çav bi van berhemên wî ketin, demildest me wekî pêdivîyekê dît ku em berhem û bîyografiya wî bikin mijara xebateke nû. Lewra vê xebatê ji xwe re bîyografiya Suleyman Kurşun (Selmanê Belegewrî), kesayetîya wî ya edebî û berhemên wî yên edebî û ilmî, wekî pirsgerêka lêkolînê da ber xwe:

“Cihê Silêman Kurşun (Selmanê Belegewrî) bi tevî bîyografiya, kesayetîya wî ya edebî û berhemên wî di dîroka edebîyata kurdî de çi ye?”

Di pey dîyarkirina pirsgerêka xebatê de, ev lêkolîn dê hewl bide ku vê pirsgerêka dîyarkirî çareser bike û bersiva van pirsan bide:

“1. Silêman Kurşun (Selmanê Belegewrî) kî ye? 2. Asta tehsîla wî çi ye? 3. Gelo ji bilî van berhemên wî yên çapkirî, wekî din çi berhemên wî hene? 4. Têkildariya wî ya bi cihana tesewwufê re di çi pile, paye û astê de ye? 5. Ev şairê alim bi şewaza xwe ya edebî-hunerî, ji tradîsyonên dîrokî yên edebîyata kurmancî, dikeve bin banê kîjan qonax û nerîta edebî?”

Bi “mebest”a ku em di nav qonaxên dîrokî yên edebîyata kurmancî de cihê Selmanî destnîşan bikin, me ev xebat hilbijart û kir mijara lêkolîna xwe. Gava di vê xebatê de em bigihîjin armanca xwe, helbet dê agadarîyên pêwîst ên tîkildarî vî edîbî ji wendabûn û berzebûnê xelas bibin û edîbekî din ê giring jî, bi şewaz, reng û rûyê xwe yê xweser li dîroka edebîyata kurmancî zêde bibe. Bi vî awayî ew lêkolînerên ku li ser qonaxên dîrokî yên edebîyata kurmancî dixebitin, dê hîn çetir materyalan bibînin û nixandinên xwe yên teorîk û pratîk bikin. Hemî rewş weha ye, nexwe hêvîdarî heye ku ev xebat ji gelek alîyan ve “giring” û “mifadar” be. Di vê rewşê vê lêkolînê berê xwe da qada xebatê û dest bi teqilandinê taqeta xwe ya xebatê kir. Me dît ku bi tevî derfetên materyalî, behremendî û demî, derfetên me yên taqetî û mesrefa maddî-aborî jî têr dikin ku em vê lêkolînê pêk bînin. Lewra em derketin sehaya lêkolînê û me dest bi berhevkirina daneyan kir. .

Piştî ku me ji agadarîyên nivîskî yên ku di berhemên Selmanî yên li ber destê me de hebûn mifa wergirt, me berê xwe da sehaya xebatê. Serê pêşî, me berê xwe da xebatên ku li ser Kurşun û lîteratura ku li ser wî çê bûye. Hat dîtin ku Hasan Karaca û Nurettin Aykut (2015) gotareke bi navê “Mele Hüseyin Bateyi’ nin Mewlid-i Nebî Adlı Eseri ile Mele Süleyman Kurşun’un Mewlida Pêxember Adlı Eserinin Karşılaştırılması” weşandine. Wan di vê gotarê de metnên van her du berheman berawird kirine. Tiştê balkêş ew bû ku wan tenê ew agadarîyên ku li ser bîyografiya Kurşun hebûn, ji rûpelên berhemên wî yên çapbûyî wergirtibûn. Wan bi Kurşunî re tu hevdişînek nekiribû û bi berfirehî behsa berhemên wî nekiribû.¹ Ji ber vê yekê pêdivî hat dîtin ku Kurşun bi tevî bîyografi û berhemên xwe bibe mijara lêkolîneke nû. M. Zahir Ertekin û Nurettin Ertekin (2017) lêkolîneke bi navê “Kurtedîroka Mewlûdnameyên Kurdî” di kovara bi navê *Uluslararası Sosyal Bilimler Kongresi* de weşandîye. Wan di vê xebatê de tenê navê mewlûdnameya Kurşunî zikir kirîye.

Piştî ku S. Kurşun rêya hevdişînek û hevpeyvînê da me, me pirsên xwe yên hevpeyvîn û mullaqatê, di çarçoveya mijara xwe de amade kirin, çend rojan li ser hev, me bi Şairî hevpeyvînên xwe kirin, dengên wî qeydî cîhazê kir û di dawîyê de ji deşîfrasyona wan sûd wergirt. Li ser bingeha agadarîyên ku me ji devê şa’irî bi xwe wergirtin û ji berhemên wî îstîfade kir, me binemal, bîyografi, ramiyariya wî, tîkîlîya wî ya bi tesewwûfê re, kesayetiya wî ya edebî û taybetmendiyên berhemên wî rapor kirin. Di pey berhevkirina daneyan û rapor kirina wan de, êdî dor dihê ser tesbîtkirina cihê Selmanî di dîroka edebiyata kurmancî de û polînkirina helbestên *Dîwana* wî. Ji bo vê jî me ji pirtûkên kurmancî û tirkî ku agadarîyên teorîk ên edebiyata klasîk didin mifa wergirt.

2. Binemala wî

Silêman Kurşun (Selmanê Belegewrî), kurê Mustefa, kurê Ehmed, kurê Muhemmed, kurê Ehmed, kurê ‘Ebbas, kurê Şeh ‘Elî, kurê Mistefa, kurê Şeh ‘Elî, kurê Hesên, kurê Îbrahîmê Koçer e. Navê bavikê wan, Belegewra ye. Belegewrî li gundê Midêlbê, qeza Kercewsê, di nav Hefizbinîyan de ne. Di gundê Midêlbê de du berek hene, yek jê bavikê Belegewra ye, yek jê eşîra Meqsûdan e. Meqsûdan ji dewrûberê Elezîzê ne, kurdên ‘elewî ne hatine wê derê. Hinek malbatên din jî di gund de hene. Îbrahîmê Koçer, bavê yemem ê Belegewran e û ew jî Hefizbinî ne. Hefizbinî, yan jî eşîra Benî Hefz in, ku ev eşîr ‘ereb e û ji pismamê Pêxember in (s.e.w), di Kinane bavê çardehan de digihên Cenabê Pêxember. Hinekan jî gotîye ku Hefizbinî, Hezbanî ne û Hezbanî jî, eşîra êla Selahedînê Eyûbî, xelkên Rewadî ne. Îbrahîmê Koçer, ji cihekî hatîye vî gundî. Bi awayê dîroka devkî (sr. mêjuwî zarekî) ev agadarî gihastîye îro. Gundê Midêlbê ya ku a niha heye, jê re zemanê berê xelkê gotîye “Gundê Jorî” û “Midêlba Xerabe”. Cografyaya vî gundî dîrî avê bûye, li jêrê jî kanî û dehl hebûne, li gund di salên 1890î de nexweşîneke giran a mîna kovîda 2019an derketîye, kurmancan jê re gotîye “qotik”, êşa ku kesî nahêle, bi yek derbê her kesî dide ber xwe, ji ber wê derketine hatine jêrê, nêzî dehl û kanîyê bûne. Pêşî Belegewran û hinek malbatên nemerivên hev ev der ava kirîye û paşê, êla Meqsûdan ji Elezîzê hatîye Mirdanê, Mirdanê ku nêzîkî Batmanê, çemê Bêdîya, Sêncê ye, ji wir hatine Midêlbê û bi cih û war bûne. Pêşî Belegewra û Mala Çawîş gundê Midêlbê ava kirîye. Mala Çawîş jî Hefizbinî ye. Di navbera Mala Çawîş û bavikê Belegewran de dubendî hebûye, ji ber vê, Mala Çawîş hinek bavên din û Meqsûdan anîne di gund de bi cih û war kirine, Belegewran jî hin bavikên din anîne gund da ku xwe bi wan biparêzin. Avjara² Belegewra bi vî awayî ye.

3. Jîyana wî

Navê fermî yê Seyda Selman, Silêman e. Tarîxa hatina wî ya dinyayê li gor nasnameyê 03.02.1951 e, lêbelê ew di payîza sala 1953yan de li Midêlbê hat dinyayê. Ew zaroyê heftan ê bavê xwe ye. Carinan genim jî li ber nanê cehî bi destê wan diket. Ji ber ku bavê wî xebatkar bû, wî kilfetê xwe miûz nedihîşt. Dîtina çavê Seyda ji piçûkahîyê ve kêmbû. Herçendî dikaribû bi tenê bigere û biçê ber berxik û karikan jî, dîsa dîtina wî kêmbû. Ew di çardasalîyê de digel xwarzîyê xwe çû ber pezê xwe jî.

¹ Ji bo berfirehiya gotarê bnr. Hasan Karaca û Nurettin Aykut, “Mele Hüseyin Bateyi’ nin Mewlid-i Nebî Adlı Eseri ile Mele Süleyman Kurşun’un Mewlida Pêxember Adlı Eserinin Karşılaştırılması”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, sal/yıl: 1, cilt/cıld: 1, sayı/hejmar: 2, Kasım/October/Mıjdar, 2015, r. 127-141.

² Bêjeya “avjar”, bi wateya ku di Qur’anê de dibêje “elem nexlukkum min main mehîn?” ava mehîn, yanî aveke jar. Ev bêje di nav kurmancan de bi wateya sulaleyê heye. Heta carinan di çêr û xeberên xerab de vê bêjeyê dibêjin, vê bêjeyê bi kar diênin. (Notê hevdişîna digel Seyda Selmanê Belegewrî)

Seyda piştî ku îcazeya xwe girt, di sala 1975an de li Batmanê, di Camîya Mala Şêx Ahmed, Camîya Êstilya de dest bi miderisiyê kir. Li wê derê wê hingê zewicî. Piştî çendakî ji Batmanê dagerîya Qeyntarê û hinekî ma. Bavê wî jê xwest ku li gund bimîne, lêbelê wî got ku divê ew kar û barên ilim berdewam bike. Bavê wî êdî kal bûbû û jê re got “Heke tu li malê nemînî, ez ji malê xwe tişteki nadim te.” Wî got “Tu bi kêfa xwe yî, malê te ye, tu nedî nadî. Lêbelê ez mecbûr im, ez ê derkevim û ders bidim. Îca tu, digel dêya min were cem min, ez ê xizmeta we bikim.” Bavê wî êdî 90 salî bû, çavê wî nedidît. Bavê wî qebûl nekir. Seyda digel malbata xwe çû Batmanê, li Camîya Hecî Mûsa li Mehela Koxika, çend mehakî melatî kir, piştî hat Dêrcinê, gundekî li ber ava Dicleyê ye, nêzî Qeyntarê ye. Salekê li vir ma, lêbelê feqî çê nebûn. Ji wê derê jî bi tevî peywendîyên xwe yên ‘Erebkendê, çû gundekî Qiziltepeyê/Qoserê, li mezra Ebdil’îmamê bi cih bû û dest bi tadrîsata feqîyan kir. Ji ber ku di wextê feqîtiya xwe de bi awayê nihênî radyoyek peyda kiribû û li radyoyên tirk û ereban bi qaçaxî-dizî guhdarî kir, erebîya wî ya ‘esrî jî gelek xweş bû.

Di wextê ku muxtîreya 1972yan de sikiyonetîm rabûbû û seydayan ebeden nikaribû feqî xwedî bikirina. Medrese bi carekê vala bûn. Seyda 6 salan li vî gundî ma û dersa 27 heft feqîyan da. Wê zekata ku gundîyan dida Seyda, wî digel feqîyên xwe pê îdareya xwe dikir. Malîyên wî xwarina feqîyan amade dikir. Piştî ew derbasî Tiltihêmkê bû, nêzî Dirbêsiyê ye, gund xweş bû û feqî jî hebûn. Ji sala 1984an heya sala 1993yan li vê derê ma. Seyda ji ber mercên giran ên tevgerên sîyasî neçar ma ku biçe Kurdistana Iraqê, çendakî li wir ma, peyra vegeyîya çû Stenbolê û çendakî li wê derê ma, çendakî jî li Ewrûpayê ma. Niha li Dîyarbekirê medreseya wî heye û bi terzê zemanê berê tadrîsata medreseyê berdewam dike.

4. Tehsîla wî

Belegewrî cara ewil li cem melayê gund Mela Ehmed ku salmezî û pîremêrekî gundê wan Qeyntarê bû dest bi xwendinê kir. Dilê bavê wî gelek pê re bû, digot “Ez herim, kesî ku lê miqate bike tune ye, nikare kar bike. Îca xweşîya dinya û axretê tev di ilim de ye, bira ji xwe re bixwîne.” Ji bo vê jî, hîn ew biçûk bû, bavê wî ew hînî nimêjê kir. Berî ku ew biçe ber destê melê û dest bi xwendinê bike, wî ew hînî nimêjê kir. Heta hîn di şeş-hefsalîyê de dest bi rojîyê kir; lêbelê bavê wî lê midaxele kir. Bavê Belegewrî, ew ji piçûkatîyê ve da ber xwendinê û zêde zêde li xwendina wî miqate kir. Dîsîplineke zêdeyî adetê nişan da. Wî nehişt ku di nav zarokan de bilîze û xwe bi tiştên derî xwendinê mijûl bike. Heta roj hat ku wî li ser xwendinê lê da. Gava sebîyê wî xwe ji xwendinê re sist bikira, yan jî ji ber xwendinê birevîya, bavê wî lê dida.

Bavê Feqî Silêman (Selman)³ piştî ku fehm kir dê lawê wî li gundê xwe xwendina Qur’anê bi pêş nexa, wî ew di dehsalîya wî de şand gundê Candêrê ku li rojavayê Batmanê dimîne. Li Candêrê jî xaltîya wî hebû û wê lê miqate kir. Wî du salan li Candêrê, di navbera salên 1965 û 1967an de bi qasî salekê li ber destê Mele Ehmedê Eskîfê, salekê jî li cem melayê gundê Candêrê Seydayê Mele Remezanê Boçerlî ku Boçerlî gundekî Bismilê ye xwend û Qur’ana xwe jidev/jiber kir. Peyra çû Koxika, li wir kitêba bi navê *Bînayê* xwend, ji wir çû Himêdîyê li ber destê melayê gund Seydayê Mela Simailê Hewrî, dest bi xwendina kitêbên din kir. *Xayet, Emsîle, Izzî...* Li wê derê tayînên xwe ji nav gund dan hev. Seydayê Mele Simailê Hewrî, li Himêdîyê çawa ku bi salihî û teqwatîya xwe navdar bû, wisa jî bi mîzaha xwe meşhûr bû. Mizgefta gund hinekî dirêj û tarî bû, mîna şikeftan bû. Cihê feqîyan teng bû. Wî li wê derê bi tevî sê feqîyan xwend. Rûdaneke nexweş li wir hat serê wan û ji wir derket careke din vegeyîya hat Candêrê cem Mela Remezanê Boçerlî. Herçiqas xwendin qedexa bû jî, Seydayî ew ezimandin û bi awayê nihênî ders da wan. Pir zêde jî ked û emek bi wan re da. Wê hingê gava wan bidîta ku cemseyek an jî makîneyek ji Batmanê bihata, feqîyan xwe di nav geniman de vedişart. Belegewrî, li Candêrê *‘Ewamilê* xwend.

Piştî çendakî Belegewrî ji Candêrê çû Kalikîya Silîva cem melayê gund Mela Ebdirehmanê Boçerlî. Wî li wir *Zurûf, Terkîb û Şerhu’l-Muxnî* heta “Behsa Îstîsna”yê li cem Seydayê Mela Ebdirehmanê Boçerlî xwend. Wê havînê Feqî Silêmanê Belegewrî çû Batmanê, camîya Mele Fexredîn. Seydayê Mele Fexredîn û feqîyên xwe li Basorkê bûn, muezîna wî Mele Hesênê Îlozî, li camîyê bû û hinek feqî jî li wir hebûn. Wî jî li cem Seydayê Mele Hesên cihê xwe çê kir û kitêba *Sadîni* xwend. Dêrdora deh mehan li vir ma. Seydayê Mele Fexredîn û feqîyên xwe jî di dawîya payîzê de vegeyîyan camîyê, hejmara wan gihîşt dêrdora 25 heban. Feqîyên jêr li cem

³ Herçendî navê rasteqîn û fermî yê şairê me Silêman e jî, li ser terciha wî bi xwe, di vê xebatê de navê wî yê Selmanê Belegewrî hat nivîsîn.

Seydayê Mele Hesên dixwend; talibên mezin jî li cem Seydayê Mele Fexredîn dixwendin. Li vê derê Feqê Silêman *Sadîni* xelas kir, dest bi *Helê* kir. Ew jî wê derê jî çû Êrmîyê ku gundekî Batmanê ye, nêzî Sîtayê ye, li wê derê li cem Seydayê Mele Şewketê Şêxo ku xelkê wî gundî bû *Hel* qedand. Mele Şewket ji Mala Mîrze ye, bavê wî mezinê gund bû, ew xelkê Recebî ne, navdar in.

Seyîd ‘Elîyê Serdêfî ku li cem Mele Fexredîn kitêbên xwe qedandin, bû melayê Kurêşa ku gundekî Farqînê ye. Feqî Silêman jî çû cem wî û sê çar mehan *Sadulla Gewra* li cem wî xwend. Seyîd ‘Elîyê Serdêfî, wê hingê bû zavayê Mele Emînê Heyderî. Wan rojan Mela Silêmanê Belegewrî, digel hevalê xwe çû gundê Çirikê ku li bakurê Kurêşa bû û Cadê ku li qibleyê Kurêşa bû. Li Çirikê Seydayê Mele ‘Elîyê ku wextakî melayê Zîla bû, ders dayê, li gundê Cadê jî Seydayê Mela Şemsedîn ders dayê. Ji wê derê jî çû ‘Erebkendê, alîyê Bismilê, li wir feqî tune bûn; lêbelê tesewuf hebû. Mela Silêman jî ‘Erebkendê hat Bileyderê, cem Seydayê Mele Îzedîn ku gundiyê wê derê bû. Li vê derê *Sadulla* xwend. Li wê derê feqîyan jê çavtengî kir û neçar ma, ji wê derê vegeyîya Êrmîyê û li cem Mele Şewket dest bi tehsîla *Suyûtîyê* kir. Piştî çendakî jî wê derê hat gundê Candêrê, li cem Seydayê Mele Remezân *Suyûtî*, *Camî* û *Muxnîtulab* xelas kir û dest bi *Qûl Ahmed* kir. Peyra Mela Silêmanê Belegewrî hat Batmanê, Camîya Seydayê Mele Mihemed Şerîf li Mehela Koxika *Qûl Ahmed* xelas kir. Ji wê derê careke din vegeyîya Candêrê. Li Candêrê *Rîsala Wed’ê*, *Îsama Îstîfareyê*, *Weledîya Munazerê*, *‘Ebdulxefûr Haşîya Camîyê*, *Şerhu’ş-Şemsîye*, *Muxterser* û *Şerhu’l-Eqaid* xelas kirin.

Belegewrî ku di 1968an de dest bi tehsîla kitêban kiribû, di sala 1973yan de li cem Seydayê Mele Remezân ku *Şerhu’l-‘Eqaid* qedand, êdî hatibû *Cemu’l-Cewami’ê*. Wê hingê feqîyan çend ders jî vê kitêbê dixwendin û îcaze digirt. Ji wê derê hat Yuvacixê ku li ser rêya Batmanê ye, piştî Uçyola Çinarê ye. Li wê derê Seydayê Mele Mihemedê Cimzerqî Xerzî hebûye, li cem wî *Cemu’l-Cewami’ê* xelas kir. Seydayê Mele Mihemedê Cimzerqî Xerzî, bi awayekî cidî kara îcaza wî kir, pere da hev û dengê îcazedayînê belav bû, heta gihast ‘Erebkendê. Seydayê ‘Erebkendê xeber şand pey Mele Silêman û got bila ‘acil were ‘Erebkendê. Ew jî çû wê derê. Li wê derê îcaze wergirt û careke din vegeyîya Candêrê û alî Seydayê xwe kir û di medreseyê de dest bi dana dersan kir. Carinan jî diçû zîyareta seydayê xwe yê ‘Erebkendê û bi mehan li wir dima. Nediçû malê.

5. Tesewwufa wî

Mela Silêmanê Belegewrî li ‘Erebkendê di tesewwufê de întîsabî Seydayê Mele Mihemedê ‘Erebkendî kir. Bi pênasekirina Belegewrî ew ‘alimekî navdar û şêxekî zêde camêr bû. Xizmeta îrşadê dikir, êdî dersa feqîyan nedida. Mela Silêman, wekî tebarik, dersa xwe ya serê kitêbê li bal wî xwend. Piştî Seyda Silêman çû ‘Erebkendê, digel ku wî îcaze nedida feqîyan jî, di sala 1974an de îcaze dayê. Digel ku feqîyên wî, ji alimên mezin bûn jî, wî zû bi zû îcaze nedida wan. Wî berî Mela Silêmanê Belegewrî tenê îcaze dabû sê feqîyan.

Mela Silêmanê Belegewrî herçendî jî Şêxên ‘Erebkendê îcazeya ilmî wergirtîye jî û îrfaneke gelek berfireh girtîye û pê re meşîyaye jî, wî xelîfetî jî wan wernegirt. Ji ber meşxûlîyeta xwe ya ilmî, ji sala 1983yan pê ve, jî wê camîyê veqetîya. Ji ber ku dildarekî mezin ê Mala Şêx Seîd Efendî bû, wî destûra xelîfetîyê jî dergehê wan wergirt. Wî xelîfetîya xwe ji destê Şêx Mihemed Seîd ku nevîyê Şêx Seîd e wergirt. Şêx Mihemed Seîd di salên 1990î de postnişînê terîqeta Mala Şêx Seîd Efendî bû. Wî îzna îrşadê jî da Mela Silêmanê Belegewrî. Medrese û tekîyaya Mala Şêx Seîd Efendî a niha li Pîranê heye. A niha jî Seyda mensûbê wan e û di nav kar û barên tadrîsata ilim de bi wan re dixebite. Mela Silêmanê Belegewrî, bi mexlesa **Selman** di qesîdeya “Em di Zivistanê de Hatîn” de wekî alim û mutesewwufekî, tekyaya murşidan wekî cihê tedawîya dilê xwe dibîne û hizra xwe ya têkildarî tesewwufê weha derdibire:

Revyame tekya murşidî, dermenageha qelba ye ew

Ez çûm bi ser pesnê sitemkar, bel’amistana ve bûm (Kurşun, 2002, s. 18)

Mela Silêmanê Belegewrî, berhemeke bi navê *Îrfan ve Davet*, li ser mijara tesewwufê bi zimanê tirkî nivîsîye û hîn nehatîye çapkirin.

6. Kesayetiya wî ya Ramyarî

Di serdema salên 1985-1993yan de Seydayê Belegewrî êdî bi tevgerên dînî, civakî û sîyasî re eleqedar bû. Înqilaba Îranê bala wî kêşa. Kêfa Seyda ji kitêbên alimên tevgera Misrê, Îxwanê Muslimîn re hat. Tiştê ku hebû, hîn wextê ku wî kitêba *'Ewamil* dixwend, gundîyê wî Hecî Mahmut Demir, rojên înan Mela Silêmanê Belegewrî diçû cem wî û pê re sohbet dikir. Wî bi rêya behsa Mala Berzanî, dilê Belegewrî li doz, maf û dîroka kurdan vekir. Wî di her sohbetê digot ku “Mala Berzan dê welatê kurdan azad bikin û qanûna şerîetê çê bikin.” Bi vî awayî hisa milî pê re çê bû. Bi gotina wî, înqilaba Îranê û kitêbên Îxwan, hebekî ew hisa wî ya milî kêm kir; bes vê di dilê wî de cihê xwe girtibû.

Li Tiltihêmkê Seyda bi awayekî gur û geş dest bi xebatên ilmî û ramyarî kir. Serîyekî çû Îranê, serîyekî çû Stenbolê û ziyareta îlahiyatên Tirkîyeyê kir. Di rêya hîqûqa Îslamê de xebitî. Wî derdora kesên ku bi navê “Terzê Îslama Nermerê” dihatin binavkirin şopand û kêfa gel ji wî û hevalên wî re hat. Çi heye ku ev xebata wî li xweşa hin tevger û derdorên din neçû û wan dijminahîya wî û hevalên wî kir. Lewra wî ev hewldan û kovanên dilê xwe teyîsandin ser metnên edebî û bi rêya menzûmeyan ew derbirin.

7. Berhemên wî

7.1. Ez û Hevalekî Hêja

Ji ber şa'irî di vê menzûmeya bi terzê mesnewîyê de pesnê hevalê xwe daye û tiştên ku di rêya ronakbîrîyê de hatîye serê wan derbirîye. Loma mirov dikare vê menzûmeyê ji cureyê mesnewîyan wekî mesnewîya civakî bihesibîne. Hejmara malikên vê mesnewîyê 54 e. Çinku pisporên edebîyata klasîk, (Adak, 2019, s. 345) wan helbestên ku çand û civakê dikin mijara xwe, di bin vê kategorîyê de bi cih dikin. Belegewrî ev menzûme wekî serpêhatîyekê hûnaye.

Ev hevalê ku şair di menzûmeya xwe de behsa wî dike, Mela Ebdulhekîm Deniz e, bi eslê xwe seyîd e, ji Qertmînê, ji Mala 'Emer e. Di zemanê xwe de alimekî navdar bû. Ji ber ku rastî hin neheqîyan hat, ji kerban di sala 2002yan de rehmet kir. Ji be vê, Belegewrî li ser vî hevalê xwe ev menzûme nivîsî.

7.2. Her Sê Bela

Şair ev helbesta xwe bi terzê mesnewîyê hûnaye. Ji ber ku mijara wê, tevger û rûdanên civakî yê serdema wî ne, dibe ku mirov wê weke mesnewîyeke civakî ya “hicwî” bihesibîne. Çinku şair rexneyên giran li hin tevgerên serdema xwe dike. Hejmara malikên wê 32 ye.

7.3. Şeş Qonaxên Dozê

Şa'irî ev helbesta xwe ya bi terzê mesnewîyê bi mebesta exlaqekî xweş ê Îslamî ji bo miletê xwe hûnaye. Ji ber vê sedemê mirov dikare vê menzûmeyê, ji cureyên mesnewîyên dîdaktîk, di bin banê “mesnewîyên exlaqî” de bihesibîne. Temamîya wê 51 malik e.

7.4. Cenga Cîhanê ya Sêyem

Belegewrî ev menzûme di terzê “mesnewîyeke şîretnameyî” de hûnaye. Bi taybetî rêya dewletbûnê ji bo gelên muslim û ummeta Îslamê nîşanî gelê xwe dide. Çawa ku Adak (2019: 342) amaje bi cureyên mesnewîyan dike, hin mesnewîyên dîdaktîk hene ku dikevin bin banê “mesnewîyên dîrokî” jî. Gava şairek, mesnewîya xwe bi armanca fêrkirina dîrokê bihûne, ew dibe “mesnewîya dîdaktîk a dîrokî”. Hejmara malikên wê 53 ye.

7.5. Mirin

Şairî ev menzûmeya xwe bi terzê mesnewîyê hûnaye û temaya wê mirin e. Ew bi vê menzûmeyê hewl dide ku mirovên muslim dilê xwe ji qirêjîyên dinyayê paqij bikin û bibin mirovên baş û çê. Lewra mirov dikare wê wekî “mesnewîyeke dîdaktîk a exlaqî” û “pendname”yê li qelem bide. Hejmara malikên wê 48 e.

7.6. Rastî Pîroz e

Seyda ev menzûme bi terzê mesnewîyê hûnaye û giringîya rastîyê di her biwarê jîyanê de nîşan dide û şîreta hevgerîna û aqûbeta li ser heq û edaletê li gelê xwe dike. Ji ber vî alîyê wê, mumkin e ku mirov vê menzûmeyê jî bixe bin banê “mesnewîyên exlaqî-pendnameyî”. Temamîya vê menzûmeyê 19 malik e.

7.7. Bextreşî Qedera Me Nîn e

Belegewrî ev menzûme bi terzê mesnewîyê hûnaye û xitabî kurdan dike. Ew di vê menzûmeyê de piştî ku hinekî raborîya dîrokî ya rûdan û tevgerên hiqûqî yê gelên dinyayê derdibire, şîret li kurdan dike da ku li ser bingeha Kitab (Qur’an) û Sunnetê ji bo maf û azadîya xwe bixebitin û hêvîdarîya xwe ji Rebbê xwe nebirin. Lewra dirûvê vê menzûmeyê jî dide “menewîyên dîdaktîk ên dîrokî”. Temamîya vê menzûmeyê 30 malik e.

7.8. Tûj Awirek li ser Vê Bextreşîyê

Belegewrî ev menzûme bi terzê mesnewîyê hûnaye û di vê menzûmeyê de şîret li kurdan dike da ku di rêya azadîya xwe ya millî de nekevin bêhêviyê. Ji ber vê taybetmendîya wê, mirov dikare li gor zanînen teorîk ên edebîyata klasîk, vê menzûmeyê, ji cureyên mesnewîyan, wekî “mesnewîya dîdaktîk a exlaqî-pendnameyî” bihesibîne. Temamîya vê menzûmeyê 32 malik e.

7.9. Serencam

Seyda Selman ev menzûmeya xwe bi terzê mesnewîyê hûnaye. Temamîya wê ji 38 malikan pêk dihê. Bi tevî ku di menzûmeyê de mirov rastî beytên hicwî û beytên dîroka rûdanên civakî dihê jî, bi giştî dirûvê mesnewîyeke dîdaktîk a exlaqî-pendnameyî didê. Bi taybetî wekî şîretnameyekê xuya dike. Wî hewl daye ku şîretên têkildarî azadîya millî bide xwendevanên xwe. Ev menzûme di nav *Dîwanê* de cih girtîye.

7.10. Serencama Dîwanê yan jî Perçekê Selewatan

Şairî ev menzûmeya xwe di terzê mesnewîyekê de hûnaye. Ji ber ku mesnewîyên munacatî, ji hêla naverok û cureyê xwe yê edebî ve di bin banê “mesnewîyên lîrîk” de cih digirin, mirov dikare vê mesnewîyê jî wekî “mesnewîya lîrîk a dînî” li qelem bide. Çinku mesnewîyên lîrîk ên dînî, ew cure menzûme ne ku tema û mijara wan, têkildarî Xwedayê teala û Cenabê Pêxember e (Adak, 2019, s. 328-329). Temamîya wê 47 malik e.

7.11. Serokê li Dû Wehyê

Selmanê Belegewrî ev menzûmeya xwe bi terzê mesnewîyê hûnaye. Dirûvê wê dide mesnewîyeke dîdaktîk. Çinku şa‘ir tê de şîretên dînî û millî li serokê gel û gel bi xwe dike. Hejmara malikên wê 35 e.

7.12. Komara Daristanê û Femandarîya Şêr û Meymûnê

Navê tam ê vê menzûmeyê, *Komara Daristanê Welatê Sosreta Femandarîya Şêr û Meymûnê* ye. Nivîskarî ev menzûmeya xwe, di sala 2001ê de nivîsîye û di nav *Dîwana* nivîskarî ku di sala 2002yan de hatîye çapkirin de hatîye bicihkirin; lêbelê qenaeta me ew e ku divîya jê cîya bûya. Çinku di nerîta çanda pirtûkên dîwanê de, menzûmeyên şa‘iran, li derveyî dîwanên wan dihên hiştin.

7.13. Dîwan⁴

Şair, ew şîrên xwe yê ku di navbera salên 1985 û 2002yan de hûnane tê de bi cih kirine. Wî navê *Rêbaz* (Dîwana Yekem) li vê dîwana xwe danîye û di nîsana sala 2002yan de li Stenbolê ew çap kirîye.

Belegewrî bi xwe jî “pêşgotinek” di serê *Dîwanê* de bi cih kirîye û tê de behsa *Dîwana* Cizîrî, Xanî, Cegerxwîn û Seyîd ‘Elîyê Fındîkî û şîrên wan dike. Bi awayê ku diyar dike ziman, çand û torevanîya kurdan bi xêra ehlê medreseyê maye. (Kurşun, 2002, s. 14) Di *Rêbazê* de 17 qesîde, 12 helbestên mesnewî û 12 ruba‘î hene. Mirov

⁴ Taqîkirina *Dîwanê*, bi alîkarîya hevpeyvîna digel hûnerê (nivîskar) wê Seyda Selman bi xwe hatîye nixandîn. (Tarîxa hevpeyvînê: 02.06.2023)

dikare ji van helbestên wî yên bi terzê mesnewîyê, hinekan wekî helbest; hinekan jî wekî mesnewîyên serbixwe bihesibîne. Wî gelek behrên wezna ‘erûzê di şî‘irên xwe de bi kar anîne. Di *Dîwana* wî de teşeyê nezmê yê bi terzê “xezel”ê tune ye. Wî di van şî‘iran de mexlesa “Selman” bi kar anîye.

Şairî murebbe‘a xwe ya bi navê “Kesera Xurbetê” hûnaye, wî ew wekî rexneyeke civakî nivîsîye û ew tê de gilî û gazine xwe li heval û hogirên xwe dike; bi rûba‘îya xwe ya “Rista Xebatê” ku wekî hêvîdariyêke civakî hûnaye, li ber dilê gelê xwe dide da ku nekeve nexweşîna bêhêvîtiyê.

Piraniya “qesîde”yên şa‘irî rexneya li tevger, sîstema desthilatdar û rûdanên serdemê ne, hinek jî jê medhiye ne ji bo kesayetên navdar ên welatparêz ên civaka kurd. Şa‘irî qesîdeyên xwe yên bi navê “Em di Zivistanê da Hatî” û “Em bi ser Biharê ve Bûn” bi behra recez *mustef‘ilun mustef‘ilun mustef‘ilun* hûnane. Mirov ji temaya qesîdeyên wî tê digihîje ku wî gelek zêde ji navdarên kurd ên sîyasî-Îslamî hez kirîye û ji bo wan medhiye nivîsîne. Şa‘irî ferhengokeke kurmancî-kurmancî li dawîya *Dîwanê* zêde kirîye.

7.14. Mewlida Pêxember

Belegewrî ev menzûmeya xwe ya *Mewlida Pêxember* bi terzê mesnewîyê nivîsîye û di sala 2010an de Pak Ajans Yayincılık ew bi alfabeya latînî û erebî çap kirîye. Nivîskar bi rêbazeke nû menzûmeya xwe ya mewlidê nivîsîye. Wî metneke dirêj ku di dilqê meqaleyekê de ye jê re wekî “Pêşgotin” nivîsîye û ew tê de rexne li mesnewîya Bateyî ya mewlidê digire. Bi qenaeta wî zimanê mewlida Bateyî giran e (Kurşun M. S., 2010, s. 14) û ev mewlida wî ya nû, dê tenê ji rastîyan pêk bihê. Wî pêşî, “armanca afirandina heyînê” (17 malik) kirîye mijar û piştî ku “rewşa ‘ereban a berî Îslamê” (20 malik) derbirîye, êdî rasterast dor anîye ser mijara “merheba”yê (26 malik). Ji vir bi şûn de êdî bi dorê wî ev mijar vegêrane: Çêbûna cenabê Pêxember (25 malik) heta serdema pêxemberîya wî (13 malik), kesayetiya wî (15 malik), miameleya wî ya digel xelkê malbata wî (26 malik), miameleya wî bi civakê re (23 malik), miameleya wî bi jaran re (16 malik), miameleya wî bi kar û karkeran re (9 malik), dilovanîya wî (11 malik), dadperwerîya wî (9 malik), comerdîya wî (14 malik), teqwaya wî (7 malik), diayên wî (7 malik) û bi dozdarîya wî ya ji bo heqqîyê (44 malik) diqede. Bi vî awayî dike 275 malik.

Seyda Belegewrî di pey metna nezmî ya mewlidê de cih daye “diaya pexşan” a bi kurdî ya mewlidê jî. Li binê wê jî dîyar dike ku wî ev mesnewîya mewlidê, roja îne, di 12ê meha Rebûlewwela 1423yan de qedandîye. Ev jî di salnameya zayînî de rastî 23yê Gulana 2002yan tê. Seyda ferhengokeke kurmancî-kurmancî jî di dawîya metnê mewlidê de bi cih kirîye.

8. Wergerên wî

8.1. Tefsîra Qur’anê

Nivîskarî ev tefsîr qedandîye û ji çapê re amade ye. Bi awayê ku ew dîyar dike, wî ev tefsîr, li ser bingeha “tefsîra dirayetê” û “tefsîra rîwayetê” amade kirîye. Lê piştî ku me venihêrînek kir li ser metnê, me dît ku ev berhem mealeke tercumeyî ye, ne tefsîreke temam e.

8.2. Çağrı Ayetlerinin Meali

Nivîskarî 600 ayetên Qur’anê ku mirovan vedixwînin hîdayetê wergerandine zimanê tirkî û wekî dosyayekê ji çapê re amade kirîye.

8.3. Meala Ayetên Bangewazîyê

Seyda Selman 600 ayetên Qur’anê ku mirovan vedixwînin hîdayetê wergerandine kurdîya kurmancî û wekî dosyayekê ji çapê re amade kirîye.

8.5. Meala Qur’anê

Ev xebata wî di şewatekê de telef bûye.

8.6. Dendikên Rastîyê

Nivîskarî berhema Seîd Nûrsî ya bi navê *Hakikat Çekirdekleri* ji zimanê tirkî tercumeyî kurdî kirîye û şiroveya wê jî bi kurdîya kurmancî nivîsîye.

8.7. Kela Mirovê Misilman

Mela Silêman berhema Seîd b. ‘Elî el-Qehtanî ya bi navê *Hisni’l-Muslim* bi hevkarîya M. Huseyn Êsî ji zimanê erebî wergeraye kurmancî û Arya Basım ew li Stenbolê çap kirîye. Wan bi wergera vê berhemê xwestîye diayên sehîh ên Cenabê Pêxember bigihînin kurmancên muslim.

8.8. Îrfan ve Davet

Belegewrî ev berhema xwe li ser pîr û edebên tesewwufê bi zimanê tirkî bi awayê pexşan nivîsîye.

Tasnîfa menzûmeyên Belagewrî				
Mesnnewîyên Lîrik ên Dînî	Mesnnewîyên Dîdakîk ên Dîrokî	Mesnnewîyên Cîvakî	Mesnnewîyên Dîdakîk ên Exlaqî (Pendname)	Mesnnewîyên Munacatî
1. Mewlida Pêxember 2. Mesnewîya Munacatê	Cenga Cihanê ya Sêyem	1. Her Sê Bela 2. Ez û Hevalekî Hêja	1. Komara Daristanê û Femandarîya Şêr û Meymûnê 2. Mirin 3. Bextreşî Qedera Me Nîne 4. Rastî Pîroz e 5. Tûj Awirek li Vê Bextreşîyê	Perçekê Selawatan

Tasnîfa berhemên Selmanê Belegewrî			
Berhemên edebî	Berhemên dînî	Berhemên tesewwufî	Berhemên zanistî
1. Dîwan 2. MenZûme	1. Mewlid 2. Diaya Mewlidê 3. Tefsîra Qur’anê 4. Çağrı Ayetlerinin Meali 5. Meala Ayetên Bangawazîyê 6. Kela Mirovê Misilman 7. Dendikên Heqîqetê	1. Îrfan ve Davet	1. Pêşgotina Mewlidê 2. Pêşgotina Dîwanê

9. Kesayetiya wî ya Edebî

Ji ber ku Selmanê Belegewrî di nav seqayeke zehmet a medreseyên kurdan de gihastîye û di nav çanda dergayên wan ên tesewwufê de mezin bûye, kesayetiya wî jî, reng û rûyê alim, murşid û edibên wan girtîye. Wî çawa ku ilmê xwe qedandîye, dest bi perwerdeya tesewwufê kirîye, hem bi ilm û xizmeta tesewwufê re mijûl bûye hem di medreseyên halê hazir de ders daye, hem jî wî bi xwe medrese vekirine û tê de mideristî kirîye. Wekî alimekî devera kurdan, çawa ku bi ilmê xwe yê Îslamî derketîye pêş, wî ilmên edebî jî daye ber xwe li serê kûr bûye. Wî di medreseyên xwe de bi tevî ilmên bingehî yê Îslamî, dersên edebîyatê, bi taybetî *Dîwana Cizîrî* bi derskî jî dane telebeyên xwe. Bi taybetî wî dîwanên edibên edebîyata erebî, farisî û tirkî jî tehsîl kirine û di pey wan de wî dîwanên şairên kurd ên mîna Cizîrî, Xanî û Cegerxwîn jî bi derskî dane xwendin.

Seyda Selmanî bala xwe daye ser edebîyata kevnar a erebî û şîrên şa’irên ‘ereb ên berî serdema Îslamê xwendine û li ser wan kûr bûye. Wî ji edebîyata serdema “Muelleqatê Seb’e” dest pê kirîye û heta edebîyata erebî ya serdema Îslamê mitale kirîye. Ew wan şairên zemanê Hz. Pêxember jî nas dike û wî berhemên wan xwendine. Wî şairên navdar ên edebîyata erebî yê pêşî Ke’ib û Zûheyr ên serdema Hz. Pêxember xwendîye, peyre şairên wekî Ferezdeq, Cerîr û Extel ên serdema Emewîyan û şairên serdemên piştî wan ên mîna Mutenebbî, Şerîfê Reddî û Ebû’l-Ela Muerrî xwendine. Di pey wan de wî şairên îrfana tesewwufê jî xwendine. Wî berhemên Ibnu Farid û Şêx Abdulqadirê Geylanî, bi tevî şerhên wan xwendine. Piştra wî bala xwe daye ser edibên ereb ên nû yê mîna Ahmed Şewqî jî. Di zemanê feqîtîyê de ew digel hevalên xwe, ketine pêşbazîya jîdevkirina şî’rên ‘erebî jî.

Şa'îrî bi rêya radyo û televîzyonê hînî zimanê farisî bûye, *Dîwana* Hafiz mitale kirîye; lêbelê bi farisî tiştek nenivîsîye. Şa'îr, ji edebîyata tirkî bi taybetî li ser *Sefahata* Mehmet Akif Ersoy xebitîye. Di pey pêvajoyeke zor û zehmet a serdema xwe de, wî zend û bendên xwe li hev hildane û dest pê kirîye, şî'îrên xwe bi peyka şa'îrên berî xwe hilberane. Bi taybetî wî berê bala xwe daye ser şêwaza Cizîrî, Xanî, Seyîd 'Elîyê Findikî, Cegerxwîn û Tîrêj. Ew gelek qîmet dide şî'rên Tîrêjî. Wî hewl daye ku *Dîwana* Cizîrî, *Dîwana* Xanî û peyra jî *Dîwana* Selman bixe nav mufredata medreseya xwe û bi vî awayî dersên edebîyatê jî di nav dersên medreseyê de bi cih bike. Ji bo vê jî wî pêşniyaza xwe ji bo alîkarîyê birîye cem pisporên edebîyata kurdî jî.

Çawa ku zimanê şî'îrên Selmanê Belegewrî, ji hêla şêwazê ve dirûvdarê zimanê Cegerxwîn û Tîrêj e, temaya şî'îrên wî jî li ser wê çexerê ye. Tiştê ku heye şî'îrên Selmanî, ji hêla bawerîyê ve ji terz û terhê Cegerxwîn cîya dibin û bêtir nêzî terzê Tîrêj dibin. Haya şairî ji şî'ra Abdurrehman Durre jî heye û pê re peywendîya wî çê bûye. Wî hem şiroveya Durre ya *Dîwana* Xanî mitale kirîye, hem jî *Dîwana* wî bi xwe xwendîye û wî diçibîne. Bi tevî van wî *Dîwanên* Mela Seîdê Xelatî, berhemên Mela Mihemedê Zinarexî, *Dîwana* Mela Zahirê Tendûrekî xwendîye. Gelek şairên kurmanc ên serdema me jî şî'îrên xwe ji Selmanî re dişênin û nêrînên wî daxwaz dikin. Bi qenaeta wî şairekî derveyî medreseyê nikare bi terzekî baş ê klasîk binivîse.

Wekî nerîta edebî, mirov dikare Seyda Selman, yek ji wan şa'îran ku têkoşîna millî ya kurdan ji bo hunera xwe dikin esl û esas bihesibîne. Li vê derê jî dîsa ferqeke wî ya xweser derdikeve pêş ku wî di *Dîwana* xwe de bîr û bawerîya xwe, li ser bîngeha ilim, îrfan û millîyetparêzîyê vegêraye. Bi awayê ku ji bîyografiya wî diyar dibe, wî helwesta Xanî ya tîkildarî gelê kurd di dilê xwe de hewandîye û bi stîla Cegerxwîn ketîye nav liv û tevgera edebî.

Lewra ew di berhemên xwe de hem hezkirina ji Ehlê Beytê, hem Ehlê Sunnet û Cemaetê û hem jî Ehlê Tesewwufê derdibire. Ew ne dûrî hezkirîyên Ehlê Mala Cenabê Nebî ye, ne dûrî dilxwazên hiqûqa Îslamê ye, ne dûrî ehlê tesewwufê ye û ne jî dûrî derdor û tevgerên azadîxwaz ên welatparêzên kurdan e. Ji ber ku di pêvajoya jîyanê de bi van hemû derdoran re peywendîdarîya wî çê bûye, ev gişt teyîsîne ser temayên şî'îrên wî. Di vê pêvajoyê de bivê nevwê wî bedelên giran jî di vê rêyê de dane û ev tehde û ezîyetên ku ji ber vê helwesta wî ya rexê mixalîf hatine serê wî jî, dîsa bi awayekî karîger cih di *Dîwana* wî de digirin. Ew kesayetên dîrokî yên navdar ku di ber mafên kurdan de keda wan heye, bi awayekî gelek zexm ketine nav rûpelên *Dîwana* Selmanî. Bi vî awayê xwe Selman, di nav dîroka nerîtên edebî yên edebîyata kurdî de ji xwe re stîleke cîyawaz û cihekî taybet çê dike. Bi peyka *Dîwana* wî ew di nav nerîta wan şa'îran de cih digire ku "millîyet" a xwe, digel dîne xwe bi hev û din re diparêzin. Seyda Selman li ser vê bîngehê, bi navê *Rêbaz* dîwanek digel pêşgotînekê nivîsîye ku tê de çawa mesnewîyên dîdaktîk ên exlaqî, dîrokî û hicwî hene, mesnewîyên lîrik ên dînî jî hene.

10. Perwerdekarîya wî

Seyda Selman, bi tevî hewldanên vekirina medreseyan û dersdayîna telebeyan, menzûmeyên dînî jî nivîsîn û hewl da ku bi rêya wan gelê xwe digel ummetê bi alîyê rasteqîn ê dîne Îslamê serwest bike. Ji ber ku Seyda zêde zêde bi hesreta hiqûqa Îslamê ye, di vê rêyê de ew hem beşdarî sempozyûman bû hem jî bi zimanê kurdî û tirkî berhemên menzûm û peşşan nivîsîn. Wî mewlidê, meal-tercumeyeke Qur'anê, mektûbat, fetawa, dawet û îrfan nivîsî. Wî ev têkoşîna hem bi zimanê kurdî hem jî bi zimanê tirkî berdewam kir. Wî carinan bi berhemên telîfê, carinan jî bi berhemên wergerî kar û xizmet kir.

Encam

Silêman Kurşun, wekî alimekî edîb û perwerdekarekî mutesewuf ê sedsala XX-XXI-ê, di medreseyên kurdan de mezin bûye û li ser şop û çexera alim, edîb û mutesewwufên edebîyata kurdî yên mîna Xanî, Koyî, Pîremêrd, Cegerxwîn û Tîrêj, di biwarê edebî, hizrî û tesewwufî de gihastîye. Wî çawa ku berhemên xwe yên edebî û hunerî li ser vê bîngeh û şopê hûnane, wî berhemên xwe yên zanistî jî li ser vê tradîsyonê nivîsîne. Hem ji bîyografi, berhem û kesayetiya wî ya edebî û ramyarî, hem jî ji lêkolînên ku heta niha li ser wî û berhemên wî hatine kirin diyar bû ku Belegewrî, piştî ku di vê çexerê de ji alîyê bîr û raya xwe ya ramyarî ve xwe baş gihandîye, wî li ser asasê nerîta edebîyata kurdî ya neteweperwerîyê, di pile û payeyeke bilind de berhemên menzûm ên edebî û zanistî, bi kurmancî hûnane. Belegewrî *Dîwanek* bi kurdîya kurmancî nivîsîye, bi men-

zûmeyên edebî hûnaye û daye çapkirin. Ji bilî Dîwanê, bi taybetî mesnewîya wî ya bi navê *Mewlida Pêxember* di biwarê literatura nivîsîna mewlûdan de, bi cîyawazîya xwe ya ji mewlidên din ên kurmançî balê dikişîne. Wî ji bo cê mesnewîyê pêşgotineke bi terzê meqaleyê nivîsîye û tê de çawa ku rexne li metnên mewlûdên berî xwe girtiye, alîyên rast û sehîh ên têkildarî mijarê jî ragihandîye. Nivîskarî, diayayeke bi kurmançî jî di dawîya metnê Mewlûdê de bi cih kirîye.


Cihê baldarîyê ye ku wî di *Dîwana* xwe ya bi navê *Rêbazê* de cih daye çend mesnewîyên serbixwe ku alîyên wan ên lîrîk, epîk û satîrîk hene. Çinku wî di van menzûmeyan de hem dildarîya xwe ya bi pêşeng û pêşawayên doza hizra azad a Îslamî-kurdî re dîyar kirîye û pesnê wan daye hem jî car hatîye ku wî kirin û kiryarên hin kes û derdorên ku li dijberî vê bîr û bawerîyê rabûne û li pêşberî wê bûne bend û kelem, bi zimanekî herikbar, zelal û hunerî û bi dilekî wêrek rexne kirine. Digel van alîyên xwe yê asoazad û rexnegir, wî di seranserî jîyana xwe ya ilmî-hizrî de cih di nav helqeyên tesewwufê de girtiye û hîn jî ew wekî ferdekî nerîta tesewwufê ked û xebatên xwe berdewam dike.

Belegewrî çawa ku ji zimanê erebî hin berhemên dînî wergerandine zimanê kurdî/kurmançî û zimanê tirkî, wî ji zimanê tirkîya osmanî jî hin berhemên ilmî û dînî wergerandine kurmançî. Bi taybetî telîfa wî ya bi navê *tercume-meala Qur'anê* balê dikişîne. Selmanê Belegewrî, digel kar û barên edebî û zanistî, bi xizmetên tesewwufî û karê perwerdeya medreseyên klasîk ên herêmî re jî eleqedar bûye û ev serê nîvsedsalekê ye ku bi awayekî bînavber vê xebatê berdewam dike. Ji ber van hokaran heq e ku wekî edîb, alim û mutesewwufekî helwestazad cihê xwe yê xweser di dîroka edebîyata kurmançî de bigire.

Çavkanî

- Adak, A. (2019). *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de*. İstanbul: Nûbihar.
- Ertekin, M. Zahir & Ertekin Nurettin, "Kurtedîroka Mewlûdnameyên Kurdî", *Uluslararası Sosyal Bilimler Kongresi*, (Edt. Mehmet Bilen & Veysel Gürhan, Fuat İstemi ve Bayram Kanarya), Diyarbakır, 2017, r. 149.
- Kurşun, M. S. (2002). *Rêbaz (Dîwana Yekem)*. İstanbul: Mizgin Yayıncılık.
- Kurşun, M. S. (2010). *Mewlida Pêxember*. İstanbul: Pak Ajans Yayıncılık.
- Karaca H. û Aykut N., (2015). "Mele Hüseyinê Bateyi"nin Mewlid-i Nebî Adlı Eseri ile Mele Süleyman Kurşun'un Mewlida Pêxember Adlı Eserinin Karşılaştırılması", *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, sal/yıl: 1, cilt/cıld: 1, sayı/hejmar: 2, Kasım/Ocuber/Mijdar.
- Rêzehevîtin digel Mela Silêman Kurşun, di meha Nisan, Gulan û Hezîran 2023an de li Dîyarbekirê, di medreseya wî de.

Pêvek



Vermezse Mabûd Neylesin Mahmud

Heke Nedît Hakimê Hey, Xwelî li serê Hatimê Tey

Ortak Atasözlerin Hikâyeleri: Fârsî-Kurmancî-Zazakî 12

Hasan ÇİFTÇİ

Özet

Bu makale karşılaştırmalı halk edebiyatıyla ilgilidir. Ortadoğu halklarının dillerinden Farsça, Kurmancî ve Zazakî'de ortak atasözleri ve onlardan bazısının halk arasında söylenen hikâyelerini ve kaynaklarını konu edinmektedir. Gerekli görüldüğü zaman bu atasözleriyle ortak olan Arapça ve Türkçe atasözlerine ve hikâyelerine de yer verilecektir. Bu yazıda özellikle, *Vermezse Mabûd neylesin Mahmud/ Heke nedît Hakimê Hey, xwelî li serê Hatimê Tey* şeklindeki atasözü ve hikâyesi üzerinde durulacaktır. Atasözleri halkların tarihi süreçte şekillenen yaşam biçimini, adet ve geleneklerini ifade eden yasalar hükmündedir. Atasözleri yüzyılların geçmesiyle şekillenir ve toplumun ahlâkî, dinî ve dünyevî değerlerini ifade ederler. Toplumun tarihsel kültürünü kuşaktan kuşağa aktarırlar. Bu onikinci makale de aynı alanla ilgili seri halde yayımlanacak diğer makaleler gibi adı geçen Müslüman halkların düşünsel, dilsel ve kültürel ortak değerlerine ışık tutacaktır.

Anahtar kelimeler: Atasözlerinin hikâyeleri, rızık, Farsça, Kurmancî, Zazakî.

Stories of Common Proverbs: Persian-Kurmanji-Zazakî 12

Abstract

This article is about comparative folk literature. It deals with the story of the common resources of the languages of the ancient peoples of the Middle East such as Persian, Kurmanji and Zazakî. It will partly touch on the common Arabic and Turkish proverbs with their stories.

In this article, we will focus on th proverb and its stories, *What should Mahmûd do if Ma'bûd does not give it to him?* [*Vermezse Mabûd neylesin Mahmud/ Heke nedît Hakimê Hey, xwelî li serê Hatimê Tey.*] Proverbs are the rules that express lifestyles, customs and traditions of the peoples which are formed along the centuries. Proverbs are shaped by the passing of centuries and they express moral, religious and worldly values of the society. They transfer the historical culture of the society from generation to generation. This twelfth article and other articles which are going to be published on the same subject in series will enlighten intellectual, linguistic and cultural common values of the Muslim peoples.

Keywords: the story of proverbs, sustenance, Persian, Kurmanji, Zazakî, Turkish



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ

Yıl/Year: 2023 • Cilt/Volume: 9 • Sayı/Issue:18

Hasan ÇİFTÇİ

Prof. Dr.
Bingöl Üniversitesi
Fen Edebiyat Fakültesi
hciftci@bingol.edu.tr
Orcid: 0000-0002-2503-4966

Makale Türü / Article Type:

Araştırma Makalesi / Research Article

Makale Geliş Tarihi / Received: 25.08.2023

Makale Kabul Tarihi / Accepted: 27.11.2023

Makale Yayın Tarihi / Published: 25.12.2023

DOI: 10.56491/buydd.1349986

Atıf / Citation:

Çiftçi, H. (2023). Ortak Atasözlerin Hikâyeleri: Fârsî-Kurmancî-Zazakî 12, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 9(18), 17-35

Giriş

Tirk, di edebiyata klasîk de wek mezmûnekî, neteweyekî leşker û şerker in. “Peyva “Tirk”ê bi mezmûnên weke xwîn, talan, yexma”yê ve tete bikaranîn.”⁵ Tirk, wek îstîfereyî mehbûba xwînrêj e û ew bi xemzeyekê xwe, zûhdê salane yê ‘aşîqê ser û bin dike. Di behskirina şerê Tirk, Moxul û Hindiyan (zulf, xal, kezî) de, ew bi goreyî xusûsiyetên xwe, bi îstîfereyî, hatine bikaranîn. Tirk, çavên yarê yên tîravêj û talanker in. Tirk zulfa yarê ne, dema bi kevanên xwe yên bêtêl, bi dêmê re têne ceng û herbê, tîran di dêmê de wer diken.⁶

*Turkê xwînrêzî xumarê me bi yek xemzeyekê
Zuhdê çil sal e li min zîr û zeber kir ji esas (51/9)*

*Sef bi sef Turk û Moxul doguş e Hindî di kemîn
Ne ‘eceb hatine cengê Hebeş û Rom û Fireng (71/12)*

*Da bêne ceng û herb û şer zulfa ji qewsê bê weter
Têk da xûrrîn Turk û Teter deng tete nêva mestîyan (90/4)*

Tirk, di dîwanê de di wateya mehbûbên dilrevîn de hatiye bikaranîn. Tirk, talan û yexmayê bi xeletî nakin, lewra di xuliqandina wan de xwînrêhtin heye. Ew, dilan jî canan jî dibin û bi dilrevînê ve namdar in. Tirk, wek teşbîhî ji bo çavê yarê hatine bikaranîn. Çavên yarê û mehbûba şox ya Tirk, ji aliyê sêhr, xemze, tîravêtin û bêperwayiyê ve weke hev in. ‘Aşîq, ji ber nêrînen derbên çavên yarê yên mîna mehbûbên şox yên Tirk, çawa goy ji ber lêdana çewgan û kaşoyan direve, wisa direve, lewra çavên wê mehbûbê dilrevîn in.

*Geh dil û geh can diben Turkên te têt
Nagirit yexma û talanê xelet (61/22)*

*Xemze in ya gezme in ya tîri ya sihrê helal
Sahir in ya çêsmê şoxê Turkê bê perwa sti in (83/6)*

*Li ber çewgan û kaşoyan ji derba Turk û Hinduyan
Dibazim her wekî goyan dema ew têne meydanê (111/11)*

*Di behsa nî’metdayînê (çemê Fîrat û Nîlê) û şerwan î û şehsuwariyê de jî Tirk bûne mijar:
Lê meşreb û Turkan Fîrat û Nîl kir
Teşneleb çû terfê ‘ummanê xelet (61/23)*

*Rustem û Cemşîd û Xalid Hemze yan şerê ‘Elî
Aferîn ya şehsuwarê Tirk û rimbazê ‘Ereb (14/5)*

⁵ Ayhan Tek, *Melayê Cizîrî (Jiyan û Tesîra Edebî, Şerha Xezelên Bijartî)*, Nûbihar, İstanbul 2019, r. 68.

⁶ Rıdvan Canım, *Divan Edebiyatının Kaynakları*, Akıl Fikir Yay, İstanbul 2018, r. 65.

1.1.5. Mecer

Mecer, bi şahê xwe ve, bi fetihkirinê ve û bi tîr û xedengên xwe ve bi îstîfereyî hatiye bikaranîn. Mehbûb wek şahê Mecere ye, dema sûbê xwûya dike û weke hûrî û periyane. Tîran davêje dilê ‘aşîqî û bênsaf e. Hubba mehbûbê, her roj ‘aşîqî dikûje; ew ji ber tîr û xedengan, weke miriyekî di nav xwîne de maye.

*Xeflet bi sir da min nezer mîran bi qetlê kir xeder
Tîr dane dil şahê Mecer bê mirwet amanc kir ceger (125/1)*

*Min dî seher şahê Mecer libsê di ber mexmûri bû
Ew hem durrî surmuşterî ya Reb perî ya hûri bû (107/1)*

*Hubba te ma xweş hiştîme her roj ji nû ez kuştîme
Yekser ji xûnê riştîme tîr û xedengên Mecere (113/16)*

1.1.6. Rûm

Rûm, ji ber şer û fetihkirinê wek îstîfereyî hatiye bikaranîn. Di dîrokê de şerê Rûm, Fireng û Eceman gelekî çêbûye. Şerkirina wan wek îstîfereyî bi sembola zulf, dêm, birh û kagûlên yarê hatine îfade kirin. Rûyê yarê spî ye û bi îstîfereyî padîşahê Rûmê ye û zulf, xett û xalên reş ‘Ereb û Hindî ne, dixwazin wê derê bixin bin hakimiyeta xwe. Rûm û Fireng, zulm û kufrê temsîl dikin. Pora yarê, rûyê wê dinixumîne û reş e; ji ber vê yekê wek kufrê hatiye dîtin. Ew bênsafiyê ve jî weke kafirên Rûmê ye.

*Tu binê Rûm û ‘Ecem kuştîme Zengî di kemîn
Hane her têt peyapey ji teref ru zu û xweş (54/6)*

*Sef bi sef Turk û Moxul duguş e Hindî di kemîn
Ne ‘eceb hatine cengê Hebeş û Rom û Fireng (71/12)*

*Rom û ‘Ecemê girtiye oxilme bi sef sef
Cohtê Moxulan hatine cengê Hebeşî (129/3)*

*Rûm û ‘Ecem ji her teref ceng û sewaş e wan bi xef
Hindî û Zengî sef bi sef hatine ber liwayê zulf (63/7)*

*Ew şepala şeng û şox e kafîra Rom û Fireng e
Dame ber cotek xedeng e zalimê kuştîm bi dox (36/4)*

1.1.7. Nûbî û Zengî

Nûbî û Zengî, ew milletên ku ji rengên xwe ve reş in. Nûbî û Zengî, bi munasebeta şer û tewafa Beytê wek îstîfereyî hatine bikaranîn. Zengî, kagul û xalên yarê yên reş, Nûbî, biska reş ya ser eniyê temsîl dike. Xal di rûyan de hindik in. Ev rewş, bi husnê te’lîlî, bi kuştin û kêmasiya wan ve hatiye girêdan. Rûm û Ecem (enî, dêm, rû) di sefekê de; Hindî, Zengî û Hebeş (zulf, xal, birh) jî di sefekê de li hemberê hev şer dikin.

*Bên sewaşê Hebeş û Nûbî û Zeng
Tu dizanî çî neheng in çî neheng (123/5)*

*Her li dora Hecer eswed Hebeşan çerx e tewaf
Rast û çep tîn ‘Erefatê bi sema Nûbî û Zeng (71/11)*

*Rûm û ‘Ecem ji her teref ceng û sewaş e wan bi xef
Hindî û Zengî sef bi sef hatine ber liwayê zulf (63/7)*

1.1.8. Teter

Teter, bi təkiliya şer û talanê bi îstîfereyî hatiye bikaranîn. Bi rêya mecazê di maneya zalim, xeddar û bêrehm de ye. Hejandina zulfê li ber bayê û qewsên yarê yên tîravêj û talanker weke Turk û Teteran hatiye dîtin. Lewma jî gelek caran peyva Teter bi zulf û çav/xemzeyan hatiye gotin.⁷

*Da bêne ceng û herb û şer zulfa ji qewsê bê weter
Têk da xûrrîn Turk û Teter deng tete nêva mestîyan (90/4)*

1.1.9. Hindî

Hindî, ji bo rengên xwe bi teşbîhî (muşebbehûnbîh) hatine bikaranîn. Bi beyankirina şerê gelan de Hindî, bi îstîfereyî ji ber rengê xwe, temsîliyeta por û xalên yarê dike.⁸

*Ber vi şerqê û seher westayîn
Hîndûyên rojperest in çep û rast (18/4)*

*Li ber çewgan û kaşoyan ji derba Turk û Hindûyan
Dibazarim wekî goyan dema ew tene meydanê (111/11)
Sef sef me dîn Hindî û Hebeş Cengîz hat Teymûrê Leng
Xef wan reşandin dil xedeng teşbîhê tîrên Xan Şeref (64/8)*

Hindî bi zikirkirina teyrê tawusê, bûne mijar. Ji ber ku Hindistan cihê tawusan e, ew kesê bixwaze spehîtiya wê bibîne an jî dest bixe, pêwîst e zilm û zordariya Hindîyan jî dete ber çavên xwe.

*Cewrê Hindî bikêşînit her kesê tawus bivêt
Gewher û durra yetîm bêterkê ser nabin teleb (15/12)*

1.1.10. Hebeş

Hebeş, ji bo rengên xwe bi teşbîhî (muşebbehûnbîh) hatine bikaranîn. Hebeş, di meydana şer de, bi îstîfereyî, temsîliyeta por, çav û birhên yarê dikin. Hebeş, kemandar (çav) in. Sef bi sef sekinîne di destê wan de tîr û kevan hene (birh û mijang) û berdidin dilê dijminan (dilê ‘aşîqan). Xalê yarê, wek îstîfereyî, Heceru’l-Eswed e, zulf (haciyên Hebeş) li derdora wê diçin û tîr, wê tewaf dikin.

*Zengiyan quşen vebestin pêşiberê coqa Hebeş
Daberistin yek bi yek çûn ber liwayê rast û çep (17/10)*

*Cohîte Hebeşan bi terfetil’eyn
Anî qederek ji Espehan bac (29/7)*

*Ceng hindî dikirin fêris û rimbazê ‘Ereb
Tox û ‘ala di Ferengî ne kemandarê Hebeş (54/5)*

*Her li dora Hecer Eswed Hebeşan çerx e tewaf
Rast û çep tîr ‘Erefatê bi sema Nûbî û Zeng (71/11)*

*Îhram me best eswed bû qest yar hate mest ez çûme dest
Cohîte Hebeş tîr dan bi weş hecca me xweş mebrûri bû (107/17)*

*Rom û ‘Ecemê girtiye oxilme bi sef sef
Cohîte Moxulan hatine cengê Hebeşî (129/3)*

⁷ İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı, İstanbul 2012, r. 442.

⁸ Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 209.

1.1.11. Fireng

Fireng, di wateya gelên Ewropî de hatiye bikaranîn û ji bo şer û temsiliyeta kufrê bûye mijar. Di şerkirina gelan de wek îstîareyî bi sembola zulf, dêm, birh û kagûlên yarê hatiye bikaranîn. Herwiha bi rêya mecazê di wateya pût û bedewan de ye.⁹ Fireng di dîwanê de, kafir e, temsiliyeta zulfa yarê ya reş dîke û rûyê yarê yê spî dinixumîne. Fireng zalim in û qesta canê ‘aşiqan dîkin.

*Ceng hindî dikirin fêris û rimbazê ‘Ereb
Tox û ‘ala di Firengî ne kemandarê Hebeş (54/5)*

*Sef bi sef Turk û Moxul duguş e Hindî di kemîn
Ne ‘eceb hatine cengê Hebeş û Rom û Fireng (71/12)*

*Ew şepala şeng û şox e kafîra Rom û Fireng e
Dame ber cotek xedeng e zalimê kuştîm bi dox (36/4)
Cegerê kun dîkin û tê dibeyîn mislê tifeng
Mislê wê kafîr û zalim qe dibin kes di Fireng (121/4)*

1.1.12. Moxul

Moxul, di edebiyata klasîk de bi şer û talanê têne naskirin. Ew ji ber şer û tîr avêtinê ve bûne mijar. Peyva Moxilê bi îstîareyî bi sembola por û çavê dilberê hatiye bikaranîn. Ravekên weke tîrik Moxil û cohtë Moxilan îşaretê çav, birh û mijangên yarê dîkin.

*Sef bi sef Turk û Moxul duguş e Hindî di kemîn
Ne ‘eceb hatine cengê Hebeş û Rom û Fireng (71/12)*

*Min li dil tîrik Moxil dî tîk ji ber xûnê qizil dî
Lê dibêm derba ku dil dî hêj ji çehvên şehle ye (97/50)*

*Rom û ‘Ecemê girtiye oxilme bi sef sef
Cohtë Moxulan hatine cengê Hebeşî (129/3)*

1.1.13. Qereş (Qureyş)

Qureyş, qebîleya Hz. Muhemmed (sxl.) pêxember e. Di dîwanê de ji bo medh û mezinahiya memdûhê hatiye bikaranîn. Dilber, li ber pêyên memdûhê hatine şabaşkirin, lewra ew ji qebîleya Qureyşan e û ji mezinahiya wê re ewqas şabaş hêj hindik in.

*Çendan te but û latê nisarê qedemî ne
Îcazê me ke vê ku tu ji neslê Qereş î (129/6)*

0.0.14. Qecer

Qecer, xanedanekî Tirkmenan e û li Îranê hukum kirine. 1796an de, Axa Muhammed Xan ev dewlet ava kiriye.¹⁰ Ev ‘eşîrekî Moxolî ye û Teymûrê Leng ew anîne Îranê û bûne şervanên Sefewiyan.¹¹

Qecer, bi şer û tîrên xwe ve namdar bûne. Tîrên Qecerê wek îstîareyî temsiliyeta çav û awirên yarê dîkin. Êş û elemên ‘aşîqî yên mezin ji derba wan tîrên Qecerî ne û dilê wî de tejjê xedengên (sertîr) Qecerî ne.

*Li me êş û eleman zêde ji tîra Qecerê bû
Dil ji me bûye pelek can û cesed tîk seqerê bû (122/1)*

⁹ Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 158.

¹⁰ Faruk Sümer, “Kaçarlar”, *DİA*, c. 24, İstanbul 2001, r. 51-53.

¹¹ Şerefkendî (Hejar), b.n.b., r. 627.

*Ku di zindan û hebixaneyê wê bend û esîr im
Ji xedengên Qecerî sîne teji gezme û tîr im (122/4)*

2. Welat û Bajar

2.1. Fireng (Firengistan)

Welatê Firengan, ji ber şer, êriş û medhê memdûhê bûye mijar. Memdûhê gelek cih fetih kirine û welatê Firengan jî di nav de ye. Fireng, di wateya Ewropayê de wek diyarê kufrê, bi peyv û ravekên weke Fireng û heddê Firengê, bi îstîareyî hatiye bikaranîn. Mehbûb, şervanî û tîravêtina xwe ve qeyserê Romê ye. Çavên yarê bi xemze û awirên xwe ve li ser xeta Firengê (li ser xaza por û eniyê de) sekinîne êrişê ‘aşîqî dikin.

*Te Fireng û ‘Erebistan û Mecer têk standin
Celewê xweş vegeerîn hatiye newba ‘Ecemê (109/15)*

*Qeyserê Romê li ser heddê Fireng
Top û zincîr vebestî çep û rast (18/5)*

2.2. Çîn û Maçîn

Çîn û Maçîn, gelemperî bi tîkiliya zulfa yarê hatine bikaranîn. Çîn, xelek û porxelekîya zulfa yarê îfade dike. Çînên (zencîr û xelek) zulfa yarê, sed welatên weke Çîn û Maçînê di nav xwe de girtine. Bêhna mîsk û ‘enberê, ji Çînê tê û li wê derê di zêkê xezalekî de tê peyda kirin. Yar ji bo pora xwe ya ‘enberîn, wek xerac ji Çîniyan mîsk û ‘enberê distîne. Ji ber wê ye pora wê her daîm bêhnxeş û ‘enberîn e.

*Sed Çîn di xwe da girtine zulfa te bi çîn
Şîra ye me dil û heq çûye heta Maçînê (119/12)*

*Mihra te pur ebter kirîn xalan ji bin biskan derîn
Zulfa muselsel ‘enberîn çîn çîn ji Çînê tete bac (31/8)*

Çîn, bi tîkiliya sûretê Çînê (resm û nexşên Manî), di dîwanê de cih girtiye. Manî nexş û sûretên xwe di kitêba xwe Erjeng de berhev kirine ku ew kitêba wî ya herî navdar e. Herweha ji ber bandora Manî, li welatê Çînê nexş û nîgar û peykarsazî gelek pêş ve çûye, di warê mînyatur û sen‘eta çînî de tiştên bedew der hatine. Ji ber vê yekê di edebiyata klasîk de navê Manî, bi Erjeng û Çînê re gelek caran derbas dibe. Ji bilî van, Erjeng bi wateyên mal û resimxaneyê Manî, xaniyê pûtan û pûtxaneyek li welatê Çînê jî hatiye gotin. Di edebiyata klasîk de wek qelesa Manî, resmê Manî, nîgarê Manî, neqşê Manî, nameyê Erjeng, neqşê Erjeng em rastî navê Manî û berhema wî tî. Di edebiyata klasîk de miraz ji wan navaan bedewî û rindahiya maşûq e ku şairan wek metafor ew bi kar anîne. Di Dîwana Mela de heman teswîr li ber çavan dikevin.

*Hûr û ferîşte kê we dîn nazîk û xûb û surşîrîn
Dême numûne bir biçîn sûretê Çîn numa xelet (60/4)*

*Mîsala sûretê Çînê xelet Manî xeta kêşa
Ku min dibû di ayînê ji ber zulfa duta kêşa
Me dibû şeklê Şîrînê tu ustadan we nakêşa (131/8)*

2.3. Bexdad

Bexda, bi kesayetiyên dînî ve şehrekî pîroz e, bi tîkiliya welî û murşîdan bûye mijar. Herwiha ji ber ku paytexta Ebbasiya bû, ji ber êve cihê qesr û qonaxan, av û çem û kaniyan, bax û bostanên wek buhiştê bû. Lewma gelek caran ji vî bajarî miraz cihê xweşîkî û rindahiyên e.¹³ Herçend li Bexdayê de kesayetên mezin hebin û

¹² M. C. Yaheqqî, *Ferhengê Esatîr ve Dastanwareha der Edebîyatê Farsî*. Ferhengê Moesir Tehran 1386, r. 742.

¹³ Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 54.

ew der cihekî pîroz jî be, kesê ketibe rêya sulûkê û dest bi îrşadê kiribe, êdî ne mumkin e ku ew li Bexdayê de bimîne.

*Te xered vêkêtinê yek weliyek murşîdi bit
Salikê talibê îrşadê bi Bexdadi çi ket (22/9)*

2.4. Xeta (Xeten)

Xeta herêmekî Çînê ye û bi miskê ve namdar e. Por, xal, xet û kagula yarê, bi bêhnê ve bi tîkiliya miska Xetayê hatinê bikaranîn. Bêhna pora yarê jî bêhna miska Xetayê xweştir e. Qiymeta Xetayê li ber yarê de nîne. Bêhna pora yarê jî bêhna miskê Xetayê xweştir û hêjatir e. Ji ber vê yekê, ‘aşîq, mulkê Xeta û textê (padişahê) Xetayê fedayê yek zulfê yarê dike.

*Enwera rengfirişte beşera hûrisirişt
Ya ji miskê Xetenê xal û xet û kagul û qişt (121/1)*

*Sosin û sunbul û gul çerx e li dora semenê
Xemriya helqe û çîn dane ji miskê Xetenê (121/3)*

*Silsila behsê ji xûna dil birin zulfa biçîn
Dê Xeta bit nafe misk er nafeyê Tatarî bit (19/5)*

*Zulfan tu bes çîn çîn bike biskên muqabil dîn bike
Pêşkêşî yek zulfa te bin mulkê Xeten textê Xeta (7/2)*

Bêhna miskê jî zîkê ahûyê derdikeve û ew ahû (xezal) jî li Xetayê dijîn. Yar jî bi hinek xusûsiyetên xwe ve (çav, silikîn, bedewî) wek ahûyê ye. ‘Aşîq, ji bo wuslatê, dav û kemîn li ber ahûsifetê vedaye, dema yar pê dihesa, ji ber ku nekeve kemînê, berê xwe vedigûherîne, li ber Xetayê ve diçe.

*Canên xwe me kir dane û dama ku vedayî
Ahûsifet ew pê hissîya rahê Xeta girt (20/6)*

2.5. Teter(istan)

Misk, nafe û durrên Teterê navdar in. Teter, bi tîkiliya durrên nasufte, bi bêhna misk û nafeyê hatiye bikaranîn. Helbestên Mela weke durran in, ew di iqlîmê Teterê de jî peyda nabin. Xal, turre û zulfa yarê jî miska Teterê bêhn xweştir e û dema bêhna pora wê bê, behsa bêhnên mayî wek xeta tete dîtîn.

*Durrê nasufte dihonî me nedî mislê tu qet
Ne di semtê ‘Ecemê da ne der iqlîmê Teter (44/2)*

*Silsila behsê ji xûna dil birin zulfa biçîn
Dê xeta bit nafe misk er nafeyê Tatarî bit (19/5)*

*Ji neqş û sun’ê Cebbarî muterra turreya tarî
Li nûrê miskê Tatarî li ser wan xemriyan berde (92/14)*

*Hûrîweş e şîrînmeş e kagulreş e xalhebeş e
Xalên di qer miskê Teter nazikbeşer kafûrî bû (107/2)*

2.6. Seba

Seba, bi munasebeta Belqîs, hudhud, Suleyman pêxember û xweşikahiya wî di dîwanê de bi cih girtiye. Dilber Belqîssifet û li welatê Sebayê meskûn e. Seba, weke buhiştê Baxê Îremê hurrem û aram e.

*Dê me hudhud ji Seba bêt û nizanîn çî ye hal
Ku li halê me xerîban ne sual û ne cewab (13/11)*

*Min dilberek wek durr heye mehbûb û şîrînsur heye
Husn û cemalek pur heye Belqîssîfet mesken Seba (11/4)*

*Çendekê çemen hurrem bû lê medam wek subhedem bû
Min bihişt Baxê Îrem bû lê seba go min Seba ye (96/12)*

2.7. Bedexşan

Bedexşan, deverek e li Efxanistanê, bi ser Feyzabadê ve ye. Ew bi yaqutên gelek hêja û kevirên le'1 ve meşhûr e.¹⁴ Bedexşan, di dîwanê de, ji bo rengê kevirên le'1 û yaqutan bûye mijar.

*Her sîneyê tabî tamam napuxte xam bê mihr û cam
Xerqîn di xûna dil medam le'la Bedexşan î Mela (12/12)*

*Durexşan hat û rexşan hat sena berqa tecellayê
Bi cama reng bi lexşan hat bi firûzê cêla dayê
Li min le'la Bedexşan hat ji destê mahsîmayê (131/4)*

2.8. Heleb

Heleb, ji ber murşîdê (pîrê muxan) bûye mijar. Ew kesê meqseda wî mey be û bixwaze meyê di şîşe û qedeha zucac de vexwe, pêwîst e biçîte Helebê, ji pîrê muxanê re xizmetê bike, lewra Heleb, bi şêx û murşîdan ve cihêkî navdar e.

*Xidmeta pîrê muxan dê kit kesê meqsûd mey
Şîşe û cama zucacê ê divêt dê ret Heleb (15/11)*

2.9. Espehan (Esfehan)

Espehan, bajêrekî Îranê ye, îro jê re “Esfehan” tê gotin.¹⁵ Ev bajar, bi bac û xerac dayînê ve bûye mijar. Bac û xerac, wek îstîfereyî, bi tîkiliya yarê hatiye bikaranîn. Esfehan, di serdema Cizîrî de paytextê Sefewiyan bûye. çavên yarê (cohtê Hebeşan) li ser ‘aşîqî ew qas tesîrdar e, ji cihê herî zor jî bacê distîne, yanî kesên payebilind û dijwar jî têxe bin hîmayeta xwe.

*Cohîte Hebeşan bi terfetil'eyn
Anî qederek ji Espehan bac (29/7)*

*Tenha ne Kurdistan didin Şîraz û Yeng û Wan didin
Her yek li ser çehvan didin ji Espehan têtin xerac (31/9)*

2.10. Kurdistan

Kurdistan, ji wê cîyê re tê gotin ku Kurd tê de jiyane û dijîn. Ewliya Çelebî, di sedsala 17em de li seranserê welatê Kurdistanê geriyaye û sînorên wê weha tesbît kiriye: “Sînorê wê yê bakur diyarê Erzîrûmê ye û ji wir bi ser Wanê, Hekariyê, Cizîrê, Îmadiyyeyê, Mûsilê, Şarezorê, Erdelanê, Dereneyê û Deretengê re heta Besrayê diçe.”¹⁶ Kurdistan îro, ji qismek navend û başûrê Zagrosan, ji sê beşan du beşê rojhilatê Toros û Pontusê, ji nivê başûrê çiyayên Amanosê pêk tê.¹⁷ Kurdistan, wek sembolekî, ji bo medhê memdûhê ku dixwaze cihên herî xweş û cazîbedar bikevin bin hîmayeta wî, bi îstîfereyî bi tîkiliya yarê de ku yar şêhê Kurdistanê ye û ji ‘aşîqên xwe jî bacê distîne û di beytên fexriyeyê de ji bo kesayetî û mezinahiya hunera şa'îrî hatiye bikaranîn.

¹⁴ Melayê Cizîrî, Dîwan, (ferheng), r.320.

¹⁵ Melayê Cizîrî, h.b., (ferheng), r.319.

¹⁶ Mihemed Emin Zekî Beg, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, (Wer. Ziya Avcı), Weşanên Avestayê, Îstanbul 2012, r. 27.

¹⁷ Mehrdad R. Izady, *Kürtler*, Doz Yayınları, İstanbul 2004, r. 43.

*Ney tinê Tebrîz û Kurdistan li ber hukmê te bin
Sed wekî şahê Xurasanê di ferwarê te bî (116/9)*

*Tenha ne Kurdistan didin Şîraz û Yeng û Wan didin
Her yek li ser çehvan didin ji Espehan têtin xerac (31/9)*

*Bi tebilxaneyê şahî were text
Ku tu îro şehê Kurdistan î (114/4)*

*Gulê baxê Îremê Bohtan im
Şebçiraxê şebê Kurdistan im (123/2)*

2.11. Şîraz

Şîraz, ew bajarê dîrokî ye ku li başûrê Îranê, li ser rêya dîrokî ya bazirganiyê de cih girtiye.¹⁸ Bajarê Şîrazê, bi îstîfeyî bi tîkiliya dilberê; bi kevanên namdar ve ku birh û çavên yarê ne; bi tîkiliya hunermendê namdar Hafîzê Şîrazî ku şair di zeviya şî'rê de wî ji xwe re reqîb dibîne û bi tîkiliya navdariya bajarê bi xwe ku tê de hunermend û mutesewwifên mezin derketine, bûye mijar.

*Mislê wî qewsê hilalî ku du nûn in reyhan
Kî nişan dane di Şîraz kî anîne ji Yeng (71/10)*

*Dema ew tîn bi bazî tîn digel qewsên şîrazî tîn
Çi mûkar in û tazî tîn bi de'wa dêne lêkdanê (111/12)*

*Ger lu'lu'ê mensûrî ji nezmê tu dixwazî
Wer şî'rê Melê bîn te bi Şîrazî çî hacet (21/12)*

*Tulu'a ma ji bo gîtî şefeq da
Ji Şîrazê şu'a'ê daye Tebrîz (46/6)*

2.12. Yeng (Yang)

Bi navê Yang-Cou û Yang-Çuanê li Çînê du bajarên mezin hene. Di başûrê rojhilata Asyayê de bi navê “yang”ê darek heye, bi rengê beqema sor an jî bi rengê esmendorê ye û zêde saxlem e. Ev dar, di avakirina xaniyan de tête emilandin.¹⁹ Dibe ku ew tîrên yengî ku Melayê Cizîrî behsê dike ji wê darê hatibine çêkirin. Yeng²⁰ bi tîran ve weke bajarê Şîrazê namdar bûye. Yengî (tîrên Yengê), bi îstîfeyî, bi tîkiliya yarê ve û bi çêkirina tîr û kevanan ve ku tîr; awir, mijang û çavên yarê ne û kevan jî birh û çavên yarê ne, di dîwanê de bûye mijar.

*Mi j'bihriyan pur naliyan şevtariyan ceng bû miyan
Wer kuştîyan ji yengîyan b'wan tillîyan xweş ke giyan*

*Kir şefqe mîr anîme bîr pur dan me tîr ku mîr esîr
Negha feqîr zulfa herîr avêhte şîr da pê bi heq (67/3)*

*'Alim e b'daxê firadan gezmeyên wan nûn û sadan
Çûne dil hetta bi radan yengiyê reşgoşe ye (97/2)*

¹⁸ Osman Gazi Özgüdenli, *DÎA*, “Şîraz”, c. 39, İstanbul 2010, r. 182-184.

¹⁹ Meydan Larousse, “Yang”, c. 20, Sabah Gazetesi Yayınları (dîroka weşanê tune)

²⁰ Hejar dibêje, peyva “Yeng”ê tu qamusekî de rastê me nehat û dibe ev peyv “Yezd” jî be û ev bajarekî mezin e û li rojhilatê Esfehane ye. (Şerefkendî (Hejar), b.n.b., r. 211.)

*Di dest da yengiyek nûbarî min dî ew kemandebrû
Li bala cedwelek Cebbarî têda hemqeran ebrû (108/1)*

*Têne qetla me û tîn me du hezar tîr û xedeng
Direşînin me di destan du siyeh qewsê ji Yeng (121/4)*

*Yengî te di şengî bi derengî we kişandin
Sed tîr û xedengî bi çî rengî te reşandin*

*Serpence bi îşkence te wek xunçe livandin
Hestî we bi mestî li me vê ra herişandin (130/7)*

2.13. Wan

Wan, li başûrê Kurdistanê, bajarekî kevnare ye, ji aliyê qralîçeya Asûrî Şah Meryemê ve (Semîramîs) hatiye avakirin. Di dewra Keyaniyan de, desthilatdarekî bi navê “Wan”, bajar fireh kiriye û ji nû ve avakiriye û piştî wî Wan ketiye destê Îskenderê Mezin.²¹ Di dewra Îslamê de gelek sehabî ji bo bidestxistina Wanê hatine û li vir jiyana xwe ji dest dane. Ji ber coğrafyayekî stratejîk, Wan gelek giring bûye û di dîrok û edebiyatê de jî behsa wê hatiye kirin. Wan, di dîwanê de bi îstîfereyî, bi tîkiliya dilberê bûye mijar. Wan, di dewra Osmaniyan de, wek senceçekî girêdayiyê Osmaniyan bûye û bac daye paytextê. Ev xusûsiyet (bac dayîn), wek îstîfereyî bi dildayîn û fedakirina ‘aşîqî ve hatiye beyan kirin.

*Tenha ne Kurdistan didin Şîraz û Yeng û Wan didin
Her yek li ser çehvan didin ji Espehan têtin xerac (31/9)*

2.14. Finik (Findik)

Finik, nahiyeya qezaya Dihê ya wilayeta Sêrtê ye.²² Di dewra Melayê Cizîrî de wek gundekî bûye. Finik, di dîwanê de ji bo şairê diz bûye mijar. Kesekî şî'rên Mela, wek şî'rên xwe nîşan dida û Melayê Cizîrî jî li ser wê kesê hicwiyeyek nivîsiye. Finik mekanê xezelan e, şairên ku xezel dinivîsandin dizanin ku ew mutesa'îr ne musennifê wan şî'ran e.

*Tu d'zani di Finik da ku mekanê xezelan e
Çi buha têne meta 'ê te eya bê ser û ber (44/5)*

2.15. Tebrîz û Xurasan

Tebrîz, bajarek e li Îranê û navenda wilayeta Azerbeycana Rojhilatê ye. Di sala 1502yan de Şah Îsmâil Tebrîz kiriye paytextê Sefewiyan.²³ Xurasan jî, eyaletek e li bakurê rojhilatê Îranê ye. Di ‘ilm, edebiyat û tesewwifê ve derketiye pêş û kesayetên namdar jê derketine.²⁴ Tebrîz û Xorasan, di wateya welat û şehran de, ji bo medhê memdûhê ku şair dixwaze ev şehren giring jî bikevin bin hîmayeta wî, hatine bikaranîn.

*Ney tinê Tebrîz û Kurdistan li ber hukmê te bin
Sed wekî şahê Xorasanê di ferwarê te bî (116/9)*

Tebrîz, ji ber kesayetên mutesewwif (Şemsê Tebrîzî) û ji bo fexriyeyê ku ronahiya helatina şairî, heta Tebrîzê çûye, bûye mijar.

*Teb û tabê hezar îşkence da dil
Ji Şîrazê negahî mestê Tebrîz (46/7)*

*Tulu 'a ma ji bo gitî şefeq da
Ji Şîrazê şu 'a 'ê daye Tebrîz (46/6)*

²¹ Mehmet Emin Bozarslan, *Tarihteki İlk Türkçe Ansiklopedide Kürdistan ve Kürdler*, Deng Yayınları, İstanbul 2001, r. 229.

²² Seyid Eliyê Findikî, *Dîwan, Weşanê Nûbiharê*, İstanbul 1999, r. 5.

²³ Ali Sinan Bilgili, “Tebrîz”, *DİA*, c. 40, İstanbul 2011, r. 219-222.

²⁴ Osman Çetin, “Horasan”, *DİA*, c. 18, İstanbul 1998, r. 234-241.

2.16. Hebeşistan

Hebeş (îstan), welatek e ku li rojhilata Afrîkayê de cih digire. Ew yek ji niştecihên dunyayê yê herî kevn e.²⁵ Hebeş, di dîwanê de, bi îstîareyî hatiye bikaranîn. Xala yarê “Hecerê Eswed/Kevirê Reş” û “Beytu’l-Qudus” e, zulf bi rengê xwe ve Hebeş in û ji Hebeşistanê têne ziyaretiya wê.

*Ew e hem şafiyê derdan te çi hacet bi nivîştê
Dibitin Beytêqudus ehlê ziyaret ji Hebeş tê (122/2)*

2.17. Misir

Misira kevin de zanist gelek pêş ve çûbû. Di serdema hakimiyeta Firavunan, Pers, Yewnan û Romayê de gelek alim û seyyahên bêyanî li Misrê cih dibin û ji medeniyeta wê îstîfade dikin. Misir, di dîroka de, bi têkoşîna Musa pêxember bi firavun re û bi qisseyaya Yûsûf pêxember ve derketiyê pêş.²⁶

Misir, bi şurên xwe yê elmasî ve ku bi îstîareyî temsiliyeta awirên çavên yarê dikin; ji bo medhê memdûhê û bi telmîhî di behsa Yûsûf pêxember de bûye mijar.

*Xencer û tîr û teber barîn şibê berq û burûsk
Misriyan lami ‘ ji elmasan didayê rast û çep (17/5)*

*Ji lebê le ‘lê şekerbar te nekir pursî Melê
Misriyan gezme reşandin ku kişandin elmas (51/10)*

*Şukur bînahiya min hat û Ye ‘qûb dîde rewşen bûn
Bi boya Yûsufê Misrê li Ken ‘anê beser peyda (5/23)*

*Bi xewwasî bi sehharî te dur anîn ji behreynê
Ji şî ‘ra te şekerbarî ji Misrê ta bi Qezneynê
Bi diqqet bîn sed eş ‘arî dibêjî terfetil ‘eynê (131/37)*

2.18. Qezneyn (Xeznîn)

Qezneyn, bajarekî dîrokî yê Efxanistanê ye. Di çavkaniyên Îslamî de wek “Xezne, Xeznîn” hatiye qeyd kirin. Di berhema Hudûdu’l-‘alemê de wek “Xeznîn” derbas dibe. Di dewra Sultan Mehmûdê Xeznewî de, ji aliyê kulturî û şaristaniyê ve pêş ketiye û wek navendekî bazirganiyê namdar bûye.²⁷ Qezneyn, ji bo medhê memdûhê ku şî ‘ra wî di gelek navendên giring da belav bûye, hatiye bikaranîn.

*Bi xewwasî bi sehharî te dur anîn ji behreynê
Ji şî ‘ra te şekerbarî ji Misrê ta bi Qezneynê
Bi diqqet bîn sed eş ‘arî dibêjî terfetil ‘eynê (131/37)*

2.19. Laleş

Laleş, mekanê Êzdiyan yê pîroz e û li Başûrê Kurdistanê de cih digire. Laleş, wek wadiyekî di bakurê rojavayê Musilê de ye. Meqbera Şêx Adî, li vê derê ye û ev der cihê haciyên Êzdiyan e.²⁸ Laleş, di dîwanê de bi têkiliya mehbûbê wek îstîareyî hatiye bikaranîn. Hemû cihê ku perestî lê têtê kirin mihrab in û mihraba ‘aşiqî jî bi wî re ye. Laleş jî yek ji wan mihraban e.

*Dil geşt e min ji dêrê naçim kenîştayê qet
Mihrab wê bi min ra wer da biçîne Laleş (53/3)*

²⁵ Davut Dursun, “Etiyopya”, *DÎA*, c. 11, İstanbul 1995, r. 488-491.

²⁶ Hilal Görgün, “Mısır”, *DÎA*, c. 29, Ankara 2004, r. 555-557.

²⁷ Enver Konukçu, “Gazne”, *DÎA*, c. 13, İstanbul 1996, r. 479-480.

²⁸ İbrahim S. Işık, *Kürtler*, Nûbihar, İstanbul 2013, r. 304.

2.20. Ermenistan

Ermenistan, wek welatekî, di edebiyata klasîk de di derbarê lehengên destan û hîkayeyan bûye mijar. Şêxê Sen'an di xewna xwe de qîza padîşahê Ermeniyan dibîne, 'aşîq dibe û pey wê dikeve. Ew ji bo ku heqîqetek derkeve meydane çûye nav Ermenistanê. Ew ne bi îradeya xwe, belkî bi teqdîra Îlahî çûye.

*Mey nenoşî Şeyxê Sen'anê xelet
Ew neçû nêv Ermenistanê xelet (61/1)*

2.21. Necef

Necef bi şahê xwe ve bûye mijar. şahê Necefê, bi îstîareyî hatiye bikaranîn. Mehbûb, weke şahê Necefê ye, yanî di meqamekî bilind daye.

*Min dî bi xef şahê Necef sohbet bi kef fincan di kef
Nûn ku jê berdan xedeng wê pur ji teng şîrînleb e (100/3)*

*Min dî ji xeflet cam di kef Şahê Necef dil kir hedef
Roj hate şeref stêr bûne xef her çar teref nûra yeqeq
Zulmet nema suhbet we ma nûra şemalan çû sema
Lê ew dema zulf bûn cema hatin semayê yek neseq (67/1)*

2.22. Behreyn

Behreyn, welatekî xweyî behr e û ji ber şî'ra memdûhê bûye mijar. Şî'rên Mela weke durran in. Durr jî ji behrê (Behreyn) derdikevin. Şair xewwas e û di behrê de durran derdixe.

*Bi xewwasî bi sehharî te dur anîn ji behreynê
Ji şî'ra te şekerbarî ji Misrê ta bi Qezneynê
Bi diqqet bîn sed eş'arî dibêjî terfetil'eynê (131/37)*

*Mela billah di vî dewrî bi vî rengî bi vî tewrî
Nişan da wek Nişanî kes me durr anîn ji Behreyn (89/6)*

2.23. Kerbela

Kerbela, çolek e li Iraqê ye. Îmamê Huseyîn li wê derê şehîd ketiye û ev der di edebiyata klasîk de wek cihê derd, kerb û belayê derketiye pêş. Kerbela, bi îstîareyî hatiye bikaranîn û temsîliyeta mîhnetên rêya 'eşqê dike. Kesê bikeve rêya seyr û sulûkê, pêwîst e gelek wadiyan derbas bibe. Wadiya vê dunyayê jî weke Kerbelayê ye.

*Çûme ser piştî kumeydî min jê pur ew jan û key dî
Behr û ber me l'ber xwe tey dî deşt û çol û Kerbela ye (96/5)*

2.24. 'Erebistan, Mekeh û Medîne

'Erebistan, ji ber fetha memdûhê bûye mijar. memdûhê gelek dever û welat fetih kirine û xistine bin hîmayeta xwe û 'Erebistan jî yek ji wan welatan e.

*Te Fireng û 'Erebistan û Mecer têk standin
Celewê xweş vegerîn hatiye newba 'Ecemê (109/15)*

Şehrê Mekehê, cihekî pîroz e û Beytu'l-Heram li wê derê ye. Ev şehr, ji ber Heceru'l-Eswedê, wek îstîareyî hatiye bikaranîn. Heceru'l-Eswed, xala yarê ye û 'aşîq dixwaze biçite Mekehê (huzura mehbûbê) ku Heceru'l-Eswedê bibîne û wê ramûse.

*Hecer Eswed bidirî destî ziyaret bikirim
Nezrê min bit bigirim xassa terîqa Mekehê (110/8)*

Medîne, di ne'tekî de derbas dibe û ji ber ku cihê wefata pêxember e, bûye mijar. Pêxember li Medîneyê, di rewzeyê paqij de medfûn e û her dildarekî wî dixwaze wê sedefê bibîne. Dîtina wî jî ancax bi çûyîna Medîneyê û bi me'newî hasil dibe.

*Xeyrî te nehin der sedefê behrê wicûdê
Lew lazim e em qesdê bikin rahê Medîne (101/6)*

2.25. Derbend û Semerqend

Derbend, li Daxistanê, li qeraxa bakurê rojavayê Behra Xezarê de, şehrekî dîrokî ye. Ji aliyê Sasaniyan ve wek şehrekî keleh hatiye ava kirin.²⁹ Derbend û Semerqend, di wateya şehr û memleketê de wek memleketên dilberan hatine beyan kirin. Derbend cihê Şîrîne ye û ev der wek “Derbendê husn” hatiye îfade kirin. Mehbûbên van şهران ji aliyê neqşê birhan ve bêqusur in.

*Xusrewê Şîrîne li Derbendê husn
Sîmîberan lazim e lê mehr û bac (30/7)*

*Ne Şîrîna li Derbendê ne mehbûbê Semerqendê
Nekêşayin bi vî rengê li neqşê bêzewal ebrû (106/14)*

Şehrê Debendê ji bo medhê memdûhê, du beytan de jî, bi tewriyewî hatiye bikaranîn. Şair dixwaze şîrînpuserên Derbendê di dîwanê de xizmetkarê memdûhî bin û Derbenda ‘Ecemê jî xelatê teşrîfa wî bi.

*Çendekî şîrînpuser derbendê dîwana te bin
Bendê Şapûrê te bit da Xusrew û Şapûrî bî (117/13)*

*Xass û teşrîfê te bin derya û derbendê ‘Ecem
Da xelatên her seher sed zerkeş û mexmûrî bî (117/18)*

2.26. Bohtan û Cizîr

Bohtan û Cizîr, di dîwanê de, wek du cihên giring, di wateya herêm û şهران de cih girtine. Bohtan, bi îstîar-eyî, ji bo fexriyeyê ku şa’îr xwe gula baxê Îremê Bohtanê dihesibîne û Cizîr jî, ji bo medhê memdûhê hatine bikaranîn. Şa’îr dixwaze Cizîr bibe text û paytextê memdûhê.

*Çendî ku digerrîhim dikêşim sebr û hîrê
Şubhetê çeng û jeh im hilak im j’derba tîrê
Senaxwanê Feqqeh im îroke di Cizîrê (132/50)*

*Tu mebîn bêser û bêsamam im
Gulê baxê Îremê Bohtan im (123/2)*

*Ya Cizîrê şubhê Dara textê heft iqlîmî bit
Da hukm û seldenet Eskender û Fexfûrî bî (117/10)*

2.27. Şam û ‘Iraq

Şam û ‘Iraq, di wateyên welatan de hatine bikaranîn. Şam û ‘Iraq welatê mehbûbê ne. Ji bo wuslatê ferz e ku ‘aşîq biçê Şam û ‘Iraqê ku mehbûbê bibîne, dax û keserên dilê xwe pê bikewîne.

*Sefera Şam û ‘Iraqê li me xweş lazim û fer kir
Bi me da jehr û reqîban di devî şehd û şeker kir (122/5)*

²⁹ Aliyev Salih Muhammedoğlu, “Derbend”, *DİA*, c. 9, İstanbul 1994, r. 164-166.

Encam

Hunermendê heqîqî di navenda civakê da cih digire û di nêv civakê da rolekî mezin dileyîze. Di Kurdistanê de îro jî li ber çavan e ku mela û feqiyên medreseyê û ehlê terîqet û tesewwîfê bi civakê re têkildar in û di navenda şîn û şahiyên civakê her daîm cihê xwe digirin. Çavkaniyên ku bingeha xwe ji civakê hilgirtî vê yekê piştrast dikin. Hukumdar û rêvebirên dewletan yên dîrokî û namdar; şair, ‘alim û sen’etkarên mezin; kesayetên efsanewî û simbolîk, navên ‘eşîr, qewm û welatan, pîşe û meşxûliyetên civakê, xeml û nexşên jiyana rojane û yên ‘eyd û şahiyên, tiştên vexwarinê û maddeyên kêfdanê, leyîstik û pêlîstokên civakê, amûrên şer û nêçîrvaniyê hwd. di paşxaneyê helbestên Cizîrî da cihekî berfireh digirin û wek, îmaj, sembol û mezmûnan şî’ra Cizîrî bedî’tir û dewlemendtir dikin.

Bi goreyê van çavkaniyên hizrî (îmaj, mezmûn, sembol û têgeh) tête dîtin ku Cizîrî xweyî uslûbekî dewlemend û rengîn e. Xeyalên dinyaya wî, sînoren hest û ramangeriya wî kûr û berfireh e. Cizîrî, paşxaneyê hest û hişmendiya xwe di sînoren sen’et û edebiyatê da rijandiye nêv helbestên xwe û ew îmaj, sembol û têgehên di nêv rêzên wî da darijtî, hem dewlemendiya *Dîwana* Cizîrî hem jî ya edebiyata kurdî nîşan dide. Herçend mezmûn wek îmajên hevpar di edebiyatê da cih girtibin jî, di hest û hişmendiya şa’irî de bi teşbîh û mecazan, bi rengekî cuda ve derdikeve pêş. Zanîn û têgihîştina çavkaniyên *Dîwana* Cizîrî, têgehîştina ‘ilmê edebiyata klasîk e û beyankirina paşxane û çavkaniyên edebiyata klasîk e.

Dîwana Melayê Cizîrî, hem şêkil hem jî naveroka xwe ve ku bi sedan îmaj, sembol, mezmûn û têgehên pêk tê, çavkaniyekî sereke ya edebiyata kurdî ya klasîk e û dikare ji edebiyata nûjen re jî, ji aliyê îlham û sûdwergerîtinê ve bibe çavkaniyekî sereke.

Di Dîwana Mela de navê gelek qewm, welat û bajarên bi xusûsiyet û temsîliyetên ciyawaz ve derbas dibe. Dema em li Dîwanê dinêrin em dibînin ku Mela deverên wekî: Fireng (Firengistan), Çîn û Maçîn, Bexdad, Xeta (Xeten), Teter(istan), Seba, Bedexşan, Heleb, Espehan (Esfehan), Kurdistan, Şîraz, Yeng (Yang), Wan, Finik (Findik), Tebrîz û Xurasan, Hebeşistan, Misir, Qezneyn (Xeznîn), Laleş, Ermenistan, Necef, Behreyn, Kerbela, ‘Erebistan, Mekeh û Medîne, Derbend, Semerqend, Bohtan û Cizîr, Şam û ‘Iraq xistiye diwana xwe ku ev dever di wextê xwe de giring in û di edebiyata klasîk a milletên din de, xusûsen jî di farsî de derbas dibin û wekî navendên girîng in. Hêjayî gotinê ye ku ji van deveran hinek navendên dînî ne û hinek jî bajar an jî welatên dîrokî ne. Dîsa Mela di dîwanê de welatê kurdan, Kurdistanê bi kar tîne ku mumkîn e Dîwana Mela berhema ewil a kurmancî ye ku tê de Kurdistan derbas dibe.

Dîsa dema em li Dîwanê dinêrin, em dibînin ku Melayî qewmên mîna ‘Ereb, ‘Ecem, Kirmanc, Tirk, Mecer, Rûm, Nûbî û Zengî, Teter, Hindî, Hebeş, Fireng, Moxul, Qereş (Qureyş), Qecer bi kar aniye ku ew bi xusûsiyetên wan ve, carna bi nerênî bi kar aniye. Mela di gelek şîrên xwe de ev nasname û karakter bi mebesta teşbîh û îstîareyê de bi kar aniye.

Jêder

- AYKAÇ, Yakup, Miks: Navendeke Dîrokî, ‘İlmî, Tesewufî û Edebî. *The Journal of Mesopotamian Studies*, 2022, 7.1: 67-102.
- BOZARSLAN, Mehmet Emin, *Tarihteki İlk Türkçe Ansiklopedide Kürdistan ve Kürdler*, Deng Yayınları, İstanbul 2001.
- CANIM, Rıdvan, *Divan Edebiyatının Kaynakları*, Akıl Fikir Yay, İstanbul 2018.
- CİZİRÎ, Mela Ebdusselamê, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, (Wer. Jan Dost), Weşanên Dara, Diyarbakır 2018.
- DOSKÎ, Mihemed Emîn, *Şirovekirina Dîwana Melayê Cizîrî*, Weşanên Spîrêz, Duhok 2007.
- DOSKÎ, Tehsîn İbrahim, Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, Weşanên Komelgeha Ferhengî ya Ehmedê Xanî, Soran, 2018.
- ERGÜN, Zülküf, *Di Peydabûna Edebiyata Kurdî ya li Cizîra Botan de Karîgeriya Bajarvanîyê*, Teza Lisansa Bilind, Zaningeha Mardin Artuklu, Mêrdin, 2012.
- FINDIKÎ, Seyid Eliyê, *Dîwan*, Weşanê Nûbiharê, , İstanbul 1999.
- HOLTON, R. J., *Kentler, Kapitalizm ve Uygarlık*, Wergêr: Ruşen Keleş, İmge Kitabevi, Çapa Yekem, Ankara, 1999.
- IŞIK, İbrahim S., *Kürtler*, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2013.
- İZADY, Mehrdad R., *Kürtler*, Doz Yayınları, İstanbul 2004.
- MELAYÊ CİZİRÎ, *Dîwan*, (Amd. Emîn Narozi), Avesta, Stembol 2012.
- MELAYÊ CİZİRÎ, *Dîwan*, (Amd. Tahsîn İbrahim Doskî), Nûbihar Yayınları, İstanbul 2019.
- MEYDAN LAOURAUSSE, Sabah Gazetesi Yayınları.
- MUHAMMEDOĞLU, Aliyev Salih, “Derbend”, DİA, c. 9, İstanbul r 1994, r. 164-166.
- QUR’ANA PÎROZ, Kurdî-Tirkî, Meala wê ya İcmalî, (Wer. Abdulkerim Bingöl-Muhammed H. Feyzi), Tenvir Neşriyat, İstanbul 2009.
- ŞEREFKENDÎ, *Ebdurrehman (Hejar)*, Ferhenga Kurdî-Farîsî, Weşanên Surûş, Tehran 1388/1967.
- TEK, Ayhan, *Melayê Cizîrî (Jiyan û Tesîra Edebî, Şerha Xezelên Bijartî)*, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2019.
- TURAN, Abdalbaki, *Melayê Cizîrî Divanı ve Şerhi*, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2010.
- YÖYLER, Celalettin, Şiroveya Dîwana Melayê Cizîrî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2006.
- PALA, İskender, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı, İstanbul 2012.
- YAHEQQÎ, M. C. (1386/2007). *Ferhengê Esatîr ve Dastanwareha der Edebiyatê Farsî*. Tehran: Ferhengê Moesir.
- ZEKÎ BEG, Mihemed Emîn, *Dîroka Kurd û Kurdistanê*, (Werg. Ziya Avcı), Weşanên Avestayê, Çapa Duyem, İstanbul 2012.
- ZIVINGÎ Mela Ehmedê (2013). *Gerdeniya Gewherî/Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, (Wer. Emîn Naruzî), Weşanên Avesta, İstanbul 2013.

Xalên Ansîklopedîk

- BİLGİLİ, Ali Sinan, “Tebriz”, DİA, c. 40, İstanbul 2011, r. 219-222.
- ÇETİN, Osman, “Horasan”, DİA, c. 18, İstanbul 1998, r. 234-241.
- DURSUN, Davut, “Etiyopya”, DİA, c. 11, İstanbul 1995, r. 488-491.
- GÖRGÜN, Hilal, “Mısır”, DİA, c. 29, Ankara 2004, r. 555-557.
- KONUKÇU, Enver, “Gazne”, DİA, c. 13, İstanbul 1996, , r. 479-480.
- ÖZGÜDENLİ, Osman Gazi, “Şiraz”, DİA, c. 39, İstanbul 2010, r. 182-184.
- SÜMER Faruk, “Kaçarlar”, DİA, c. 24, İstanbul 2001, r. 51-53.

Temaya Mirin û Piştî Mirinê di Hizra Feqîyê Teyran de

Diler AYDOĞAN

Kurte

Ev xebat derbarê temaya mirin û piştî mirinê di hizra Feqîyê Teyran de hatîye kirin. Temaya teslîmbûn û mirinê yek ji hizra sereke ye di edebîyata kurdî ya klasîk de. Derbarê vê mijarê de Feqîyê Teyran gelek nimûne dane û em ê jî di vê xebatê de li ser van nimûneyan bixebitin. Di encamê de jî em dibînin ku Feqîyê Teyran helbestên xwe ji bo şîretkarî û hişyarkirinê nivîsîye. Bi rêya helbestan ve dixwaze xema xwe ya civakî derxîne pêşberî me û dixwaze civat dev ji hewes û zewqên dinyayê berde. Wî helbestên xwe wekî mertaleke îmanî raspirtîye civakê û jî gel xwestîye têkeve bin vê mertalê. Loma jî xema wî ya sereke di vê temayê de hişyarkirina rasteqîn ya alema bêdawî ye. Di vê gotarê de me armanc kirîye ku bi çend helbestên ji dîwana Feqîyê Teyran hatine hîlbijartin em temaya mirin û piştî mirinê bidin ber xwe. Li gorî helbestên li ber dest em dê hewl bidin ku fikr û hizra Feqî ya derbarê axiretê de keşf bikin û bibin xwedî hin agahîyan.

Peyvên Sereke: Edebîyata Kurdî ya Klasîk, temaya mirinê, Temaya piştî mirinê, Şîret, Feqîyê Teyran

Feqîyê Teyran Düşüncesinde Ölüm ve Ölüm Sonrası Teması

Özet

Bu çalışma Feqîyê Teyran'ın fikir dünyasındaki ölüm ve ölüm sonrası teması üzerinedir. Bu makalede Feqîyê Teyran'ın divanından seçilmiş bazı şiirler ile Teyran'ın fikir dünyasındaki ölüm ve ölüm sonrası temasının incelenmesi amaçlanmıştır. Bu şiirlerden yola çıkılarak Teyran'ın ölüm ve ahiret ile ilgili fikir ve düşünceleri öne çıkarılmıştır. Teslimiyet ve ölüm teması Klasik Kürt Edebiyatının başlıca temaları arasındadır. Feqîyê Teyran da şiirlerinde çokça bu temaya değinmiştir. Feqîyê Teyran'ın şiirlerinde nasihat ve uyarma amaçlı endişeler görülmektedir. Teyran şiirleri ile toplumsal endişelerini dile getirip toplumdan dünyevi heves ve zevklerine kanmamasını istiyor. Teyran şiirlerini toplum için adeta bir kalkan gibi işlemiş ve toplumdan da bu kalkanın arkasına sığınmasını istemektedir. Dolayısıyla Teyran'ın ölüm ve ölüm sonrası teması nasihat ve toplumu uyarma çerçevesindedir.

Anahtar Kelimeler: Ölüm teması, Ahiret teması, Feqîyê Teyran, Öğüt, Klasik Kürt edebiyatı



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ

Yıl/Year: 2023 • Cilt/Volume: 9 • Sayı/Issue: 18

Diler AYDOĞAN

Mastir, Zanîngeha Bîngolê

Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî

dilerbedirxani@gmail.com

Orcid: 0009-0002-6169-183X

Makale Türü / Article Type:

Araştırma Makalesi / Research Article

Makale Geliş Tarihi / Received: 13.11.2023

Makale Kabul Tarihi / Accepted: 19.12.2023

Makale Yayın Tarihi / Published: 25.12.2023

DOI: 10.56491/buydd.1390106

Atıf / Citation:

Aydoğan, D. (2023). Temaya Mirin û Piştî Mirinê

di Hizra Feqîyê Teyran de. Bingöl Üniversitesi

Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 9(18), 64-73

Theme of Death and Afterlife in Feqîyê Teyran Thought

Abstract

This study is about the theme of death and after death in Feqîyê Teyran's world of ideas. This article aims to examine the theme of death and the afterlife in Feqîyê Teyran's world of ideas with some selected poems from Feqîyê Teyran's divan. Based on these poems, Teyran's ideas and thoughts about death and the afterlife are highlighted. The theme of surrender and death is among the main themes of Classical Kurdish Literature. Feqîyê Teyran has also often touched upon this theme in his poetry. Feqîyê Teyran's poetry is characterized by concerns for advice and warning. Teyran expresses his social concerns in his poems and asks the society not to fall for worldly desires and pleasures. Teyran treats his poems as a shield for the society and asks the society to take shelter behind this shield. Therefore, Teyran's theme of death and the afterlife is within the framework of preaching and warning society.

Keywords: Theme of death, Theme of the afterlife, Feqîyê Teyran, Advice, Classical Kurdish literature

Destpêk

Di warê nivîsîna helbestan de, her helbestkar xwedî rê û rêbazên cihê cihê ne. Di berhemên helbestkarên edebîyata klasîk de carinan eşqa mecazî carinan jî eşqa îlahî dibe mijar, carinan ciwanîya siruştê carinan jî ciwanîya kaînatê dibe mijar herwiha helbestên ku derbarê civat, kesayetên girîng û komelayetî jî bûne mijara helbestên klasîk. Di îcrakirina helbestan de jî helbestkar xwedî taybetî û rê û rêbazên cihê ne herwiha ji bo merama xwe bînin zimên gelek caran metodên cuda di berhemên xwe de bikaranîne.

Bawerîya mirinê di dîne xiristiyanan de tekane rêya ku ji bo mirov bigihîje jîyana îlahî ye. Li gorî xiristiyanan mirin guherînek e. "Mesîh di mirina xwe de ji dinyayê derdikeve û ber bi Bav diçe" (Yu, 13:1). Di dîne musewîyê de, bi mirinê re mirov vedigere axa ku jê hatîye xuliqandin û ruh jî li Xweda vedigere. Ji ber vê yekê jî mûsewî bawerîya bihişt û cehenemê red dikin (Akbaş, 2002:37). Di bawerîya Zerdeştîyê de mirin dawîya jîyana maddî û neqlbûna jîyana manevî ye (Russell, 1989:63). Di dîne Îslamê de jî ruh ji beden vediqete û ji alema fanî ber bi alema bêdawî întîqal e. "ji bo hûn şukir bikin piştî mirinê me we ji nûve vejand" (Beqere, 56) Di îslamê de mirin ne wendabûn e ji nû ve jiyîn e.

Di edebîyata klasîk ya kurdî de temaya mirinê gelek caran derdikeve pêşberî me. Hizra mirinê di edebîyata tesewîfî de ji aliyê helbestkaran ve gelek caran bûye mijara sereke. Carinan temaya wan helbestan bi tirs û xofê hatine hunandin carinan jî wekî xelasîya jîyana dinyewî û gihîştina alema bêdawî ye.

Feqîyê Teyran ku helbestvanekî tesewîfî yê edebîyata kurdî ye, di warê gelek mijaran de helbestên xwe hunandîye û bi rêya wan helbestên xwe şîret û pend li derdora xwe kirîye û heta roja me jî hebûna helbestên wî bûye sedema hişyarkirina ruhîyetê. Feqî jî gelek caran di helbestên xwe de metodên cuda cuda bikar anîye. Feqîyê Teyran, di helbestên xwe de zimanê rexneyê, şîret û pendê, eşqa mecazî û îlahî û heta wehdeta wicûdê bikar anîye. Di hunandina helbestên xwe de bi exleb xwe dispêre civatê di vî warî de gelek helbestên wî yên ji bo civatê hişyar bike hene. Meriv dikare di vî warî de helbesta Şêxê Sen'an wekî mînak bide.

Di tesewîfê de avanîya eşqê, hêz û şîyanê dide helbestvan ku ji bo bikaribe merama xwe bîne zimên. Feqîyê Teyran jî di helbestên xwe de herî zêde temaya eşqê bikar anîye. Çendîn temaya eşqê berbelavtir be jî li gel wê temaya mirin û axiretê jî dikeve berçav çinku wekî her helbestkarê Edebîyata Tesewîfî, Feqî jî mirinê wekî merheleya destpêka gihîştina Xwedê dihesibîne.

Ji bilî edebîyata kurdî di edebîyata tesewîfê ya miletên dîtir de jî gelek nimûneyên vê temayê hene, ji ber ku mijara me bi edebîyata kurdî ya klasîk û Feqîyê Teyran ve sînordarkirî ye em dê behsa wan nekin. Di naveroka berhemên Feqî de em dibînin ku exleb wî li ser tesewîf û eşqê nivîsî ye herwiha li ser felsefe û fenafillahê jî helbestên wî hene. Ji ber ku mijara me temaya mirin û piştî mirinê ye em dê pitir li ser hizra wî ya fenafillahê, mirin û piştî mirinê rawestin. Ji ber ku mijara sereke mirin e divê em di tesewîfê de mirin çawa hatîye destnîşankirin wê jî bidin ber çavan û pênaseyekê ji bo vê têgihê bikin. Em dê mînanan ji helbestên Feqî yê

derbarê mirin û piştî mirinê de wekî çavkanî bikarbînîn û li ser wan mînakên temaya mirinê derbixin û şirove bikin. Li gorî daneyên li ber dest em dê hewl bidin ku vê xebatê bigihînin merheleyekê û encamê jê derbixin.

1. Mirin di Tesewifê de

Di hizra tesewifî de mirin; tenê mirina laşî ye, ne mirina ruhî ye. (Çelik, 2009:122) Tiştêkî bi navê mirina ruhî tune ye. Mirin, ew ruhê ku ji alîyê Xwedê Teala ve hatîye dayîn dîsa li wî vegehrîn e. Ji tarîyê xilasbûn, gihiştina ronahîyê ye, destpêka jîyana rast û ebedî ye (Yakit, 1993:101). Li gorî vê pênasîyê meriv dikare bêje ku mirina dinyewî ne mirineke bêdawî ye, destpêka jîyana bêdawî ye. Divê meriv li dinyayê xwe tûşî kiryarên manewî bike û li benda mirinê bisekine. Di hedîsekê de Cenabê Pêxember di derbarê vê mijarê de wiha gotîye “berî mirinê bimirin” (*elAclûnî, Keşfû'l-Hafâ, 2:29*) di tesewifê de ev hedîs di mijara helbestan de gelekî kartêker e. Herwiha li ser vê hedîsê jî temaya mirinê ji teref gelek helbestvanên edebîyata klasîk ve hatîye bikaranîn û li gorî vê felsefeyê berhemê xwe nivîsîne.

Mirin ji bo her beşerê ku di kaînatê de dijî bêgûman heqîqetêke misoger e. Di ayeta 57. ya sureya Enkebûtê de mirin wiha hatîye wehîkirin: “Her nefis, dê mirinê tehm bike. Hûn dê herî dawî li me bîn vegehrandin” (Enkebût, 29/57). Xwedê Teala mirinê ji bo her kesî re ragihandîye û vê heqîqetê jî bi awayekî eşkere vegotîye. Her wekî zayîn heye, miheqeq dê mirin jî hebe. Lêbelê di bawerîya îslamî de mirina dinyewî tenê derîyê jîyana bêdawî vedike bi zîmanekî din, mirin zayîna jîyaneke nû ye. Her ji ber vê sedemê sofî mirinê wekî hurîyeta ruh dibînin û bi awayekî tirsnaq li mirinê nanîhêrin. Divê her beşerek bi mirinê re heval be û bi felsefeya fena-Allahê tevbigere da ku roja axiretê yanî piştî mirinê xwedî kiryarên qenc be.

Di hizra tesewifî de xala herî girîng yek jê jî keftelefa li pêşberî nefesê ye. Herwekî me li jor jî amaje pê anîyê kesên sofî bi felsefeya “berî mirinê bimirin” radibin. Ji ber ku mitesewif bi vî awayî xwe ji mirinê re amade dikin, ji mirinê natirsîn û bi mirinê dijîn herwiha ji jîyana fanî aciz in û demildest dixwazin li Xwa vegehrîn.

2. Temaya Mirin û Piştî Mirinê di Hizra Feqîyê Teyran de

Feqîyê Teyran yek ji helbestkarên gewre yê edebîyata kurdî ya klasîk e. Di warê tesewifî de tegihên jîyan û mirinê di helbestên xwe de tîkelî hevûdu kirîye. Temaya mirinê di helbestên wî de gelek caran derdikeve pêşberî me. Feqî li gorî rewş û haleta helbesta xwe temaya mirin û piştî mirinê rave dike. Carinan mirinê wekî xelasîya fanîbûnê dibîne carinan jî bo roja hesaban xwe mehcûb dibîne û mirinê bi awayekî tirsnaq nîşan dide her wiha di mersîyeya ku nivîsîye de jî ji ber ku ji hezkirîyên xwe cuda bûye xema mirinê dikêşe.

Feqîyê Teyran di her helbesta xwe de balê dikêşe ser qudsîyeta axiretê. Metirsîya mirinê û piştî mirinê jî bi awayekî vekirî di helbestên xwe de kirîye mijar û li gorî mijara xwe jî şîretên xwe bi xwendevanan re parve kirîye. Bi vê jî mebest kirîye ku xwendevan û civat li gorî exlaqeke baş tevbigerin û teşeya jîyanê bi vî awayî bigerînin.

Di hizra tesewifî de mirina ruh tune ye û helbestvanê vê edebîyatê jî li gorî vî qaydeyî tevgerîyane. Feqîyê Teyran jî di helbestên xwe de bi vê nêrînê nivîsîye. Di helbestên wî de em dibînin ku ew gilî û gazindên xwe ji fanîbûnê dike û xema roja baqîbûnê dikşîne herwiha ji bo roja axiretê jî kar dike.

Feqîyê Teyran di helbestên xwe de balê dikîşîne ser kiryarên qenc û xirab. Eger meriv di nav kiryarên xirab de cih girtibe mirinê ji bo wî kesî wekî tirs, xof û agirê cehenemê pênasê dike. Eger meriv xwedî kiryarên qenc jî be wê demê mirinê jî bi awayekî xweş pênasê û rave dike. Em dê di helbestên wî de hizra mirinê analîz bikin û ji wan mînakên bidin.

2.1. Ey Av û Av

Feqî di vê helbesta xwe de, bi alîkarîya metafora avê, şerha eşqa xwe ya îlahî dihîne der. Herwiha bi gotegota xwe ya ku li gel avê coş û heyecana dilî derdixîne berçav. Di vê helbestê bêhtir behs li fanîbûn û kaînatê dihê kirin. Ev helbest bi giştî ji 46 malikan pêk dihê. Di vê helbestê de em dê tenê li ser mînakên temaya mirin û piştî mirinê rawestin. Wekî mînak;

*Ji wesletê cuda kirîn
Ji suhbetê em rakirîn
Hetta qiyam sewda kirîn
Sergeşte bûn di hedretê (Yıldırım, 2022: 46)*

Di vê malikê de Feqî diyar dike ku heta qîyametê ew dê sewdeserê eşqa îlahî be û di vê oxirê de jî razîye ku sergeşte be yanî serzîz be.

Rasit e qewî ev mela!

*Eslê qisê zanî hela?
Hîna ku bû “qalû bela”
Ma hûn nebûn di hedretê? (Yıldırım, 2022: 46)*

Berîya ku em tesbîta xwe derbarê vê malikê de bikin divê em bi kurtî behsa têgiha “Qalû Bela”yê jî bikin. Ji ew cihê berîya ku dinya ava bûye û ruh lê kombûne re Qalû Bela dihê gotin. Qalû Bela bi taybetî di edebiyata tesewîfî de xwedî cihekî girîng e, bi navê Bezm-î Elest jî dihê naskirin (Coşkun, 2016:97). Di ayetên 172 û 173 yan yê sûreya Arafê de jî sihbeta di navbera Xweda û ruhan de hatîye ji Cenabê Pêxember re hatîye wehîkirin.

Feqî jî di vê malikê de balê dikêşe li ser wê bûyerê û bi awayekî gazindî soza ku li hember Xwedê dane dixê bîra guhdaran.

*Di hedretê ma hûn nebûn?
Li Latîfî pêweste bûn
Di xizmeta Baxoy xwe bûn
Heyane roja axretê (Yıldırım, 2022: 46)*

Di vê malikê de jî berdewamîya malika jorîn dihête kirin. Feqî guhdaran arasteyî soza wan a Qalû Belayê dike û bi bîra wan dihîne ku wan soz daye Xwedayê xwe û divê li ser wê sozê rawestin û heta roja axiretê di xizmeta Xwedê de bin.

Di vê helbestê de Feqî ji alîyê vegotinê ve metodeke qewî bikar anîye. Hem li gel avê dikeve nav gotegotê hem jî ji alîyê kesê sêyem ve mijarê dide berdest û li gorî rêçûna helbestê ahengê diguherîne. Ji alîyê bikaranîna zimên ve jî carinan xwerû/sade û hêsan e, carinan jî metodên dijwar dikeve berçav û meriv asê dibe. Ji ber ku mijara me tenê bi temaya mirinê ve sînardarkirî ye em dê zêdetir nekevin nav meseleya zimên û uslûba helbestê.

2.2. Hûn Werin

Feqîyê Teyran ku wekî helbestvanê şîretê jî dihê zanîn, di helbestên xwe de mijara mirinê bi awayekî zêdetir bikar anîye. Di vê mersîyeyê de jî ligel ku di kedereke xedar de ye jî di çarçoveya wahdet-ul wicûdê de merama xwe îfade kirîye. Di vê helbestê amaje pê dihîne ku dinya fanî ye, bi felekê re bawerî nabe, her tişt mecaz e, ji bilî heqîqetê yanî heqîqeta Şahê Qudretê her tişt fanî ye.

Wextê em li benda yekê dinihêrin ku gazî cîran û xelkê am dike: Feqî di mijarên tesewîfî û dînî de hatîye astekê, û dizane ku xêr jî, şer jî ji Xwedê ye, lê ji ber ku ji jina! xwe gelekî hez kirîye nizanê dê çawa tevbigere. Ew Feqîyê şîretkar xwe diavêje bextê xelkê ku çareserîyekê jê re bibînin û derdê wî sivik bikin.

Eger ji hêla metnê ve em lê binêrin, ji bo mecaz û heqîqetê berawirdîyek dikeve pêşberî me. Tiştên fanî çiqasî xweş bin jî wextek dihê bi dawî dibin û vedigerin heqîqetê. Dinya ku navenda mecaza însên e dişibe qebrê, qebr jî hemû xweşikahîyan di nav xwe de difetisîne. Feqî li vir jî ber mirina yara! xwe gelekî aciz bûye lê ne li ber heqîqetê li ber mecazê serî hildide, dinyayê û felekê sîcdar dike.

Ji hêla takekesî ve jî em dikarin nirxandineke wisa li ser vê helbestê bikin: Herçend di vê helbestê de nîşan û qaîdeyên evîndarîyê hebin jî temaya hizin, matem û mirinê berbelavtir e her wiha pesn û bilindkirina Xwedê û heqîqeta mirin û fanîtiyê wekî mijara sereke hatîye neqşkirin. Dîsa Feqî dixwaze şîretê di nav helbestê de bihewîne. Herwiha dixwaze bîne zimên ku ew jî hewcedarê şîretan e.

Ev helbest ji 20 beytan pêk dihê, çend mînakên derbarê mirin û piştî mirinê di vê helbestê de ev in:

Îro qewî têtin girî

Sosin di mêrgan xeyirî

Sed heyf li lêvê şekirî

Êdî venaxwut şerbetê (Yıldırım, 2022: 47)

Feqî di vê malikê de eşkere dike ku xwediyê lêvên şekirî edî dê nikaribe lezetê ji dinyayê werbigire, loma jî wê dişibîne sosineke çilmisî an jî rengjêçûyî.

Herçî dike ew Mîr dike

Xêr û şeran teqdîr dike

Daxan li qelban pir dike

Sotim bi narê firqetê (Yıldırım, 2022: 47)

Di vê malikê de jî Feqî behs ji Rebê Alemê dike û dibêje; ew ê ku me ji hev cuda kirîye Xweda ye. Herçend dil bisoje jî, cudahî acizîyê bide jî xêr û teqdîr ji wî ye. Di van malikan de mirin bi temayeke hizinê derdikeve pêşberî me.

Mîm û Hê şairê pak e

Her kesê bi ruh ji mak e

Hemîyan Xaliq fena ke

Xeyrî ji Şahê Qudretê (Yıldırım, 2022: 49)

Di vê malikê de feqî dîyar dike ku her tiştên li dinyayê; çî dar û ber, însên, cin û heywên her candarekî ku ruh pê re heye dê bimirin. Ango dê Xwedê ruhê wan bistîne her wiha li kaînatê ji bilî Şahê Qudretê yanî Xwedê pê ve çî kes dê nemîne. Bi vî awayî balê dikêşe ser fanîbûn û jîyana derewîn ya dinyayê.

2.3. Beyta Dilî

Di vegotina vê helbestê de Feqî, yekser li ser dilê beşeran ve mijara xwe dihûnîne. Di vê helbestê de bi exleb li ser razana dilî bûyer diqewime li gel razanê, daraza xefletê bi zimanekî tund hatîye vegotin.

“Wî xwestîye ku pêxember û dewlemendên dîrokî bi bîr bîne û aqûbeta wan li ber çavan raxîne, da ku hay ji xwe û aqûbeta xwe hebe. Bi vî awayî xwe û nefsa xwe dixê bin kontrolê û xwe ji Xwedayê xwe xafil nahêle” (Ertekin û Basuğuy, 2022: 66).

Bi gelemperî ev helbest li ser fanîbûnê ye û temaya mirinê di vê helbestê de berbelav e. Ev helbest ji 82 beytan pêk dihê, ji ber ku temaya mirin û piştî mirinê di vê helbestê de gelek in em dê li ser çend mînakan tenê rawestin.

Dibarin tîr ji gerdûnê

Ji xew rabe demek runê!

Tu natirsî ji îtûnê!

Li bin te agir û nar e (Yıldırım, 2022:51)

Feqî di vir de, behs li wehşeta dinyayê dike. Li gorî metodên bikaranîye meriv fêm dike ku ew dinyayê cihê xefletê û mirovî jî wekî korekî di hundirê wê de digevize dibîne. Temaya piştî mirinê di vê malikê de bi tirs hatîye vegotin.

Tu qûtê xwo niha çar ke

Zewada axretê kar ke

Bilezîne û zû bar ke

Ku hêja suk û bazar e (Yıldırım, 2022: 56)

Di vê malikê de Feqî hem balê dikêşe ser tedbîrê hem jî girîngîyê dide kiryarên qenc ji bo roja axiretê yanî piştî mirinê. Divê meriv ji bo roja axiretê di nav kiryarên qenc de be, hêj ku meriv li ser dinyayê ye divê tedbîra xwe

li gorî piştî mirina xwe ve girê bide û ji bo roja nihayî amade be.

Ne Adem ma û ne Şîs ma

Ne Nûh ma û ne Îdrîs ma

Ne Yunus ma û ne Cercîs ma

Ne Eyyûbê brindar e (Yıldırım, 2022: 57)

Di helbesta Beyta Dilî de meriv bi awayekî giştî temaya mirinê û piştî mirinê dibîne. Bi exleb behs li tedbîra roja axretê û nesihetê hatîye kirin. Di vê malika ku me hîlbijartîye de jî Feqî bi zimanekî gelekî zelal û vekirî behs ji Pêxemberan kirîye û dibêje; dinya ji wan re nema û bi me dide fêmkirin ku dê dinya ji me re jî nemîne.

2.4. Îlahî Ebdûke Atak

Feqî di vê helbestê de ligel rehma Xwedê behsa roja axiretê û hesabdayînê dike. Di beytên vê helbestê de meriv dibîne ku Feqî ji bo roja axiretê 'ef û îmanê ji Xweda nîyaz dike. Ev helbest ji 26 beytan pêk dihên. Hin mînakên metirsîya roja axiretê di helbestê de ev in:

Îlahî 'ebdûke atak

Fehaza 'indeke atak

We ma Rebbun lehu siwak

Rehîmtir ji da û baban î (Yıldırım, 2020: 86)

Di vê malikê de Feqî dibêje; ey Xweda ebdê te hate cem te, hatîye pêşberî hizûra te ji bilî te Rab tune ye û tu ji dê û bav bi rehmêttir î. Armanç di vir de efû xwestin e. Feqî di vê helbestê de temaya piştî mirinê anîye zimên û di seranserê helbestê de tewbe xwestin û mehcûbî dihête dîtin.

2.5. Bersîsê Abid

Di vê çirokehelbestê de behs li abidekî ku ji rêya Xwedê dur dikeve dihête kirin. Di vê çîrokê de mijar bi exleb li ser fitneyê hatîye hunandin. Bersîs ji rêya heq derdikeve, kiryarên ne qenc dike û ji şeytanî re biat ango secde dike. Di encama vê helbestê de jî Bersîs bêîman diçe qebrê. Ev helbest ji 211 beytan pêk dihê di helbestê de temaya mirin û axiretê bi vî rengî derdikevin pêşberî me.

Taetê pir wî rîz dikir

Ji herçî heram perhîz dikir

Zêde ji qencan bîz dikir

Ji tîrsa roja axretê (Yıldırım, 2020: 98)

Temaya piştî mirinê di vê malikê de xwe kifş dike. Di vê malikê de ji ber tîrsa roja axiretê Bersîs ketîye nav kiryarên qenc û xwe dûrî heramîyê kirîye û bûye dostê kesên qenc.

Pîroz e tem'a axretê

Ya nav û namûsa me tê

Meyla liqaya cennetê

Ew fi'le xas bi kêr me tê (Yıldırım, 2020: 107)

Di vê malikê de jî xweşîya axiretê dihê vegotin. Amaje dike ku namûs û keramet di axiretê de ye û herwiha lavaya cennetê hatîye kirin. Di malika jorîn de her tiştên ku qenc û rast in di roja axiretê de dibe nesîbê beşeran. Feqî, metirsîya roja axiretê û mirinê bi awayekî eşkere li ber çav dihîne. Behs ji giranîya roja axiretê hatîye kirin.

2.6. Zembilfiroş

Di vê çirokehelbestê de behs li Zembilfiroş û Xatûna Mîrî dihête kirin. Di vê helbestê de jî gelek nimûneyên şîretê derdikeve pêşberî me. Zembilfiroş kesekî di rîya Xwedê de ye û ji Xwedayê xwe re jî sadîq e. Bi karê

selikfirotinê ve mijûl e. Xatuna Mîrî wî dibîne û eşqa mecazî li serê wê dixê. Ew dixwaze Zembilfiroş bixapîne û wî aletî emelê xwe yê neqenc bike. Ev çîrokehelbest serpehatîya Zembilfiroş û Xatûna Mîrî bi me re dide zanîn.

Ev helbest ji 56 beytan pêk dihê û hin tesbîtên temaya mirin û piştî mirinê de di helbestê ev in;

*Law ji Xatûnê dibête
Tu mexwaz ya dil divête
Da ji heq nebin fihête
Rûsipî bin di qiyametê*

*Gul dibê; Bawêj xeyalan
Were nav doşek û balan
Têk bide zulfan û xalan
Dur e roja axretê (Yıldırım, 2020: 130)*

Di malika yekem de Zembilfiroş balê dikêşe ser roja qiyametê û ji bo li pêşberî Cenabê Heq fedîkar nebin hişyarîyan li Xatûnê dike. Ew amaje dike ku piştî vê fanîbûnê baqîtî heye û ji bo hewesên dinyewî divê axireta meriv nekeve nav xeterê. Xatûnê jî wekî bersiv lê vedigerîne; Hê ji roja axiretê re heye, dixwaze meyla wî bibe ser kiryarên neqenc.

Di vê helbestê de bi du awayan temaya mirinê derdikeve pêşberî me yek ji aliyê kesekî sofî ve nêrîna roja axiretê û tirs û mehcûbîyeta ji Xwedê rave dike di ya din de jî kesekê ku li pey nefis û lezeta dinyayê ketîye hatîye destnîşankirin.

*Er bi roj û er bi şev e
Ta'et bikin hûn bi xev e
Kesê ku rast xeber ev e
Da hûn nebin ji axretê (Yıldırım, 2020: 134)*

Di vê malikê de jî Feqî bi awayekî pendî behs ji roja axiretê kirîye û ji bo piştî mirinê dibêje meriv taet û îbadetê bike da ku axireta mirovî baş be.

2.7. Kela Dimdimê

Kela Dimdimê destana qehremanîya kurdan e. Di vê helbestê de bi exleb uslûba mêranîyê hatîye neqşkirin. Temaya mirinê di vir de li ser şehîdbûnê û di rêya Xwedê de ye. Li gorî lêkolerên qadê Kela Dimdim, destana mêrxasî, qehremanî û welatparêzîyê ya ji hemîyan mezintir û belavtir e. Naveroka wê têt û tîjî ye û uslûba wê gelekî rewan e weke berhemên din ên Feqî. Loma jî ev dastan di nava kurdan da gelek belav bûye û ji aliyê civaka kurdî ve gelek hatîye hezkirin (Kaplan, 2015: 5). Dîsa di gelek çarînên di da medhê qehremanî û welatperwerîyê dihête dayîn. Li gor Feqî piştî şerî mayîn qehremanî ye û mirin jî şehadet e, lewma divê mirov xwe ji şerê bo parastina welatî nedete paş. Mirov dikare beş û çarînên vê helbestê di hînkirina nixxên civakî ên wekî qehremanî û welatperwerî yê da bi kar bîne. (Kurt, 2022: 103)

Di vê destanê de, behs li şerê kurdan û şahê Îranê dihête kirin. Di nav gel de jî gelek versiyonên ku ji aliyê dengbêj û çîrokbêjan ve hatîye vegotin heye. Ev helbesta Feqî ji 67 beytan pêk dihê. Her wekî me di destpêkê de jî amaje pê anîye, ev helbest helbesta qehremanî ye û temaya mirinê di vir de bi qehremanîyê hatîye hunandin. Gelek nimûneyên mirin û piştî mirinê di vê helbestê de hene. Hin ji wan ev in;

*Helal kirîye Tahayê
Mezhebê we bi kêr nayê
Em dimrin nayête rayê
Axret xwoştir e ji dinyayê (Yıldırım, 2020: 135)*

*Şehîd bin terka dinê kin
Navekî ji xwe re çêkin
Bes e Kelê asê kin
Rabin vêk ra hewlê kin (Yıldırım, 2020: 135)*

*Şehîd bûn çun ji Xwedê ra Ew rengen govend gera
Xan û ev xelkê wê ra
Beheşt û hûrî jê ra (Yıldırım, 2020: 143)*

*Hemî kuştin bixwe ran
Şehîd bûn çûne baxan
Bihîşt birin ji xwe ran
Gotin dema jimiran (Yıldırım, 2020: 144)*

Her wekî di beytên jorîn de jî hatîye eşkerekirin mirin bi awayekî qehremane hatîye pêşwazîkirin. Di oxira rêya heq de mirin dihêtê hunandin û di encamê de bawerî bi cenet rehmanî hatîye kirin.

2.8.Şêxê Sen'anî

“Yek ji çîrokên têkilî ‘işqa mecazî û dubendîya ‘işqa mecazî-îlahî ya ‘aşîqî, çîroka Şêxê Sen’an e ku di edebîyatên gelên misliman de û xusûsen di edebîyata tesewîfî de bi gelek varyantan heye û berbelav e. Edebîyata Kurdî jî xwe ji vê çîrokeşî‘rê bêpar nehiştîye, bo nimûneFeqîyê Teyran ev çîrok wekî menzûmeyekê bi zimanê kurdî û bi hostayî honaye” (Ertekîn û Basuğuy, 2022: 80)

“Ev pendeçîrok hikmeteke derasayî di xwe de dihewîne. Çîrok çendîn tesewîfî be ew qas jî hikemî û şîretamîz e. Ji ber ku behsa rêya heqîqetê ya di mecazê de dike, hin caran nehatîye fam kirin an şaş hatîye famkirin. Jixwe ev mijara ‘işqa heqîqî, di edebîyatê de pîrî cara ji bo lêkoleran bûye gengeşî û ciyê nefamiyê” (Ertekîn û Basuğuy, 2022: 89).

Em dê zêde nekevin nav naveroka helbestê, di vê serpehatîyê de em dê behtir bala xwe bidin ser temaya mirin û axiretê. Ev helbest 362 beytan pêk dihê û gewretirîn helbesta feqî ye. Em dê nimûneyên mirin û piştî mirinê bi çend beytan rave bikin.

*Sofî dibên: “Ya Ellah e”
Şêx îxtiyar kir dojah e
Tabî' bibin çî tê neh e
Lahiq dibin di hirqetê (Yıldırım, 2020: 173)*

Di vê malikê de mirîdên Şêxê Sen'an dibînin ku, şêxê wan ketîye nava xefletê û rêyeke xirab hilbijartîye. Mirîdên wî ji ber tirsaxiretê û agirê cehenemê xwe ji rêya wî didine alî û ji dergehê wî cuda dibin.

*Di hezreta hev fekkirîn
Li ber surê nasebirîn
Her du bi derdê hev mirîn
Li wê gihane wesletê*

*Ji hezretê halek wê dî
Herdû bi libsê cesedî
Çûne heyata ebedî
Zava û bûkên axretê (Yıldırım, 2020: 196)*

Di vê helbestê de eşqa îlahî bi awayekî mecazî hatîye hunandin. Di encamê de Şêxê Sen'an mebesta xwe înye der. Di van malikên jorîn de jî kifş dibe ku bi awayekî pak û paqij dê li axiretê bigihêjin meqsed û miradê xwe. Axiret xelasî û bêdawîbûn e her wiha cihê şahî û kêfxweşîyê ye. Mirin di vê helbestê de wekî gihîştinê derdikeve pêşberî me.

2.9. Fesla Biharê Cennetê

Di vê helbestê de Feqî, biharê dişibîne cenetê û pesna wê dide her wiha bi zimanekî dilhejok helbesta xwe di-hunîne. Gava em li helbestên Feqî dinihêrin bi exleb di dawîya wan de behsa mirinê an jî axiretê kirîye. Di vê helbestê de jî heman metod derdikeve pêşberî me û ji bo roja axiretê dua û lavayan ji Xweda kirîye. Ev helbest ji 12 beytan pêk dihê û hin mînakên derbarê mijara me de ev in;

Eya Îlahî dikim hewar

Ji tirsî ezabê nakim qirar

Bi rehma xwe me ke sitar

Dîsa bi xêr bêtin bihar (Yıldırım, 2020: 204)

Her wekî li jorê jî me amaje pê anîye Feqî ji tirsî ezabê ji Xwedê re lava kirîye û xwestîye ku bi rehma Xwedê bête bexşandin da ezab ji qebrê nebîne.

2.10. Îro ji Dest Husna Hebîb

Di vê helbestê de temaya sereke evîn û hestên dilî ne. Behs li agirê eşqê dihête kirin û ji haleta tê de ye nerazîbûnek jî heye. Ew di vê helbestê de ji ber perîşanî û nexweşîya xwe mirinê kirîye armanc. Ev helbest ji 34 beytan pêk dihê û hin mînakên derbarê mirinê de ev in;

Sotime qet pêt û nar e

Kuştîme derb lê dîyar ne

Min demek Sebr û qirar ne

Nexweşê pir jan im ez (Yıldırım, 2020: 223)

Encam

Di edebîyata klasîk ya kurdî de Feqîyê Teyran yek ji stûnên herî bibandor û xwedan hizr û hêz e. Eger em berawirdiyekê derbarê wî û nûnerê edebîyatvanên rojhilafî de bikin em dê nikaribin Feqî ji wan helbestvanên gewre yê wê qadê cuda bikin û kêmbibînin. Feqîyê Teyran bi afirandina berhemên xwe û hizr û ramana xwe ve mora xwe li edebîyata kurdî a klasîk xistîye. Di avakirina berhemên de kêşên xwemalî (kurdî) bikar anîye û gelek berhemên bandorker û resen di vî warî de wekî mîras hinartî ye.

Feqîyê Teyran di helbestên xwe de mijarên wekî eşqa îlahî û mecazî, ciwanîya siruştê, pesn û medhdana Cenabê Pêxember û Şahê Qudretê û hwd. kirîye. Di her helbesteke wî de hewldana şîret û pendê heye. Di vê xebata me de mijar derbarê mirin û piştî mirinê hatîye bisînorkirin lewre me jî li gor daneyên li ber dest ev xebat nirxand.

Di her helbesta wî de hizra mirin anjî axiretê nayête dîtin lêbelê di helbestên wî de nîşaneyên vê mijarê hene. Di “Ey av û avê” de balê dikêşe ser Qalû Belayê û derbarê wê mijarê de balê dikêşe ser roja axiretê. Di helbestên wî de teslîmbûna Xwedê bi awayekî aşkera dikeve berçav. Herî zêde ev tema di helbesta “Hûn Werin” û “Dilo Rabe” de derdikeve pêşberî me.

Di helbesta “Hûn Werin” de cihêbûna ji dost/yarê hizin û matema xwe dihîne ser zimên û amaje pê dihîne ku mirin tenê destpêke û ne bêdawîbûn e. Di helbesta “Dilo Rabe” de şîret li guhdaran dike û ji bo roja axiretê wan dawetî tedbîrê dike û behsa dijwarîya axiretê û qebrê dike.

Feqîyê Teyran di helbestên xwe de wehdeta wicûdê û fenafillahê jî wekî metodekê kirîye mijar û di vî warî de jî helbestên xwe danîye. Di destana Kela Dimdimê de mijara şahadetê dikeve pêşberî me herwiha di helbesta Şexê Sen’an de jî metodên derbarê wehdeta wicûdê derdikevin berçavan.

Di helbesta “Îlahî Ebdûke Atak” de Feqîyê Teyran risteyên helbesta xwe yekser bi temaya mirin û piştî mirinê dinivîsîne û mijara xwe di çarçoveya vê ramanê de dihunîne. Di helbesta Zembilfiroş de jî qencî û xirabî ji hev cuda dibin û bi awayekî zelal Zembilfiroş xwe dûrî nefis û kiryarên dinyewî dike û hesabê piştî mirinê bi bîra guhdaran ve dixîne.

Di helbestên dîtir de jî xwe parastina ji agirê cehenemê dihête dîtî û felsefeya “berî mirinê bimirin” di helbestan de dihête dîtî. Mirin di helbestên Feqîyê Teyran de bi exleb gihîştina Xwedê temsîl dike û bi awayî marifeta xwe bi rêya helbestên xwe ve derxistîye der.

Feqî di temsîlyeta mirinê de hêla xwe ya mitesewif derxistîye der û derbarê vê temayê de miheqeq şîret û rêyekê nişanî guhdaran kirîye da ku ji wê roja hesab dayîne mumîn fedîkar nebin û da bizanibin dinya fanî ye û heq tenê li ba Xwedê ye. Hizra tefekurê û nefsbîçûkîyê derdikeve pêşberî me û wekî ronîkerekî xwe bi guhdaran daye naskirin.

Çavkanî

- Akbaş, Muhsin. (2022) Yahudi ve Hristiyan Düşüncesinde Ölüm Sonrası Hayat ve Diriliş İncancının Dini ve Teolojik Temelleri, *Dokuz Eylül Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi* 15, 37-60
- Bashirov, D. (2021).Tasavvufta Ölüm.(Yüksek Lisans Tezi). Bursa Uludağ Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü.
- Çelik, İ. (2009) Türk Tasavvuf Düşüncesinde Ölüm, Atatürk Üniversitesi,Türkiyat Araştırmaları Enstitü Dergisi, Sayı:40, Erzurum.
- Diyanet, Meal. (2012) Eref, 172/173.
- Diyanet, Meal. (2012) Enkebût, 29/57.
- Diyanet, Meal. (2012) Beqere, 56.
- El-Acluni, İ.B.M (2019) *Keşfü'l Hafa. İstanbul: Beka Yayınları.*
- Ertekin, M.Z û Basuğuy, B. (2022). *Feqîyê Teyran: Şai're Hikmet û Nesihetê.* Timurtaş, A. û Özdaş, H. û Ahmad, H.O. û Acar, M(Ed), Feqînasî, Ankara: Peywend.
- Kitabî Mukaddes. (1998) Yuhanna 13/1.
- Kurt, Ş. (2022). Bikaranîna Berhemên Feqîyê Teyran di Perwerdeya Nîrxan da.Timurtaş, A. û Özdaş, H. û Ahmad, H.O. û Acar, M(Ed), *Feqînasî.* Ankara: Peywend.
- Russel, J. (1987) Our Father Abraham and the Magi, Journal of K. R. Cama Oriental Institute.
- Saydun, E. (2018). Teşe û Ciwankariyên Wêjeyî Di Dîwana Feqîyê Teyran De.(*Yüksek Lisans Tezi*). *Van Yüzüncü Yıl Üniversitesi.* <https://tez.yok.gov.tr/>.
- Yakıt, İ. (2019). *Batı Düşüncesi ve Mevlânâ.* İstanbul:Ötüken Neşriyat Yayınları.
- Yıldırım, K. (2014). *Fakî-yi Teyran Dîvan – Dîwan Feqîyê Teyran.* T.C Kültür ve Turizm Bakanlığı. Ankara.

Zazaki dı Zafomari

Ayetullah KARABEYESER

Xulasa

Zafomari, yo kategoriya zıwanşınası ya u zıwan ra zıwan bedliyena. Têkî zıwanan dı halê zafomari bitertib o la têkî zıwanan dı hem zafomariya bitertib hem zi zafomariya bêtertîb esta. Heto bin ra têkî zıwanan dı teyna yo wesıla zafomari esta la têkî zıwanan dı wesılı zafomari zêd i.

Ina xebat dı behsê Zazaki dı zafomari beno. Zazaki dı, dı wesılı zafomari esti la-belê mi wesılan herında yobinan dı şıxulnayış mumkun niyo. Her yo wesil cayanê ciyayan dı şıxuliyena. Ino hal zi inê mewzuyi keno yo mewzuyo xısusî. Inay ra ina xebat dı behsê nameyan dı zafomari, zerreyê cumle dı wext fail ya zi obje zafomari bi şıxuliyayışê zafomari, antişê fiili dı pê tesirê fail ya zi obje ramotışê zafomari, izafeya name u izafeya sıfeti dı şıxuliyayışê zafomari beno.

Kelimeyi Muhimi: Zafomari, Gramer, Zazaki

Zazaca'da Çoğul Hal

Özet

Çoğul hal dilden dile değişiklik gösteren bir dilbilgisi kategorisidir. Bazı dillerde düzenli bir çoğul hal durumu sözkonusu iken bazı dillerde hem düzenli çoğul hem de düzensiz çoğul hali ortaya çıkmaktadır. Yine bazı dillerde tek bir çoğul eki var iken bazı dillerde birden fazla çoğul eki kullanılmaktadır.

Bu çalışmada Zazaca çoğul hal ele alınacaktır. Zazaca'da iki çoğul eki bulunmaktadır ancak bu eklerin birbirinin yerine kullanılması mümkün değildir. Zazaca'da var olan iki çoğul ekinin birbirinin yerine kullanılmaması konuyu ilginç kılmaktadır. Bundan hareketle çalışmamızda Zazaca isimlerde çoğulluk, cümle içerisinde çoğul olan kelime veya kelime grubunun özne veya nesne görevinde kullanılması halinde alacağı çoğul eki, fiil çekiminde özne veya nesneye bağlı olarak çoğul halin gösterilmesi, isim ve sıfat tamlamalarında çoğul kullanımı ele alınacaktır.

Anahtar Kelimeler: Çoğul, Dilbilgisi, Zazaca

Plural Form in Zazaki

Abstract

The plural form is a grammatical category that varies form language to language. While some languages have a regular plural form, some languages have both regular and irregular plural forms. Again, while some languages have a single plural suffix, some languages use more than one plural suffix.

In this study, the plural form of Zazaki will be discussed. There are two plural suffix in Zazaki, but it is not possible to use these suffixes interchangeably. The fact that two plural suffixes in Zazaki cannot be used interchangeably makes the subject interesting. From this point of view, in our study, plurality in Zaza nouns,



BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ

Yıl/Year: 2023 • Cilt/Volume: 9 • Sayı/Issue:18

Ayetullah KARABEYESER

Dr. Öğr. Üyesi

Universiteya Bingoli

Qısımê Zıwan u Edebiyatê Zazaki

akarabeyeser@bingol.edu.tr

Orcid: 0000-0003-1959-530X

Makale Türü / Article Type:

Araştırma Makalesi / Research Article

Makale Geliş Tarihi / Received: 14.11.2023

Makale Kabul Tarihi / Accepted: 19.12.2023

Makale Yayın Tarihi / Published: 25.12.2023

DOI: 10.56491/buydd.1390825

Atıf / Citation:

Karabeyeser, A. (2023). Zazaki dı Zafomari,

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü

Dergisi. 9(18), 74-84

the plural suffix to be used in case of the plural word or phrase used as subject or object in the sentence, the indication of the plural form in the verb conjugation, the plural use in the noun and adjective phrases will be discussed.

Keywords: Plural, Grammar, Zazaki

Destpêkerdış

Zafomari zıwanşınasi dı yo kategoriya morfolojik, morfosentaktik u semantik a. Ina kategori zıwan dı zafiya mevcudi ifade kena. Her zıwan dı nameyi goreyê omartışi, kategoriyanê ciyayan dı ca geni. Têki zıwananê dınya dı zafomari pê wesılanê antişi u pê yo qeyde yena ramotış têki zıwanan dı ge ge wesil şıxuliyena ge ge zi têki nameyi teberê qeydeyê wesil dı pê yona usul beni zafomar. Têki zıwanan dı nameyi yoomar u zafomar esti la têki zıwanan dı zi hem nameyi yoomar hem diomar hem zi zafomari esti. Zıwanê Ereki dı nameyi hem yoomar (mufred) hem diomar (tesniye) hem zi zafomar (cem) i (Akbaş, 2021:35). Heto bin ra Ereki dı zafomari teyna pê yo qeyde zi nêvıraziyena. Usulê zafomariya nameyanê nêran (muzeker) u mayan (muenes) ciya yo, nameyi nêri u mayi pê qeydeyanê ciyayan beni zafomar (Akbaş, 2021:40-41). La heme nameyi Ereki pê ini dı usulan zafomar nêbeni, yo zi usulê bê qeyde vıraziyayışê zafomari esto, mo usul dı pê bidesan forman nameyi beni zafomar (Çörtü, 2019:535). Zazaki dı nameyi ya yoomari ya zi zafomar i. Zê Zazaki Farıski, Kurdki u Tırki dı zi nameyi ya yoomari ya zi zafomari u ini zıwanan dı zafomari pê peyniya nameyi ameyişê wesıla zafomari vıraziyena.

Merkezê ina xebat dı Zazaki esta la semedê hina hol izehbiyayışê mewzuyi ge ge behsê zıwananê Tırki, Farıski u Kurdki zi beno u Zazaki u ini zıwani niyeni tivera. Tırki ayidê familyaya zıwananê Ural-Altay a. Farıski u Kurdki zi zê Zazaki zıwananê İrani ra yi. Sayeyê tiveranayışi dı bixısusiyet ferq u şirikiyi Zazaki, Farıski u Kurdki zi yeni eşkerakerdış.

Tırki dı qey wesıla zafomari wesıla **/-lar/** şıxuliyena. Ina wesil goreyê ahengê vengi şekilê **/-ler/** dı zi şıxuliyena (Korkmaz, 2017:275). Zıwananê İraniyan ra Farıski dı, wesılı **/-ha/** (هـ) u **/-an/** (ان) qey zafomari şıxuliyeni. Ini her dı wesılı ge ge herında yobinan dı zi şıxuliyeni. (Şahinoğlu, 1997:52-53). Kelimeyi ki Ereki ra koti Farıski mo zıwan dı egleb bı esilê xu ca geni u pê wesıla zafomariya Ereki şıxuliyeni (Çiftci, 2013:141). Yona zıwano İrani Kurdki dı weziyetê zafomari hindeyê Farıski zelal niyo. Çunki name halo sade dı yo wesıla zafomari nêgeno, eger name zafomar bo weziyetê zafomari ancıyayışê fiili ser ra eşkera beno (Bedirxan & Lescot, 2011:88, Açar, 2023:1454). Kurdki dı halo oblik dı name qey zafomari wesıla **/-an/** geno; izafeyanê nameyi dı zafomari *temambiyaye* dı pê wesıla **/-ên/**, tamamker dı zi pê wesıla **/-an/** beno eşkera (Cıwan, 1992:46).

Zıwanê Zazaki dı, dı wesılı zafomari esti. Ini wesılı **/-i/** u **/-an/** (/on/un/u) i (Gündüz, 2009:43; Cem, 2013:71; Malmîsanij, 2015:70). Selcan, halo sade dı qey wesıla zafomari **/-i/** u **/-y/** qebul keno. Goreyê Selcani halo sade dı nameyi ki pê herfa bêveng qediyeni halê zafomari dı wesıla **-i** geni, nameyi ki pê herfa vengın qediyeni zi halê zafomari dı wesıla **-y** geni. Halo oblik dı zi nameyi pê wesıla **/-un/** u allomorfanê **/-u/(n)**, **/-o/(n)**, **/-a/(n)** beni zafomar (Selcan, 1998:243-244). Pamukçu, wesılanê zafomari şekilê **/-i,-yi/** u **/-an,-yan/** ifade keno labelê dewamê ifadeyê xu dı zi vano eger name pê herfa bêveng bıqediyoye wesıla **/-i/** ya zi wesıla **/-an/** geno eger name pê herfa vengın bıqediyoye herfa miyanci **/-y/** kuwena bıateyê kokê nameyi u wesıla zafomari (Pamukçu, 2001:93-94). Zeg Pamukçu zi vano **/-y/** wezifeyê herfa miyanci dı şıxuliyena, mo hal dı goreyê Pamukçu zi wesılı zafomari beni **/-i/** u **/-an/**. Heto bin ra diyalekta zımeyi dı şıxuliyayışê herfa miyanci kêm o may ra zeg cor dı zi Selcani ra neqıl bı herfa miyanci **/-y/** pê wezifeyê zafomari şıxuliyena. Teyna diyalekta zımeyi dı nê ca ca fekanê binan ê Zazaki dı zi herfa miyanci **/-y/** pê wezifeyê wesıla zafomari şıxuliyena. *Cêni-y ita dı muneni, cumerdi uca dı* (Aslanoğulları, 2017:74).

Zazaki dı ini her dı wesılan herında yobinan dı şıxulnayış mumkun niyo. Zeg cor dı zi vaciya Farıski dı zi dı wesılı zafomari esti la ferqê Zazaki u Farıski mo, wesılanê Farıski hem herında yobinan dı şıxulnayış mumkun o hem zi wezifeyê inan zêpi yo la Zazaki dı xısusiyetê her wesil ciya yo. Çunki Zazaki yo zıwano nimergatif o. Sistemê ergatifi hetê grameri ra munasebetê fiili u unsurane binan ê cumle mocneno ra. Sistemê akuzatifi dı ferqê fiilanê transitif u intransitifan çin o la sistemê ergatifi dı failê fiilê intransitif u objeya fiilê transitifi eyni hal dı şıxuliyeni (Arslan, 2016:64).

Dawaya sisteme nimergatifi ra Zazaki dı nameyi hem halo sade dı şıxuliyeni hem zi halo oblik dı şıxuliyeni.

Mesela hetê cinsiyet u zafomari ra ancıyayışê fiili dı wextanê ikayinan dı (ı kayın/hıra/ıstıqbal) tesirê obje çin o, fiil goreyê faili ancıyeno la wextanê viyerteyan dı fail fiili ser tesirê xu keno vin ina dor zi fiil goreyê obje ancıyeno. Bı vateyêko bin Zazaki dı fiil timotım fail u obje ra binê tesirê unsurê sadeyi dı yo (Kırkan, 2021:226). Inay ra zi Zazaki dı şıxuliyayışê wesılanê zafomari bedılıyeno. Cêr dı ino hal name, obje, fiil, izafeya name u izafeya sıfeti ser ra pê misalan kritik beno u ca ca zi Tırki, Farıski u Kurdki dır muqayese beno.

1. Nameyan Dı Zafomari

Zazaki dı nameyi halo sade dı pê wesıla /-i/, halo oblik dı pê wesıla /-an/ beni zafomar. Cêr dı goreyê diyalekt u fekanê Zazaki, nameyan dı şıxuliyayışê wesılanê zafomari tehliil beno.

1.1. Halo Sade (Nominatif) dı Zafomariya Nameyi

Zazaki dı wext name halo sade dı zafomar bo wesıla /-i/ geno. Tesbitê kokê kelimeyan u eşkerabıyayışê wesılan pê şıxuliyayışê misalanê munasıban mumkun beno. Inay ra semedê tesbitê kokê kelimeyan u wesılan kelimeyi ki pê herfa bêveng qediyeni misaldayış hina munasıb êseno u hina rehet merdımı resneno raştê gureyi. Qey inay, ma zi tiya dı verco kelimeyi ki pê herfa bêveng qediyeni semedê misal şıxulneni u dıma zi kelimeyi ki pê herfanê vengınan qediyeni inan dı şıxuliyayışê wesıla zafomari dı çıta bedılıyeno behsê ay kenı.

Wext name pê herfa bêveng bıqedıyo name dı veng nêbedılıyeno, teyna wesıla zafomari /-i/ yena peyniya nameyi.

Yoomar	Zafomar
Ber	Ber-i
Dest	Dest-i
Çım	Çım-i
Merdım	Merdım-i

Diyalekta merkez dı vatışê zafomari dı wesıla zafomari ge ge zaf eşkera nêşıxuliyena. Çarçıwaya *qeydeyê zıwan dı tesarufi* dı vengê zafomari ancıyeno vengê heceya peyin a kelime ser. Ino hal dı eger vengê heceya peyin a kelime /-e/ bo ino veng /-ê/ ser bedılıyeno. Eger vengê heceya peyin /-ı/ bo ino zi bı şeklê /-i/ beno tenik. (Aslanoğulları, 2017:71).

Yoomar	Zafomar
Ber	Bêr
Dest	Dêst
Çım	Çım
Merdım	Merdım

Zazaki dı eger name pê herfa vengın bıqedıyo herfa miyancı /-y/ kuwena bıateyê nameyi u wesıla zafomari.

Yoomar	Zafomar
Ga	Ga-y-i
Bıra	Bıra-y-i
Deza	Deza-y-i
Kerra	Kerra-y-i

Diyalekta merkez dı egleb fekê Çoligi dı wext name pê /-a/ bıqedıyo halê zafomari dı /-a/ bedılıyena u bena /-ê/.

Yoomar	Zafomar
Bıra	Bır-ê
Deza	Dez-ê
Ga	G-ê

Kerra	Kerr-ê
-------	--------

Fekê Çoligi dı wext name pê vengê /-e/ ya zi /-ı/ bıqediyoy halê zafomari dı vengê peyniya nameyi vengê /-ê/ ser bediliyeno.

Yoomar	Zafomar
Gırzı/Gırze	Gırz-ê
Ması/Mase	Mas-ê
Sarı/Sare	Sar-ê
Warı/Ware	War-ê

Heto bin ra ca ca esilê name dı veng nêbediliyeno la vengê /-y/ yeno peyniya nameyi u name bê şıxuliyayışê wesıla zafomari anciyeno. Yani tiya dı herfa miyanci bı wezifeyê zafomari şıxuliyena (Selcan, 1998:244; Pamukçu, 2001:95).

Yoomar	Zafomar
Bıra	Bıra-y
Deza	Deza-y
Ga	Ga-y
Kerra	Kerra-y

Heto bin ra nameyi mayi ki pê vengê /-a/ qediyeni ca ra ca hem vengê peyniya kelima /-a/ bedliyena bena /-e/ u hem zi vengê /-y/ yeno peyniya nameyi (Selcan, 1998:245; Pamukçu, 2001:95).

Yoomar	Zafomar
Çıla	Çıla-y
Bera	Bere-y
Manga	Mange-y
Kesa	Kese-y

Zazaki dı nameyi ki pê vengê /-i/ qediyeni eğleb bê wesıla zafomari u bı halê yoomari wezifeyê zafomari dı şıxuliyeni (Selcan, 1998:244, Pamukçu, 2021:96, Turgut, 2009:22, Çem, 2013:71). Labelê ge ge bê wesıla zafomari teyna herfa miyanci /-y/ yena peyniya nameyi. Mesela cini=cini+y, koli=koli+y. Hına fam beno ki qey şenikiya zıwani ini kelimeyi ya bê wesıla zafomari halê zafomari dı şıxuliyeni ya zi teyna herfa miyanci wezifeyê zafomari ana ca.

Yoomar	Zafomar
Kardi	Kardi
Koli	Koli
Cini	Cini
Sırsî	Sırsî

Zazaki dı diyalekta zımeysi dı nameyi mayi wesıla /-e/ geni. Ino weziyet mıntıqayanê binan dı zi bı qeydeyêko vılabiyayî êseno. Ino hal dı nameyo mayo ki pê wesıla mayti şıxuliyeno halê zafomari dı wesıla mayti /-e/ kuwena u wesıla zafomari yena herında ina wesıl (Selcan, 1998:244).

Yoomar	Zafomar
Engure	Engur-i
Kerge	Kerg-i
Dare	Dar-i
Dewe	Dew-i

Zazaki dı têki nameyi her hal dı zafomar şıxuliyeni, yani ini nameyan pê halê yoomari şıxulnayış mumkun niyo.

Halo Sade	Halo Oblik
Ard-i	Ard-an
Pijamayi	Pijamayan
Şapıki	Şapıkan
Tumani	Tumanan

1.2. Halo Oblik dı Zafomariya Nameyi

Zazaki dı name wext halê obliki dı bo pê wesıla **/-an/on/un/u/** beno zaf omar. Ina wesıl eyni wesıla la goreyê vatışi ca ra ca bedıliyena. Formê **/-an/** eğleb diyalekta verroci dı şıxuliyeno, diyalekta merkez dı hem formê **/-on/** hem zi formê **/-un/** şıxuliyeno la mıntıqayê formê **/-on/** hina hira yo. Formê **/-un/** diyalekta merkez dı eğleb merkezê Çolig dı, ca ca zi Xarpêt dı şıxuliyeno. Diyalekta zımeysi dı hem formê **/-on/** hem zi formê **/-u/** şıxuliyeno. Heto bin ra merkezê Çolig dı zi ca ca formê **/-u/** şıxuliyeno, ca ca zi formê **/-o/** şıxuliyeno. Kılmê qıseyi semedê cayê şıxuliyayışê ini formanê wesıla zafomari behsê yo hududê qeti kerdış mumkun niyo. Tiya dı semedê her feki misali ciyayi nêyeni dayış, her fek eyni misal ser yeno ramotış.

Yoomar	Zafomar
Ber	Ber-an/on/o/un/u
Dar	Dar-an/on/o/un/u
Dest	Dest-an/on/o/un/u
Merdım	Merdım-an/ono/un/u

Eger kelime pê vengê **/-a/** bıqediyo ino hal dı diyalekta merkez dı eğleb vengê **/-a/** kuweno u wesıla zafomari yena peyniya nameyi.

Yoomar	Zafomar
Bıra	Bır-on/un
Deza	Dez-on/un
Ga	G-on/un
Kerra	Kerr-on/un

Diyalekta zımeysi dı ino hal dı eğleb kokê nameyi nêbedıliyeno u wesıla zafomari raşt raşt yena peyniya nameyi.

Yoomar	Zafomar
Bıra	Bıra-u
Deza	Deza-u
Ga	Ga-u
Kerra	Kerra-u

Diyalekta verroci dı fekê Sêwreg dı wesıla **/-an/** yena peyniya nameyi la ino hal dı herfa miyanci kuwena bıateyê nameyi u wesıl.

Yoomar	Zafomar
Bıra	Bıra-y-an
Deza	Deza-y-an
Ga	Ga-y-an
Kerra	Kerra-y-an

Heto bin ra eger yo nameyo xısusı qey nameyê yo keye, ber ya zi eşir bışıxuliyeno name pê wesıla **/-an/** beno zafomar (Aslanoğulları, 2017:71).

Yoomar	Zafomar
Ehmed	Ehmed-an
Avdi	Avdi-y-an ¹
Umer	Umer-an ²

Fekê Sêwreg dı wext nameyê keye, ber ya zi eşir ser ra zafomari vıraziyena eger name pê herfa vengın bıqedi-
yo ge ge /-k/ bı wezifeyê herfa miyanci kuwena bınatyê nameyi u wesıla zafomari. (Pamukçu, 2001:93).

Yoomar	Zafomar
Elli	Ellê-k-an
Sımo	Sımı-k-an

1.3. Nameyanê Gruban dı Zafomari

Nameyi gruban hetê şekılı ra yoomari la hetê mena ra zafomar i. Yani inı nameyi miyanê xu dı zêdê yoyi ifade keni la wesıla zafomari nêgeni. Eger teyna yo grub ifade bıbo o wext nameyê grub hetê morfoloji ra bêwesıla zafomari u hukumê yoomari dı şıxuliyeno la eger behsê yoyi ra zêd grubanê eyni nameyi bıbo o wext name hetê morfoloji ra zi beno zafomar u wesıla zafomar geno. Mesela nameyê naxır yo gruba dewari işaret keno la eger naxırı yoyi ra zêd bi o wext nameyê naxırı beno zafomar.

Yoomar	Zafomar
Naxır	Des naxır-i
Ordu	Çar ordu-y-i
Qefle	Dı qefle-y-i

Heto bin ra zê zemiranê *her kes*, *heme*, *pêru* zemiri ki gruban ifade keni qısmêkê inan her hal dı yoomar, qısmêkê inan zi her hal dı zafomar şıxuliyeno. Zemiri *her kes* timotım yoomar o la zemiri *heme* u *pêru* zi her wext zafomar i.

Her kes	Herkes, kıtab wanen-o.
Heme	Heme, kıtab wanen-i.
Pêru	Pêru, kıtab wanen-i.

2. Fail Di Zafomar

Zazaki dı zafomariya faili çarçıwaya qeydeyê ergatifi dı goreyê wexti u goreyê transitif/intransitifiya fiili pê wesıla /-i/ ya zi wesıla /-an/ vıraziyena. Cor dı goreyê diyalektan u fekan behsê morfemanê wesıla zafomari /-an/ bıbı. Ina wesıl tiya ra pê ina xebat dı formê /-an/ dı şıxuliyena.

2.1. Fiilo Transitif dı Zafomariya Faili

Wext fiil transitif bo yani fiil obje bıgero wexto ıkayin, wexto hira u wexto istiqbal dı fail pê wesıla /-i/ beno zafomar. Ino hal dı fiil binê tesirê faili dı yo.

Wexto İkayin	Talebe-y-i hê kıtab waneni.
Wexto Hira	Talebe-y-i kıtab waneni.
Wexto İstiqbal	Talebe-y-i do kıtab bıwani.

Wext fiil transitif bo yani fiil obje bıgero heme formanê wextê viyerteyi dı fail pê wesıla /-an/ beno zafomar. Ino hal dı fiil binê tesirê obje dı yo.

¹ Çolig dı yo berê eşira Tavijan a, şarê ina eşir eğleb Darayeni u Boglan dı cuyeno.

² Qezaya Çoligi Boglan dı nameyê yo eşir u dewa merkeza ina eşir a. Tırki nameyê dew Sülünkaş o.

Wexto Viyerteyo Sade	Talebe-y- an kitab wend.
Wexto Viyerteyo Eşnawite	Talebe-y- an kitab wendo.
Hikayeya Wextê Viyerteyi	Talebe-y- an kitab wend bı.
Hikayeya Wextê İkayini	Talebe-y- an kitab wendên.

2.2. Fiilo İntransitif dı Zafomariya Faili

Eger fiil intransitif bo yani pê obje şıxuliyayışê fiili mumkun nêbo fail her wext dı pê wesıla /-i/ beno zafomar.

Wexto İkayin	Talebe-y- i hê remeni.
Wexto Hira	Talebe-y- i remeni.
Wexto İstiqbal	Talebe-y- i do biremi.
Wexto Viyerteyo Sade	Talebe-y- i remayi.
Wexto Viyerteyo Eşnawite	Talebe-y- i remayi.
Hikayeya Wextê Viyerteyi	Talebe-y- i remayi bi.
Hikayeya Wextê İkayini	Talebe-y- i remayên.

3. Obje Dı Zafomari

Zazaki dı zafomariya obje goreyê wextê fiili vıraziyena. Wexto ikayin, wexto hira u wexto istiqbal dı obje pê wesıla /-an/ bena zafomar. Ino hal dı fiil bınê tesirê faili dı yo.

Wexto İkayin	Ehmed ho kitab- an waneno.
Wexto Hira	Ehmed kitab- an waneno.
Wexto İstiqbal	Ehmed do kitab- an bıwano.

Zafomariya obje heme formanê wextanê viyerteyan dı pê wesıla /-i/ vıraziyena. Ino hal dı fiil bınê tesirê obje dı yo.

Wexto Viyerteyo Sade	Ehmedi kitab- i wendi.
Wexto Viyerteyo Eşnawite	Ehmedi kitab- i wendi.
Hikayeya Wextê Viyerteyi	Ehmedi kitab- i wendi bi.
Hikayeya Wextê İkayini	Ehmedi kitab- i wendên.

4. Fiil Dı Zafomari

Antışê fiilan dı zafomari, xu dı qeydeyi mocnena ra. Wexto ikayin, wexto hira u wexto istiqbal dı fiili ser tesirê obje çin o, obje wazena wa yoomar bo wazena wa zafomar bo fiili ser tesir nêkena. Ino hal dı fiil goreyê faili ancıyeno.

Wexto İkayin	Talebe-y- i hê kitab wan-en- i .
Wexto Hira	Talebe-y- i kitab wan-en- i .
Wexto İstiqbal	Talebe-y- i do kitab bı-wan- i .

Eger fiil wexto viyerte dı bo fiil ser tesirê faili çin o, fail wazeno wa yoomar bo wazeno wa zafomar bo fiil goreyê obje ancıyeno. Teyna hikayeya wextê ikayini dı wesıla zafomari nêşıxuliyena.

Wexto Viyerteyo Sade	Ehmedi kitab- i wend- i .
Wexto Viyerteyo Eşnawite	Ehmedi kitab- i wend- i .
Hikayeya Wextê Viyerteyi	Ehmedi kitab- i wend- i bi.
Hikayeya Wextê İkayini	Ehmedi kitab- i wendên.

5. İzafeyan Dı Zafomari

Zazaki dı izafeyanê nameyi u izafeyanê sifeti dı şıxuliyayışê zafomari wayirê xısusiyetanê ciyayan o. Inay ra her dı izafeyi ciya tehliil beni.

5.1. İzafeya Nameyi dı Zafomari

Cor dı goreyê diyalekt u fekan şıxuliyayışê wesıla zafomari ame ramotış. Wesıla halê nominatifi **/-i/** her ca dı eyni qeyde şıxuliyena, wesıla halê obliki goreyê fekan bı formanê **/-an/on/un/u** şıxuliyena. Tiya ra pey ına xebat dı hini heme formi nê, teyna formê **/-an/** misalan dı yeno şıxuliyayış.

Ge ge semedê wesıla zafomari herında **/-i/** dı zi **/-ê/** şıxuliyena. Semedê zafomari şıxuliyayışê **/-ê/** izafeyanê name u sıfati dı u ancıyayışê fiili dı êsena. La wext behsê Zazaki dı zafomari beno heme eseranê gramerê Zazaki dı biittifaq wesılı **/-i/** u **/-an/** ca geni. Qet yo eser dı zi semedê wesıla zafomari behsê **/-ê/** nêbeno. Xura zeg verco zi vaciya bı Zazaki dı name wext sade bo pê wesıla **/-i/** beno zafomar u zafomariya esas zi xu name dı kena eşkera. Inay ra merdım eşkeno vaco **/-ê/** eslê xu dı wesıla **/-i/** ya la ca ca semedê şenikiya zıwani bedılıyena u bena **/-ê/**.

Mesela diyalekta zımeysi dı ancıyayışê fiili şexisê yoyın ê zafomari goreyê mıntıqayanê binan vuriyeno u wesıla **/-ime/** geno. Misal, *Ma wanen-î-me* (Çem, 2013:150), *Ma şon-î-me* (Gündüz, 2009:199), *Ma wen-i-me* (Arslan, 2019:42).

Heto bin ra wexto viyerte dı zi halê objeya zafomar dı zi fiil ina diyalekt dı pê **/-i/** ancıyeno. *Mi kitabî wend-î*, (Çem, 2013:153), *Çêneke saniki wend-i* (Arslan, 2019:20). Ini misali zi iddiaya wesıla zafomari **/-i/** ya u **/-ê/** morfemê ina wesıla keni zıxm. Ina xebat dı misalan dı morfemê **/-i/** tercih beno.

Zazaki dı izafeyanê nameyi dı her dı leteyi izafe wesıla zafomar geni. Yani hem temambiyaye u hem zi tamamker pê wesıla zafomari şıxuliyeno. Ino hal zıwananê Farıski, Kurdki u Tırki dı zi eyni yo. Farıski dı *kitabî melıman* qeydeyê *kêtab-ha-yê moallêm-an* (کتابهای معلمان), Kurdki dı qeydeyê *kitêb-ên mamoste-y-an*, Tırki dı *öğretmen-ler-in kitap-lar-ı* şıxuliyeni. Labelê ferqê ini zıwanan u Zazaki inoyo ki Zazaki dı, dı wesılı zafomari esti u ini wesılı pê wezifeyanê ciyayan şıxuliyeni.

Zazaki dı eger her dı leteyi izafeya nameyi zafomar bi, goreyê wextê fiili wesılı zafomari bedılıyeni. Wexto ıkayin, wexto hira u wexto istiqbal dı eger izafe failê cumle bo temambiyaye wesıla **/-i/** geno, tamamker zi pê wesıla **/-an/** beno zafomar. Eger izafe obje bo her dı qısmi izafe zi pê wesıla **/-an/** beni zafomar. Cumleya cêrin dı kelimeya *bıra* temambiyaye u kelimeya *melım* zi tamamker a.

Wexto İkayin	Bıra-y-i melım-an, hê kitab-an-ê melım-an waneni.
Wexto Hira	Bıra-y-i melım-an, kitab-an-ê melım-an waneni.
Wexto İstiqbal	Bıra-y-i melım-an do kitab-an-ê melım-an bıwani.

Wextanê viyerteyan dı wext izafeya nameyi fail bo hem temambiyaye hem zi tamamker pê wesıla **/-an/** beni zafomar. Eger izafeya nameyi obje bo o wext temambiyaye wesıla **/-i/** geno, tamamker zi wesıla **/-an/** geno.

Wexto Viyerteyo Sade	Bıra-y-an-ê melım-an, kitab-i melım-an wendi.
Wexto Viyerteyo Eşnawite	Bıra-y-an-ê melım-an, kitab-i melım-an wendi.
Hikayeya Wextê Viyerteyi	Bıra-y-an-ê melım-an, kitab-i melım-an wendi bi.
Hikayeya Wextê İkayini	Bıra-y-an-ê melım-an, kitab-i melım-an wendên.

Eger izafeya nameyi bê wezifeyê fail u obje yona wezife dı bışıxuliyoy o wext timotim her dı leteyi izafe pê wesıla **-an** beni zafomar. Cumleyanê cêrinan dı *seetanê dersan* zerfê wexti yo, *sinifanê mekteban* zerfê cayi yo, *talebeyanê mekteban* mutemim o. Wext cumleyanê cêrinan dı ini ifadeyi kritik bıbi hem wexto hira dı hem zi wexto viyerte dı eşkerayo ki heme unsuri izafeyanê nameyi ra yeni meydan u halê zafomari dı ini heme ifadeyan wesıla **-an** gureta.

Wexto Hira	Bıra-y-i melim-an / seet-an-ê ders-an dı / sınıf-an-ê mekteb-an dı / talebe-y-an-ê mekteb-an ra / wendışê kitab-an-ê melim-an / wazeni.
Wexto Viyerteyo Sade	Bıra-y-an-ê melim-an / seet-an-ê ders-an dı / sınıf-an-ê mekteb-an dı / talebe-y-an-ê mekteb-an ra / wendışê kitab-an-ê melim-an / waşt.

5.2. İzafeya Sıfeti Dı Zafomari

Zıwananê Tırki, Farıski u Kurdki dı wext izafeya sıfeti zafomar bo zafomari teyna pê nameyi yena ramotış. Mesela Tırki dı *kırmızı kapı-lar*, Farıski dı *der-ha-yê sorx* (درهای سرخ), Kurdki dı *deri-y-ên sor*. Labelê Zazaki dı hem name wesıla zafomari geno hem zi sıfet. Mesela *ber-i sur-i*. Heto bin ra goreyê wezifeyê izafeya sıfeti zi wesıla zafomari bedıliyena. Yani çarçıwaya qanunê ergatifi dı izafeya sıfeti ge ge pê wesıla /-i/, ge ge zi pê wesıla /-an/ bena zafomar u her dı parçeyi izafeya sıfeti zi biqetiyet pê eyni wesıl beni zaf omar. Bı vateyêko bin eger izafeya sıfetiya zafomar halo sade dı bışıxuliyo her dı parçeyi wesıla /-i/ geni, eger halê obliki dı zafomar bo o wext zi her dı parçeyi pê wesıla /-an/ beni zafomar. Yani name pê kamci wesıl zafomar bo sıfetê ê nameyi zi pê eyni wesıl beno zafomar. Cêr dı ini bedıliyayışi kritik beni.

Halo sade dı, her dı parçeyi izafeya sıfeti pê wesıla /-i/ beni zafomar.

Yoomar	Zafomar
Kitab-o rınd	Kitab-i rınd-i
Merdım-o zanaye	Merdım-i zanaye-y-i
Say-a sur	Sa-y-i sur-i
Qelem-a siya	Qelem-i siya-y-i

Zerreyê cumle dı goreyê wezifeyê izafeya sıfeti wesılı zafomari bedıliyeni. Wexto ikayin, wexto hira u wexto istiqlal dı eger izafeya sıfeti zafomar bo u wezifeyê faili dı bışıxuliyo wesıla /-i/ gena. Ino hal dı eger izafeya sıfeti wezifeyê obje dı bêro şıxuliyayış pê wesıla /-an/ bena zafomar.

Wexto Ikayin	Talabe-y-i jihat-i / hê / kitab-an-ê rınd-an / waneni.
Wexto Hira	Talabe-y-i jihat-i / kitab-an-ê rınd-an / waneni.
Wexto İstiqlal	Talabe-y-i jihat-i / do / kitab-an-ê rınd-an / bıwani.

Heme formanê wextê viyerteyi dı izafeya sıfeti wezifeyê faili dı wesıla /-an/ gena, wezifeyê obje dı zi wesıla /-i/ gena.

Wexto Viyerteyo Sade	Talebe-y-an-ê jihat-an / kitab-i rınd-i / wendi.
Wexto Viyerteyo Eşnawite	Talebe-y-an-ê jihat-an / kitab-i rınd-i / wendi.
Hikayeya Wextê Viyerteyi	Talebe-y-an-ê jihat-an / kitab-i rınd-i / wendi bi.
Hikayeya Wextê İkayini	Talabe-y-an-ê jihat-an / kitab-i rınd-i wendên.

Eger izafeya sıfeti bê wezifeyê fail u obje yona wezife dı bışıxuliyo ino hal dı izafe her wext dı pê wesıla /-an/ bena zafomar. Cumleyanê cêrinan dı ifadeyê *rocanê dergan* zorfê wexti yo, ifadeyê *merganê zergunan* zorfê cayi yo, ifadeyê *extiyaranê zanayeyan* mutemim o. Ini ifadeyi hem wexto hira dı hem zi wexto viyerte dı pê wesıla /-an/ biyi zafomar. İfadeyê *talebeyi jhati* wezifeyê faili dı, ifadeyê *saniki rındi* zi wezifeyê obje dı şıxuliyayışi. Wesılı zafomari ê ini ifadeyan goreyê halê sadeyi u halê obliki şıxuliyayışi.

Wexto Hira	Talebe-y-i jihat-i / roc-an-ê derg-an dı / merg-an-ê zergun-an dı / extiyar-an-ê zanaye-y-an ra / sanık-an-ê rınd-an aridani.
Wexto Viyerteyo Sade	Talebe-y-an-ê jihat-an / roc-an-ê derg-an dı / merg-an-ê zergun-an dı / extiyar-an-ê zanaye-y-an ra / sanık-i rınd-i aridayi.

Zazaki dı eger izafeya sıfeti pê sıfetê işareti bıvraziyo halê zafomari dı hem sıfet hem zi name beno zafomar. Tırki u Farıski dı ino hal dı sıfet zafomar nêbeno teyna name wesıla zafomari geno.

	Nızd	Dur
Zazaki	In-i kitab-i	Ê (Î) kitab-i
Farıski	În kêtâb-ha (این کتاب ها)	An kêtâb-ha (آن کتاب ها)
Kurdki	Ev kitêb	Ew kitêb
Tırki	Bu kitap-lar	O kitap-lar

Sıfête omartışı dı Zazaki dı eger omara nameyi zafomar bo name zi pê halê zafomari şıxuliyeno. La eksê Zazaki zıwananê Tırki, Farıski u Kurdki dı halê sıfête omartışı dı sıfête zafomar bo zi name zafomar nêbeno.

Zazaki	Panc kitab-i
Farıski	Penc kêtâb (پنج کتاب)
Kurdki	Penc kitêb
Tırki	Beş kitap

Netice

Zazaki dı, semedê zafomari dı wesılı şıxuliyeni. Ini wesılı **/-i/** u **/-an/** i la ini her dı wesılı wezifeyanê ciyayan dı şıxuliyeni u inan herında yobinan dı şıxulnayış mumkun niyo. Ino xısusiyet, yo zıwano nimerkatıfbiyayışê Zazaki ra yeno meydan. Cêr dı tesbiti ki ina xebat dı veciyayi meydan pê maddeyan eşkera beni.

1. Nameyi halo sade dı pê wesıla **/-i/**, halo oblik dı zi pê wesıla **/-an/** beni zafomar. Wext name pê herfa vengın bıqedıyo ge ge herında wesıla **/-i/** dı herfa miyanci **/-y/** zi pê wezifeyê wesıla zafomari şıxuliyena. Zıwanê qıseykerdışı tesarufi ser ra şıxuliyeno, inay ra ge ge wesıla zafomari ê halê sadeyi **/-i/** qıseykerdış dı pê bediliyayışê vengê heceya peyin ê kelime zi xu mocneno ra. Yani wesıl nêyena vatış la pê bediliyayışê vengê heceya peyin zafomari ifade bena. Wesıla halê obliki **/-an/** Zazaki dı pê formanê **/-on/un/u** zi şıxuliyena.

2. Fail dı zafomari wexto ikayin, wexto hira u wexto istiqbal dı pê wesıla **/-i/**, heme formanê wextê viyerteyi dı zi pê wesıla **/-an/** yena ramotış.

3. Obje dı zafomari heme formanê wextê viyerteyi dı pê wesıla **/-i/**, wexto ikayin, wexto hira u wexto istiqbal dı zi pê wesıla **/-an/** yena ramotış.

4. Fiil dı zafomari her wext dı (wexto ikayin/wexto hira/wexto istiqbal/heme formi wexti viyerteyi) pê wesıla **/-i/** yena ramotış.

5. Zeg maddeyê 2. u 3. dı zi êseno fiil timotim goreyê unsurê cumleyo ki pê wesıla **/-i/** beno zafomar anciyeno u ino hal qetiyen nêbediliyeno. Pê vateyêko bin, anciyayışê fiili wexto ikayin, wexto hira u wexto istiqbal dı goreyê faili beno, heme formanê wextê viyerteyi dı zi goreyê obje beno. Inay ser ra merdim eşkeno vaco zeg têki fekanê Zazaki dı izafeyan dı temambiyaye dı u anciyayışê fiili dı semedê zafomari herında wesıla **/-i/** dı şıxuliyayışê wesıla **/-ê/** semedê reheti u şenikiya zıwani ya. Çunki qet yo eserê gramerê Zazaki dı semedê wesıla zafomari behsê wesıla **/-ê/** nêbeno. Heto bin ra halo sade dı pê wesıla **/-i/** zafomarbiyayışê nameyi zi ina iddia keno zıxm. Ino sebeb ra goreyê ma wesıla esıl **/-i/** ya, **/-ê/** zi morfemê ina wesıl a.

6. İzafeya nameyi dı her dı unsuri izafe zi beni zafomar. Yani wext temambiyaye zafomar bo tamamker zi mecbur beno zafomar la ini dı unsuri her wext pê eyini wesıl zafomar nêbeni. İzafeya nameyi zerreyê cumle dı pê wezifeyê kamci unsur ca bıgero temambiyaye zi goreyê ay wesıla zafomari geno. Wexto ikayin, wexto hira u wexto istiqbal dı eger izafeya nameyi pê wezifeyê faili bışıxulıyo temambiyaye pê wesıla **/-i/** beno zafomar, tamamker zi wesıla **/-an/** geno. Eger izafeya nameyi fail bo heme formanê wextê viyerteyi dı hem temambiyaye hem zi tamamker pê wesıla **/-an/** beni zafomar. Eger izafeya nameyi pê wezifeyê obje cumle dı ca bıgero wexto ikayin, wexto hira u wexto istiqbal dı hem temambiyaye hem zi tamamker pê wesıla **/-an/** beni zafomar la heme formanê wextê viyerteyi dı temambiyaye pê wesıla **/-i/**, tamamker zi pê wesıla **/-an/** beno zafomar. Zerreyê cumle dı izafeya nameyi bê fail u obje çı unsur bena wa bıbo halê zafomari dı hem temambiyaye hem zi tamamker pê wesıla **/-an/** beni zafomar.

7. İzafeya sıfeti dı wext name zafomar bo sıfet zi zafomar şıxuliyeno. Ino xısusiyet Tırki, Farıski u Kurdki dı çin o, inı zıwanan dı izafeya sıfeti dı teyna name beno zafomar, sıfet wesıla zafomari nêgeno. Zazaki dı name pê kamci wesıl zafomar bo sıfet zi pê a wesıl beno zafomar. Ina wesıl goreyê zerreyê cumle dı ca guretişê izafe bedılıyena. Eger izafeya sıfeti pê wezifeyê faili cumle dı ca bıgero wexto ıkayin, wexto hira u wexto istiqbal dı heme parçeyi izafe pê wesıla /-i/ beni zafomar. Wezifeyê faili dı heme formanê wextê viyerteyi dı izafeya sıfeti pê wesıla /-an/ bena zafomar. Eger izafeya sıfeti cumle dı wezifeyê obje dı bo ina dor wexto ıkayin, wexto hira u wexto istiqbal dı izafe pê wesıla /-an/ bena zafomar, heme formanê wextê viyerteyi dı zi pê wesıla /-i/ bena zafomar. Bê fail u obje izafeya sıfeti bı çı wezife cumle dı ca gena wa bıgero hem name hem zi sıfet pê wesıla /-an/ beni zafomar. İzafeya sıfeti dı eger izafe pê sıfetê işareti bıvıraziyo u name zafomar bo kelimeya işareti zi bena zafomar. Ino xısusiyet Tırki, Farıski u Kurdki dı çin o, inı zıwanan dı teyna name beno zafomar. Reyna eger izafeya sıfeti pê sıfetê omartışı bıvıraziyo Zazaki dı name zi beno zafomar. Ino weziyet zi Tırki, Farıski u Kurdki dı çin o, inı zıwanan dı name zafomar nêbeno.

Çımeyi

- Açar, Z. (2023), “Pirjimarî di Kurmançî de” *RumeliDE Dil ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi*, Omar:13, r.1452-1467.
- Akbaş, F. (2021), *Arapça Dilbilgisi: Sarf ve Nahiv*, Cantaş, İstanbul.
- Arslan, İ.(2016), “Zaza Dilinde Ergatif Sistemin Tarihi Gelişimi”, *Munzur Üniveristesi Sosyal Bilimler Dergisi*, Tunceli, Cild:4, Omar:8, r.63-87.
- Arslan, İ. (2019), *Zaza Dilinde Fiiler / Fiilê Zonê Zazaki*, Akademisyen, Ankara.
- Aslanoğulları, M. (2017), “Zazaca ve Kurmanca İsimlerde Çoğulluk”, *BÜYDED*, Bingöl, Cild:3, Omar:3, r.67-80.
- Bedirxan&Lescot, C., R. (2011), *Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci)*, Doz, İstanbul.
- Ciwan, M. (1992), *Türkçe Açıklamalı Kürtçe Dilbilgisi: Kurmanç Lehçesi*, Jina Nû, İsveç.
- Çem, M. (2013), *Türkçe Açıklamalı Kırmanca (Zazaca) Gramer*, Deng, İstanbul.
- Çiftci, H. (2013), *Uygulamalı Farsça Grameri*, Eser Ofset, Erzurum.
- Çörtü, M.M. (2019), *Arapça Dilbilgisi: Sarf*, MİFAV, İstanbul.
- Gündüz, D. (2009), *Türkçe Açıklamalı Kırmanca / Zazaca Dil Dersleri*, Vate, İstanbul.
- Kırkan, A. (2021), *Zazaki de Kar*, Peywend, Wan.
- Korkmaz, Z. (2017), *Türkiye Türkçesi Grameri: Şekil Bilgisi*, TDK, Ankara.
- Malmîsanij, M.(2015), *Kurmanca İle Karşılaştırmalı Kırmanca (Zazaca) Dilbilgisi*, Vate, İstanbul.
- Pamukçu, F. (2001), *Gıramerê Zazaki: Zuwanrêznayi*, Tij, İstanbul.
- Selcan, Z.(1998), *Grammatik Der Zaza-Sprache: Nord-Dialekt (Dersim-Dialekt)*, Wissenschaft&Teknik Verlag, Berlin.
- Şahinoğlu, N. (1997), *Farsça Grameri: Sarf ve Nahiv*, Kitabevi, İstanbul.
- Turgut, H. (2009), *Türkçe Açıklamalı Zazaca Dilbilgisi*, Tij, İstanbul.